



**NÛBIHAR
AKADEMÎ**

Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

Cild 1 Jimar 1 Sal 1 - 2014
Volume 1 Issue 1 Year 1 - 2014



Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.

Büyük Reşitpaşa Cad. Yümmi İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler – Fatih / İSTANBUL

Tel & Faks: 0212 519 00 09

www.nubiharakademi.com | email: nubiharakademi@gmail.com

Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Berpîrsê Karên Nivîsê

On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışleri Müdürü

Süleyman Çevik

DESTEYA EDÎTORİYÊ / EDITORIAL BOARD

Acar, Hayrullah / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Bor, İbrahim / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

Ergün, Zülküf / *Mardin Artuklu University, Turkey*

Türel, Vehbi / Asst. Prof., *Bingöl University, Turkey*

DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD

Akın, Salih / Assoc. Prof., *Rouen University, France*

Bozarslan, Hamit / Prof., *École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*

Bruinessen, Martin Van / Prof., *National University of Singapore, Singapore*

Jalil, Jalile / Prof., *Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria*

Kreyenbroek, Philip G. / Prof., *Georg-August University, Germany*

Musa, Abdulwahab Khalid / Assoc. Prof., *Zakho University, Kurdistan-Iraq*

Vali, Abbas / Prof., *Boğaziçi University, Turkey*

Yeğen, Mesut / Prof., *İstanbul Şehir University, Turkey*

Yıldırım, Kadri / Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

ÇAP / PRINTED BY

Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San.

Tic. Ltd. Şti. Orta Mah. Fatin Rüştü Sk.

No: 1-3 / A Bayrampaşa / İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

MÎZANPAJ & PAGE DESIGN

Dawud Rêbiwar

Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.

ISSN: 2147-883X

DESTEYA HEKEMAN / REVIEWERS BOARD

Abdi, Hacı Mihemed / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Acar, Hayrullah / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Açıl, Berat / *Asst. Prof., İstanbul Şehir University, Turkey*
Adak, Abdurrahman / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Ahmad, Saman Husên / *Asst. Prof., University of Riparian, Kurdistan-Iraq*
Ahmad, Bahiez Omer / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Akın, Salih / *Assoc. Prof., Rouen University, France*
Aktürk, Ahmet Serdar / *Prof., University of Arkansas, USA*
Alkış, Abdurrahim / *Asst. Prof., Dicle University, Turkey*
Aslan, Mustafa / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Ateş, Sabri / *Prof., Southern Methodist University, USA*
Aydoğan İbrahim Seydo / *Asst. Prof., İnhalco, France*
Aytar, Osman / *Asst. Prof., Mälardalen University, Sweden*
Bahar, Başer / *Asst. Prof., University of Warwick, UK*
Baluken, Yusuf, *Mardin Artuklu University, Turkey*
Beltekin, Nurettin / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Bengio, Ofra / *Prof., Tel Aviv University, Israel*
Bor, İbrahim / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Botani, Abdulfattah / *Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Bozan, Metin / *Prof., Dicle University, Turkey*
Bozarıslan, Hamit / *Prof., École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*
Bruinessen, Martin Van / *Prof., National University of Singapore, Singapore*
Cabbar, Ahmad Husein / *Asst. Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Çağmar, Edip / *Prof., Dicle University, Turkey*
Dağ, Rahman *Asst. Prof., University of Exeter, UK*
Destoorah, Keweh / *Asst. Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Dilani, Alan / *Prof., Academy for Design & Health, Sweden*
Doru, Nesim / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Eccarius-Kelly, Vera / *Prof., Siena College, USA*
Eliassi, Barzoo / *Asst. Prof., University of Lund, Sweden*
Ergün, Zülküf / *Mardin Artuklu University, Turkey*
Erkol, Ahmet / *Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Fereydoon, Rahmani / *Asst. Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Ferhad, Hacı Ebash / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Fischer-Tahir, Andrea / *Asst. Prof., Zentrum Moderner Orient, Germany*
Gunter, Michael / *Prof., Tennessee Tech. University, USA*
Hamadameen, Yadgar R. / *Assoc. Prof., Soran University- Soran, Kurdistan-Iraq*
Hatam, Wilya Muhammed / *Asst. Prof., Salahaddin Unv., Kurdistan-Iraq*
Heshmati, Almas / *Prof., Korea University – Korea*
Hitchins, Keith / *Prof., University of Illinois, USA*
Houston, Chris / *Asst. Prof., Macquarie University, Australian*
Ismail, Farouk, / *Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Jabbari, Najmoddin / *Asst. Prof., INYAZ University, Belarus*
Jongerden, Joost / *Asst. Prof., Wageningen University, Netherlands*
Jalil, Jalile / *Prof., Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria*

Kameran, Abdulsamed Ahmed / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Khayati, Khalid / *Asst. Prof., Linköping University, Sweden*
Khezri, Haidar / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Kıran, Abdullah / *Ass. Prof., Muş Alpaslan University, Turkey*
Kreyenbroek, Philip G. / *Prof., Georg-August University, Germany*
Leezenberg, Michael / *Prof., Van Amsterdam University, Netherlands*
Mawlood, Abdullah Khidir / *Asst. Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Mawlud, Ibrahim Hasan / *Asst. Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Keskin, Mesut / *Asst. Prof. Mardin Artuklu University, Turkey*
Mossaki, Nodar / *Asst. Prof., Institute of Oriental Studies of the Russian Academy, Russia*
Musa, Abdulwahab Khalid / *Assoc. Prof., Zakho University, Kurdistan-Iraq*
Omarkhali, Khenna / *Asst. Prof., Gotingen University, Germany*
Osman, Xelil Mustefa / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Önen, Ekrem / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Özervarlı, Sait / *Prof., Medeniyet University, Turkey*
Özsoy, Hişyar / *Asst. Prof., University of Michigan-Flint, USA*
Romano, David / *Asst. Prof., Missouri State University, USA*
Saeed, Yousif Sharef / *Prof., Salahaddin University, Kurdistan-Iraq*
Saef Al-deen, Bayar M. / *Asst. Prof., Duhok University, Kurdistan-Iraq*
Sheholislami, Jaffer / *Asst. Prof., Carleton University, Canada*
Skutnabb-Kangas, Tove / *Asst. Prof., Åbo Akademi University Vasa, Finland*
Tejel, Jordi / *Assoc. Prof., Graduate Institute, Switzerland*
Tek, Ayhan / *Muş Alpaslan University, Turkey*
Timurtaş, Abdulhadi / *Asst. Prof., Yüzüncü Yıl University, Turkey*
Türel, Vehbi / *Asst. Prof., Bingöl University, Turkey*
Uğurlu, Seyit Battal / *Asst. Prof., Yüzüncü Yıl University, Turkey*
Üstündağ, Nazan / *Asst. Prof., Boğaziçi University, Turkey*
Vali, Shahab / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Vali, Abbas / *Prof., Boğaziçi University, Turkey*
Yalçın-Heckmann, Lale / *Asst. Prof., Martin Luther University, Germany*
Yeğen, Mesut / *Prof., İstanbul Şehir University, Turkey*
Yıldırım, Kadri / *Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Yiğit, Metin / *Assoc. Prof., Dicle University, Turkey*

HEKEMÊN VÊ JIMARÊ / REVIWERS OF THIS ISSUE

Acar, Hayrullah / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University*
Açıl, Berat / *Asst. Prof., İstanbul Şehir University, Turkey*
Adak, Abdurrahman / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University*
Baluken, Yusuf, *Mardin Artuklu University, Turkey*
Beltekin, Nurettin / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Bor, İbrahim / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University*
Doru, Nesim / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Khayati, Khalid / *Asst. Prof., Linköping University, Sweden*
Kıran, Abdullah / *Ass. Prof., Muş Alpaslan University, Turkey*
Türel, Vehbi / *Asst. Prof., Bingöl University*
Uğurlu, Seyit Battal / *Asst. Prof., Yüzüncü Yıl University, Turkey*
Vali, Abbas / *Prof., Boğaziçi University, Turkey*
Vali, Shahab / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*
Yiğit, Metin / *Assoc. Prof., Dicle University, Turkey*

NAVEROK / CONTENTS

JI EDÎTOR/EDITORIAL07-10

**Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û
Taybetmendiyan Romantîzma Hacî û Cegerxwîn**

In Kurdish Poetry the Beginning of the Method
of Romanticism of Haci and Cegerxwin

ZÜLKÜF ERGÜN 11- 33

**Kurdish Contemporary Literature in Search for Ordo Amoris-Some
Reflections on the Continuity of the Kurdish Literary Tradition and Ethics-**

Wêjeya Kurdî ya Nûjên li Ordo Amoris Digere -Çend Pirs li Ser
Berdewamiya Kevneşopiya Edebî û Exlaqî ya Kurdî-

JOANNA BOCHEŃSKA35-54

Mîratî Şûm: Wêney Kurdekan le Kulturî Turkî da

Grim Legacy: The Image of Kurds in Turkish Culture

HAIDER KHIZRI55-68

Vera Modernbiyayîşî de Medreseyê Rojhelatî / Şerqî

Against the Modernization Eastern Madrasas

NURETTİN BELTEKİN59-82

**A Sociological Analysis of Life Conditions Within Kurdish Society:
Kurdish People's Quality of Life (1998-2013)**

Analîzeke Sosyolojîk li ser Şertên Jiyânê di Nava Civaka Kurdan de:
Qelîteya Jiyânê ya Kurdan (1998-2013)

FEREYDOON RAHMANI83-92

Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de

The Studies of Peter J. A. Lerch on Kurdology

SEYÎDXAN KURIJ 93-108

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

Gora Feqiyê Teyran

Faqah Tayrân's Tomb

ABDURRAHMAN ADAK, YUSUF BALUKEN, HAYRULLAH ACAR 109-118

Ji Edîtor

Lêkolînerên hêja,

Aşkera ye ku di vê qonaxa xebatên Kurdî de, pêwistî bi kovareke bihekem û akademîk heye ku bi Kurdî û Îngilîzî weşanê bike. Eger em çend kovarên li Kurdistana Başûr û li diyasporayê nehesibînin, kovarên ku heta niha di warê xebatên Kurdî de hatine weşandin bi piranî ji xebatên edebî û çandî pêk hatine. Li aliyekî di salên dawî de li hinek zanîngehên Tirkiyeyê di warê xebatên Kurdî de bernameyên lîsansa bilind vebûne û ji bo ku mamoste û xwendekarên van bernameyan gotarên xwe yê akademîk biweşînin pêwistî bi derxistina kovareke akademîk çêbûye. Faktorên bi vî rengî kir ku ji bo derxistina *Nûbihar Akademiyê* gavên pêwist bîn avêtin.

Kovara *Nûbihar Akademiyê* di bin banê weşanxaneyê *Nûbiharê* de ku ji sala 1992yan ve ye di warê xebatên Kurdî de weşangeriyê dike, dikeve nav cîhana weşangeriyê. *Nûbihar Akademî* li ser mîrata tecrubeya weşanxaneyê *Nûbiharê*, dixwaze di warê kovargerîya akademîk a xebatên Kurdî de bibe pêşeng û bibe platformeke objektîf ku hemû lêkolîner xebatên xwe yê akademîk tê de biweşînin.

Nûbihar Akademî dê bi nêrîneke înterdisîplînerî ji zanistên civakî ên ciyawaz cih bide her cure nivîsên di warê xebatên Kurdî de. Di vê jimara yekemîn a *Nûbihar Akademiyê* de di warên edebiyata Kurdî ya nûjen, edebiyata berawirdkarî, felsefe, perwerde, sosyolojiya qelîteya jiyane û dîroka zimanê Kurdî de şeş gotar cih digirin. Ji van gotaran çar jê bi Kurdî, du jî bi Îngilîzî ne. Ji gotarên Kurdî du jê bi Kurdiya Zazakî, yek bi Kurdiya Kurmancî û yek jî bi Kurdiya Soranî hatine nivîsandin. Bi vî awayî hê di jimara me ya yekem de derfeta dîtina gotarên bi Îngilîzî û sê zaravayên Kurdî bi hev re derket holê.

Zülküf Ergün, di bin sernavê “Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn” de gotarek bi Kurdiya Kurmancî nivîsiye. Di vê gotarê de Hacî Qadirê Koyî yê ku di sedsala XIXan de nûnerê yekem ê romantîzma Kurdî ye û Cegerxwîn ê ku piştî wî bi sed salî peyrewiya wî kiriye dane ber hev û di çarçoveya romantîzma neteweyî de nêrînen wan ên hevbeş derxistine meydanê.

Joanna Bocheńska, di gotara xwe ya bi sernavê “Kurdish Contemporary Literature in Search for Ordo Amoris” de, di çarçoveya teoriya “Ordo Amoris” (Hiyerarşiya

Nirxan) a filozofê Alman Max Scheler de li ser teza ku edebiyata Kurdî ya nûjen li ser nirxên edebiyatên gelêrî, klasîk û tesewîfî bilind bûye û bi qasî biserketina xwe ya di vî warî de, dê bikare bibe endamê mîrata edebiyata cihanê rawestiyaye.

Haider Khizri, di gotara xwe ya bi sernavê “Mîratî Şûm: Wêney Kurdekan le Kulturî Turkî da” ku bi Kurdiya Soranî ye, di çarçoveya çavkaniyên curbicur de li ser rengvedana “mîrata şûm” a Kurdan di çanda Tirkî de rawestiyaye ku Kurd di wê çandê de di kategoriya “yên di” de hatine dîtin. Nivîskar bi metodeke berawirdkarî li ser vê nêrîna ku pêşî di çandên Faris û Ereban de derketiye meydanê û ji wir jî derbasî çanda Tirkî bûye rawestiyaye.

Nurettin Beltekin, di gotara xwe ya bi sernavê “Vera Modernbiyayîşî de Medreseyê Rojhelatî / Şerqî” de ku bi Kurdiya Zazakî ye, li ser medreseyên Kurdên Zaza yê serdema Komara Tirkiyeyê rawestiyaye. Nivîskar bereksê rojhilatnasan rojhilat ne wekî objeyekê, wekî subjeyekê dîtiye û di vê çarçoveyê de aliyê van medreseyan ê muqtedîr ku bi taybetî pirsgirêkên hiqûqî yê di nava xelkê de çareser dikirin û aliyê wan ê muxalîf ku di warê muxalefeta siyasî, çandî û dînî de bûbûn navend û di vê peywendê de girîngiya bikaranîna Kurdiya Zazakî di van medreseyan de derxistine pêş.

Fereydoon Rahmani, di gotara xwe ya bi sernavê “Kurdish People’s Quality of Life” de, ji bo maweya salên 1998-2013an, di çarçoveya disîplîna “qelîteya jiyandê” de ku di salên dawî de serxwebûna xwe bi dest xistiye û bi metoda “combinative model” (rêbaza têkel) a Wolfgang Schulz, di warê qelîteya jiyana nifûsa Kurdan a li Kurdistanê û li diyasporayê encamên ku bi dest xistine nîşan dane.

Herî dawî Seyîdxan Kurij di gotara xwe ya ku bi Kurdiya Zazakî ye û bi sernavê “Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de” ye, naveroka pirtûka zimanzanê Rûs Peter J. A. Lerch analîz kiriye ku ev pirtûk ji metnên folklorîk ên ku Lerch ji Kurdên Zaza yê di herba Qirimê de dîl hatibûn girtin berhev kirine pêk tê. Nivîskar herweha girîngiya vê xebatê di nava xebatên ku rojhilatnasan di warê xebatên Kurdî de kirine derxistiye meydanê.

Di dawiya kovarê de di beşa “Dokumentek”ê de, Abdurrahman Adak, Yusuf Baluken û Hayrullah Acar derheqê gora Feqiyê Teyran de dokumentên gelekî hêja pêşkêşî cîhana zanistê kirine.

Bi hêviya ku di jimara me ya bê de em dîsa bi hev re bin.

Digel silav û rêzê.

Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Edîtorê vê Jimarê

Editorial

Esteemed researchers,

At the point where contemporary Kurdish studies have reached there is an obvious, urgent need for an academic peer-reviewed journal published in Kurdish and English languages. Apart from certain journals that have appeared so far in South Kurdistan and in the diaspora, the content of journals published in the field of Kurdish studies is limited to literary and cultural studies. In recent years, master's degree programs in the field of Kurdish studies have been started in certain universities in Turkey, and a need has risen for journals where academics and students in these programs can publish their scientific journals. These issues urged the necessary steps to be taken for the publication of *Nûbihar Akademî*.

Nûbihar Akademî has begun publishing under the umbrella of Nûbihar Publishing, which has been publishing in İstanbul since 1992 publications in the field of Kurdish studies, and which also publishes Kurdish-only *Nûbibar* magazine. As a magazine *Nûbihar* will continue to be published as a literary periodical; however, academic articles that can be described as scientific will be published in *Nûbihar Akademî* after review by referees. With the confidence of experience of Nûbihar Publishing house, *Nûbihar Akademî* is aiming to be a pioneer of academic journals in the field of Kurdish studies, and create an objective platform where researchers complying with academic research criteria will have the opportunity to publish their studies.

Six articles in the fields of modern Kurdish literature, philosophy, comparative literature, educational sciences, quality of life in sociology, and history of the Kurdish language feature in the first issue of *Nûbihar Akademî*, which aims to publish interdisciplinary studies in different disciplines of social sciences. Four of these articles are in Kurdish and two in English. Two of the Kurdish articles have been written in Zazakî Kurdish, one in Kurmancî Kurdish and the other in Soranî Kurdish. Our first issue has been able to publish articles in all three dialects of Kurdish as well as English.

In his Kurmancî Kurdish article titled “Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn,” Zülküf Ergün

compares Hacî Qadirê Koyî as the first Kurdish romanticist author in the 19th century with his follower a century later Cigerxwin, and describes both authors' similar ideas within the framework of national romanticism.

In an English article titled "Kurdish Contemporary Literature in Search for Ordo Amoris," Joanna Bocheńska argues, moving from "Ordo Amoris" theory of German philosopher Max Scheler, modern Kurdish literature rises on the values of Kurdish oral, classical and Sufi literatures, and that it can become part of the world literature legacy as long as it can maintain this rise.

In the Soranî Kurdish article "Mîratî Şûm: Wêney Kurdekan le Kulturî Turkî da," Haider Khizri talks about, using various sources, "inauspicious legacy" to the Turkish culture by Kurds, viewed as "other." By employing the comparative literature method, the author explains how this perception first appeared in Persian and Arab cultures and then among Turks.

Nurettin Beltekin, in his Zazakî Kurdish article "Vera Modernbiyayîşî de Medreseyê Rojhelatî / Şerqî" that analyzes madrasahs of Zaza Kurds in the Republic period, highlights the east as a subject in contrast to orientalists who view it as an object, and in this regard, underlines the significance of madrasah as a potent power resolving many but in particular legal questions, as a political, cultural and religious opposition center, and the importance of using Zazakî Kurdish in madrasah education.

In his article titled "Kurdish People's Quality of Life" that covers 1998-2013 period, Fereydoon Rahmani explains the results of his study on the quality of life of Kurds both in their countries and in the diaspora, using Wolfgang Schulz's "combinative model" within the framework of "quality of life," which has become an independent discipline in recent years.

And lastly in another Zazakî Kurdish article "Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdoloji de" Seyîdxan Kurij has a look at the contents of the Russian linguist Peter. J. A. Lerch's book containing folkloric texts from Zaza Kurds who had been captured by the Russians in the Crimean War, and locates the significance of the book within the Kurdish studies undertaken by orientalists.

At the end of the journal in the part of "A Document" Abdurrahman Adak, Yusuf Baluken and Hayrullah Acar have presented to science world very valuable documents about Faqah Tayran's tomb.

We hope to see you in our next issue.

Sincerely,

Assoc. Prof. Abdurrahman Adak
Editor of this Issue

Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyan Romantîzma Hacî û Cegerxwîn

In Kurdish Poetry the Beginning of the Method of Romanticism of Haci and Cegerxwin

Zülküf ERGÜN*

PUXTE:

Romantîzm wek rêbazeke edebî di sedsala XVIIIan de cara pêşîn li Îngilîstanê derket holê û di demeke kurt de di nav edebiyatên neteweyên Ewropayê de belav bû. Ev rêbaz di sedsala XIXan de bi riya hin xwendekar û ronakbîrên Osmanî yên ku ji bo Fransayê hatibûn şandin di nav dewleta Osmanî de jî hat nasîn. Bi vî awayî romantîzma ronakger a fransî bi rengeke neteweyî di nav ronakbîrên Osmanî de wek meşrûtiyetxwazî û di nav ronakbîrên jêrdestê Osmaniyan de jî wek serxwebûnxwazî derket holê.

Dema ku li Stenbola paytexta dewleta Osmanî ev tişt diqewimîn Hacî Qadirê Koyî jî li Stenbolê bû û wek helbestvanekî Kurd cara yekemîn nûnertiya romantîzma neteweyî kir. Ji ber ku di serdema jiyana Hacî de Kurd negihîştin armancên xwe yên siyasî, di seranserî sedsala XXî de jî fikra romantîzma

neteweyî di edebiyata Kurdî de zindî ma. Ji ber vê çendê sed sal piştî Hacî û li ser şopa wî bi awayekî xurt vê carê Cegerxwîn nûnertiya romantîzma neteweyî kir.

* Wanebêj, Zanîngeha
Mardin Artukluyê, Enstîtuya
Zimanên Zindî, Şaxa
Makezanista Ziman û Çanda
Kurdî, Mêrdîn, Turkiye.

Lecturer, Mardin Artuklu
University, Living Languages
Institute, Kurdish Language
and Culture Department,
Mardin, Turkey.
e-mail: zxweshevi@gmail.com

Herçend di nav wan de hin çiyawazî hebin jî Hacî û Cegerxwîn li ser fikra neteweyî, hişmendiya zimanê zikmakî, vejandina dîroka neteweyî, dijayetiya serekên feodal, xurtkirina hesta welatperweriyê, pesindana fikra rasyonel û bilind nixandina zanistên pozîtîv xwedî heman bîr û boçûn bûn. Ev jî nîşan dide ku her

du helbestvan di mijara romantîzma neteweyî de digihîjin hevdu û di vê xalê de Cegerxwîn şopgêr û mîratgirê Hacî ye.

Bêjeyên sereke: romantîzm, romantîzma neteweyî, Hacî, Cegerxwîn.

ABSTRACT:

As a literary method, Romanticism firstly appeared in England, in XVII century and in a short time spread among the literature of European nations. In the XIX century it was made known in the Ottoman state by some Ottoman students and intellectuals who were sent for France. In this way the French intellectual Romanticism in national colour appeared among the Ottoman intellectuals as pro-constitution and among the intellectuals subject to Ottomans as pro-independence.

When this happened in Istanbul, the capital of the Ottoman Empire, Hacî Qadirê Koyî was also in Istanbul and for the first time he represented the national Romanticism as a poet. Because of the fact that in Hacî Qadirê Koyî's century the Kurds couldn't reach their political aims, throughout the XX century the idea Romanticism remained lively in the Kurdish literature. Therefore, a century after Hacî Qadirê Koyî and following him as a short time, Cegerxwîn represented the national Romanticism.

Although there were also some differences between them, Hacî and Cegerxwîn had an idea about all the subjects such as national idea, importance of mother tongue, reviving of national history, strengthening the feelings of patriotism, praising the idea of rationalism and evaluating scientific positivism. This shows that both the poets in the national Romanticism meet one other and in this point Cegerxwîn is a follower and inheritor of Hacî Qadirê Koyî.

Keywords: romanticism, national romanticism, Hacî, Cegerxwîn.

1. DESTPÊK

Bêjeya romantîzmê binyada xwe ji "romance"yê werdigire. Ev bêje li Rojava di serdema serdestiya zimanê Latînî de ji zimanê Latînî yê deformebyûyî re dihat gotin ku gelê ne Latînî pê diaxifin. Peywendiya bêjeya romantîzmê bi bêjeyên "romane" û "roman"ê re jî heye. Di serdema navîn de Fransiyayê bêjeya "romane"yê ji bo çîrokên tirsnaq ên helbestkî û bêjeya "roman"ê jî ji bo destanên ku bi zimanê gel dihatin nivîsîn bi kar dianîn. Herweha ji bo tiştên ku peywendiya wan bi romanên re jî hebû sifeta "romantîk" bi kar dianîn. Lê di sedsala XVIIIyan de êdî romantîzm wek çemkeke edebî di wateya coş û xiroşiyê û tiştên xeyalî û hestiyarî de hat bikaranîn (Aytaç 2012, r. 210)

Romantîzm wek rêbazeke edebî û ronakbîrî cara yekem di sedsala XVIIIan de li Îngilîstanê peyda bû û demek şûnde jî li Almanyayê xurt bû. Herçend rêbaza romantîzmê pêşî li van welatan rûdabe jî; zêdetir li Fransayê deng veda û bi riya Şoreşa Mezin a Fransayê ev rêbaz li seranserê cîhanê belav bû. Romantîzm li ser bingeha serdema ronakbîriya Rojava şîn bû. Ji aliyekî ve bi peydakirina çapxaneyê û belavbûna zanistên nû re gelên Rojava li hemberî arîstokratan asta xwe ya ronakbîriyê xurt kirin, li aliyê din bi rêbaza Martîn Luther hinek bawermendên Mesîhî li dijî mezhebê katolik xwe li mezhebê protestan girtin û bi vî awayî xwe jî bin nîrê desthilata manewî ya “zîlamên dînî” rizgar kirin. Diderot, Montesquieu, Voltaire û J. J. Rousseau li ser vê zemînê, jêrxana fikrî ya Şoreşa Mezin a Fransayê amade kirin. Bêguman Şoreşa Mezin a Fransayê jî ber vê paşxaneya xwe ya siyasî û civakî jî aliyê siyasî, felsefî, dîrokî û edebî ve bû hêmaya rêbaza romantîzmê. Ji xwe karîgeriya romantîzmê ne tenê li ser edebiyatê; li ser hemû beşên hunerê, felsefeyê, dîrokê û siyasetê hebû. Ji ber vê taybetmendiya xwe, rêbaza romantîk bi hemû rûyên xwe ve di demeke kurt de bandora xwe li ser piraniya gel û dewletên cîhanê çê kir û di nav rewş û mercên her welatî de dirûveke nû wergirt. Loma jî di edebiyata her welatî de, li gor mercên wî welatî û li gor têgihîştin û armancên hunermendên wan welatan ciyawazî nîşan da (Olçay, KKEFD 2008, r. 369).

Li Fransayê romantîzm li ser bizava ronakgeriyê (enlightenment) geş bû. Ev bizava herçend cara pêşî li Îngilîstanê derketibe holê jî herî zêde li Fransayê deng veda. Ronakgerî wek îdeolojiya çîna navîn li dijî derebegîtiyê derket holê û heta Şoreşa Mezin a Fransayê karîger bû. Ronakgerên mîna John Locke, J. J. Rousseau, Voltaire, Diderot û Montesquieu li dijî bîr û baweriyên kilîseyê û rejîma derebegîtiyê eqil derdixistin pêş û jî her alî ve hewl didan ku xelkê hişyar bikin. Loma jî her yek jî wan wek mamostayekî komelayetî, rêberekî siyasî, şîretkarekî rewîştî û feylesofekî jiyane roleke girîng dîtin (Husên 2010, r. 79-81). Bizava ronakger bi van taybetiyên xwe zêdetir aliyê siyasî û komelayetî yê rêbaza romantîzmê diyar kir.

Romantîzma Îngilîzî li ser bizava sentementalîzmê (dîlzîzîtî) derket. Bizava sentementalî jî mîna bizava ronakger li Îngilîstanê peyda bû û wek çemk yekem car di pirtûka “Geşteke Sentementalî” ya Stern de hat bikaranîn. Nûnerên bizava sentementalîzmê li hember eqil girîngî dan hestên mirovî. Bi dîtina wan eqil nikaribû rastiya cîhanê keşf bike, ji ber vê jî helbestvanên sentementalî berê xwe dan cîhana navxweyî û hewl dan bi riya berfirehkirina hestên xwe cîhanê fêmkirin (Husên 2010, r. 83). Di helbestên sentementalî de zêdetir mijarên dînî, reşbînî û vejeriyana jiyana gund û siruştê cih girt û bi vî awayî bizava sentementalî bingeha romantîzma takekesî danî.

Romantîzma Almanî jî li ser bizava “Sturn und Drang” (Bahoz û Peroşî) serî hilda. Vê bizavê girîngî dida hest û nestên mirovî û berê xwe dida siruştê. Ji ber vê jî dirûşmeya vê bizavê gotina navdar a Jean Jacques Rousseau bû ku digot “Vegere siruştê”. Bêguman nûnerê herî navdar ê vê bizavê Herder bû û li ser destê wî, bizava “Sturn und Drang” dirûveke neteweyî wergirt. Lewra Herder li hember ziman û edebiyata klasîk a Yûnanî û Romanî berê xwe dida çavkaniyên neteweyî yên Almanî û digot berhemên me hinde Alman bin ewçend modern in (Aytaç 2012, r. 104-107).

Bi giştî wek rêbazeke edebî romantîzm li dijî rêbaza klasîk derket holê û ji hemû aliyan ve nirx û taybetmendiyên vê rêbazê red kir. Bi gotina Stendhal klasîzm hunera do bû, lê romantîzm hunera îro bû (Firset 1978, r. 12). Lewra klasîzmê xwe dispart monarşiya şahîtiyê, lê romantîzmê li ser rêgezên azadî, wekhevî û biratiyê berê xwe da “dewleta neteweyî” ya ku li ser sîstema komarî dihat saz kirin. Hunermendên klasîk weku dîrok û çavkanî ji edebiyatên Latînî û Yûnanî xwedî dibûn, lê hunermendên romantîk jêderên van edebiyatan dan aliyekî û li ser dîroka xwe ya neteweyî û li ser jiyana rojane ya gelê xwe nivîsîn. Di berhemên klasîk de eqil serdest bû, lê romantîkan giranî dan ser hest û fantaziyên şexsî, civakî û neteweyî. Berhemên klasîk edebiyata arîstokratîk bû û behsa jiyana wan dikir, lê berhemên romantîk deriyên xwe ji hemû çîn û tebeqeyên civakê re vedikirin. Ji ber vê jî li hember zimanê parzûnkirî yê arîstokratîk nivîskar û helbestvanên romantîk zimanê axaftinê yê gel esas girtin û ew qise û gotinên ku berê nedihatîn bikaranîn xistin nav berhemên edebî û meşrûiyetê dan zimanê rojane yê gel (Hiseynî 2006, r. 58-62). Bi vî awayî romantîzm wek edebiyateke alternatîf hat pênas kirin û bi van taybetmendiyên xwe bandor û şopên mayînde li ser edebiyata cîhanê hişt.

2. DESTPÊKA ROMANTÎZMA KURDÎ

Rêbaza romantîk piştî Rojava, karîgeriya xwe li ser gel û welatên Rojhilat jî çê kir, lê bêguman ji Rojava gelek derengtir û di nav rewş û mercên siyasî û civakî yên cîyawaztir de rûda. Di sedsala XIXan de dewleta Osmanî ya ku piraniya Kurdan jî di nav sînorên wê yên siyasî de diman ji her alî ve li hember dewletên Ewropayî lawaz dibû û paşve dikişîya. Piştî ku fikra neteweyî di nav neteweyên Osmanî de belav bû, desthilatdarên vî welatî bêtir nîgeran bûn û xwe mecbûrî zanist û fikrên nû yên Ewropayî dîtin, ji ber vê jî xwendekar şandin welatên Ewropayê û bi taybetî jî Fransayê. Piştî vê hewldanê, van ronakbîrên nû yên ku çûn Ewropayê pirtûkên edib û zanayên fransî wergerandin ser zimanê Osmanî û bi vî awayî berhemên romantîkên fransî di nav ronakbîrên Osmanî de belav bûn.

Ronakbîrên neteweya desthilatdar (Osmanî - Tirk) di bin karîgeriya van pêşhatan de ji bo rizgarkirina dewleta xwe û bicihkirina fikrên nû di nav gel de, li dijî sîstema zordar a monarşîk ketin nav hewldanan û xwestin bi riya hişyarkirina gelê xwe û bi danîna sîstemeke meşrûfî deriyê azadî û wekhevîyê vekin û pêşî li hilweşîna dewleta xwe bigirin. Li hember vê rewşê edîb û ronakbîrên neteweyên bindest ên Osmaniyan jî bi riya van fikrên nû xwestin gelê xwe ji bo serxwebûn û rizgariya neteweyî han bidin û xwe ji bin nîrê Osmaniyan rizgar bikin.

Ji ber vê çendê rêbaza romantîk bi riya çavkanî û berhemên Fransî û bi naverokeke neteweyî di nav xelkên Osmanî de belav bû. Ji xwe romantîzma neteweyî berî ku di nav neteweyên dewleta Osmanî de belav bibe li Almanyayê û Îtalyayê peyda bûbû. Lewra dema dagirkirina Almanyayê ji aliyê Napolyon ve li hember Fransiyayê di nava Almanan de romantîzmeke neteweyî (national romantic) peyda bû (Aytaç 2012, r. 211). Herweha dagirkirina beşek ji axa Îtalyayê jî bû sedem ku li vî welatî raperîneke neteweyî rûbide (Husên 2010, r. 105).

Herwek neteweyên din ên dewleta Osmanî di nav edîb û ronakbîrên Kurd de jî romantîzmeke neteweyî serî hilda. Lewra di nîveka sedsala nozdehan de jinavbirina mîrekiyên Kurdan, zexta tevgera siyasî û neteweyî ya Ermenan û serxwebûna hin neteweyên herêma Balkanan bûn sedem ku di nav edîb û ronakbîrên Kurdan de jî romantîzmeke neteweyî belav bibe. Ji ber vê çendê wek yekemîn helbestvanê romantîk ê Kurd Hacî Qadirê Koyî bû alahilgirê romantîzma neteweyî ya Kurdî. Loma jî Amîr Hassanpour, Hacî Qadirê Koyî wek yekemîn pêşengê neteweyî yê çîna navîn û burjuvayê dizane (Hassanpour 2005, r. 131).

Romantîzma Kurdî di qonaxa yekemîn de li ser rêçîka bizava ronakger a romantîk bêtir bi rûyê xwe yê siyasî û civakî derket pêş û helbestvanên Kurd ên mîna Hacî, Ebdurehîm Rehmî Hekarî, Pîremêrd û Cegerxwîn jî wek têkoşerên siyasî û civakî hunerên xwe kirin bin xizmeta pêşketina gel û niştîmanê xwe. Ji ber vê mebestê, helbestvanên romantîk ên Kurd ên mîna Hacî û Cegerxwîn têkoşîna xwe ji du aliyên ve bi rê ve dibirin. Ji aliyekî ve gelê Kurd bi tevahî li dijî dijminên derveyî han didan û doza azadî û avakirina dewleta neteweyî dikirin; ji aliyê din ve dijayetiya desthilatdarên komela Kurdî yên mîna şêx, axa û began dikirin û dixwestin di nava komela Kurdî de guhertinên bingehîn pêk bînin û berê gelê Kurd bidin cîhana nûjen a pêşketî.

Di edebiyata Kurdî de wek yekemîn helbestvanê romantîk Hacî Qadirê Koyî û sed sal piştî wî Cegerxwîn, herçend jî aliyê rûxsara helbestê ve li ser rêçîka helbesta klasîk mabin jî di naveroka helbestê de guhertinên cidî pêk anîn. Helbesta klasîk a Kurdî serçaviya xwe ji tesewîfê digirt û helbestvanên klasîk zêdetir behsa hestên

takekesî û manewî dikirin, lê di helbestên Hacî û Cegerxwîn de siyaset, meseleyên civakî û pêşketina madî ya cihanê bûn mijarên sereke yê helbestê. Xala hevbeş a her du helbestvanan jî dîdaktîzma civakî bû. Hacî û Cegerxwîn helbestên xwe ne ji bo fantazyê helbestkarane ji bo hişyarkirina komela xwe dihûnandin û ji fikarên edebî û hunerî zêdetir di nav fikarên siyasî û civakî de tevdigeriyan.

Di serdema Hacî de, wate di sedsala XIXan de ji helbestê zêdetir cureyên edebî yê mîna roman, şanoname û çîrokê populer bûn û gelek helbestvan û nivîskarên romantîk ên Rojava ji bilî helbestê roman û şanoname jî dinivîsandin. Ji ber vê jî, rêbaza romantîk ne tenê bi riya helbestê, bi riya gelek cureyên edebî pêgeha xwe di nav edebiyatê de berfirehtir dikir. Lê di wê serdemê de ji ber rewşa siyasî û komeleyî ya Kurdan, ev cureyên edebî hêja ji aliyê edîbên Kurd ve nehatibûn nivîsîn. Herçend Hacî ji bilî helbestê tu cureyê din a edebî berhem neanîbe jî haya wî ji wê yekê hebû ku di cîhana pêşketî ya Ewropayê de cureyên nû yê edebî bêtir berbelav in. Ji ber vê jî di helbestên xwe de behsa vê mijarê dike û amaje bi edebiyata nû ya serdemiyane dike:

Zemane resmî caranî nemawe
Çiraxî nazim û munşî kujawe

Le dewrî ême roman û cerîde
Egerçî meqsed e, zanîni baw e
(Koyî 2004, r. 21)

Sed qa'ime qesîde kes naykirê be pûlê
Rozname û cerîde û kewtote qîmet û şan
(Koyî 2004, r. 85)

Hacî bi van malikên xwe di edebiyata Kurdî de cara pêşî xetekê di navbera edebiyata kevin û nû de dikişîne û diyar dike ku çiraxa helbestvanê berê (nazim) û nivîskarê pexşana berê (munşî) vemiriye, êdî dewra roman û rojnameyê dest pê kiriye û zanist bûye adet, ji ber hindê jî tu kesek qîmet nade qesîdeyên berê û sedê wan bi pûlekê jî nakire. Ev malik nîşan didin ku Hacî, yekemîn helbestvan û hişyarkerê edebiyata serdema nûjen e û romantîzm jî ji bo edebiyata Kurdî yekemîn rêbaza edebî ya nûjen e.

3. DU KESAYETIYÊN GIRÎNG ÊN ROMANTÎZMA NETEWÊYÎ YA KURDÎ

Hacî Qadirê Koyî (1816-1897) ji her aliyê ve wek yekemîn helbestvan û ronakbîrê romantîk ê Kurd derdikeve pêş. Herçend di medreseyên adetî yê berê de xwendina xwe temam kiribe jî, bi dîtina Maruf Xeznedar fikrên ronakbîrî û hevçerx ên Hacî hêja dema ku li Koyê bûye dest pê kiriye (Xeznedar 2010, r. 133). Ji xwe ji ber ku rexne li desthilata şêxan digire û di navbera wî û Şêx Nebî Maweylî de kêşe derdikeve, ji neçarî berê xwe dide Stenbolê. Bêguman di pêgihandina fikrên nûjen ên Hacî de hokara sereke tevgera nûjen a ronakbîrî û edebî ya li Stenbolê bû. Lewra di wê serdemê de di nav ronakbîr û edibên Osmanî de fikrên nûjen ên romantîk li kar bû û di bin navê edebiyata Tenzîmatê de edibên Osmanî dest bi avakirina edebiyateke nû kiribûn. Hacî jî bi çavlêkeriya van kesan û bi riya wergerên ku ji zimanê Fransî hatibûn kirin dest bi avakirina edebiyateke nûjen û neteweyî ya Kurdî kir. Hacî herçend ji welatê xwe dûr bû jî bi riya helbestên xwe dengê xwe digihand Kurdan û ew hişyar dikirin. Bi gotina Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza (1984, r. 10) yê ku dîwana wî çap kirine Hacî her helbesta ku li Stenbolê dinivîsand, bi riya dost û hevaleyê xwe dişand Kurdistanê û xelkê Kurd ji pêşketinên cîhanê agahdar dikirin. Loma jî mîna ku Maruf Xeznedar jî dibêje di nava komela Kurdewarî de di belavkirina bîr û baweriyên ronakbîrî û şoreşgeriyê de roleke wî ya bilind hebû (Xeznedar 2010, r. 163). Ev tespît jî nîşan didin ku Hacî wek helbestvanekî romantîk di nava komela Kurdewarî de roleke baş ditiye û di vî warî de heta astekê bi ser ketiye.

Herçend di navbera wan de hin helbestvanên din jî hebin Cegerxwîn (1900/1903-1984) piştî Hacî, duyemîn helbestvanê binavûdeng ê romantîk e. Wî jî di medreseyên dinî yê klasîk de xwendiyê, lê di dirêjîya temenê xwe de çend salên pêşî ne tê de melatî nekiriye. Bi gotina wî di sala 1924an de li ser destê Şewqî Begê Erxenî hişyar bûye û bîr bi Kurdperweriyê biriye (Cegerxwîn 1995, r. 126). Di salên 1930î de şaşîk û cibeyê xwe diavêje û wek ronakbîrekî nûjen di nava komela Kurdî de dest bi xebatên siyasî û ronakbîrî dîke. Di sala 1938an de bi armanca ku zimanê Kurdî hînî zarokên Kurdan bike û di nav wan de hesta welatperweriyê belav bike li Amûdê komeleyekê (nadî) vedike (Cegerxwîn 1995, r. 226). Tevî xebatên siyasî yê Xoybûnê dibe, lê paşê ji wan vediqete. Di Civata Azadî û Yekîtiya Kurd de dibe sekreter, lê piştî demekê ji ber malmezînen Kurdan ji vî civatê jî vediqete (Cegerxwîn 1995, r. 263). Piştî salên 1949an digel komûnîstan dixebite (Cegerxwîn 1995, r. 284) û wek helbestvanekî komûnîst ê enternasyonal piştgirî dide bîr û baweriyên çepîtîyê û bi vî awayî welatparêziya xwe li ser esas û rêgezên marksîzmê ji nû ve saz dîke.

Xala ku Cegerxwîn ji Hacî vediqetîne ev e ku Cegerxwîn ji Hacî cîyawaztir wek helbestvanekî çep û komûnîst, rêbaza realîzma komelayetî û romantîzmê têkeli hev kiriye. Ji xwe Jdanovê (1896-1948) ku yek ji darêjerên realîzma komelaye-

tiya Sovyetê ye diyar dike ku nabe edebiyat piştî xwe bide romantîzmê, lê divê ev romantîzm, romantîzmeke şoreşgêr be (Moran 1991, r. 56) û digel realîzma komeleyetî bigunce. Ji ber vê çendê Cegerxwîn heta 1949an wek helbestvanekî neteweyî li ser rêbaza romantîzmê helbest nivîsîne, lê piştî ku bîr û baweriyên komunîstiyê qebûl kirine êdî digel romantîzma wî rêçika realîzma komelayetî jî di berhemên wî de li ber çavan dikevin. Loma jî di helbestên xwe de fikra çînayetiye parastîye û hejar û karker li dijî sermayedaran han dane. Bêguman ev çiyawaziya wan ji ber mercên siyasî yên serdemên wan bû. Lewra Hacî helbestvanê piştî Şoreşa Mezin a Fransayê bû û zêdetir li ser azadî û şoreşa siyasî û civakî disekinî, lê Cegerxwîn helbestvanê piştî Şoreşa Bolşevîk bû ku ev şoreş li ser fikrê çînayetiye pêk hatibû. Ji ber vê çendê yek ji mijarên ku herî zêde Cegerxwîn li ser sekiniye fikrên çînayetiye û hişyarkirina çîna hejar û karkeran e.

Di nêzîkbûna bîr û baweriyên her du helbestvanan de karîgeriya çîroka jiyana wan jî heye. Her du helbestvan jî nûnerên çîna hejar in. Hacî di biçûktiya xwe de dê û bavê xwe ji dest dide, Cegerxwîn jî 15-16 saliya xwe da ji dê û bavê xwe sêwî dimîne. (Keyo 1985, r. 17) Hacî di nava xizanî û bêkesiyê de mezin dibe, Cegerxwîn jî. Her du jî medreseyan dîni dixwînin, lê melatî nakin, dijayetiya otorîteyan dîni dikin û di nava gel de fikrên nûjen belav dikin. Helbestên her du helbestvanan jî ji aliyê girseyeke mezin ve tîn pêşwazîkirin û li ser zar û zimanan digerin.

Ji aliyê edebî ve xala hevbeş a her du helbestvanan jî romantîzma wan a neteweyî ye. Di peydabûna romantîzma neteweyî ya Hacî de hilweşandina Mîrektiya Baban û bizava nûjen a edebî û ronakbîrî ya Stenbolê diyarker e, di romantîzma neteweyî ya Cegerxwîn de jî têkçûna Serhildana Şêx Seîd û bizava ronakbîrî û neteweyî ya Kurdên Sûriyeyê diyarker e. Ji ber helwesta wî ya neteweyî her du helbestvan jî Ehmedî Xanî wek pêşengên edebiyata Kurdî qebûl dikin û bi pesin navê wî hiltînin. Bi dîtina Hacî, Xanî bi saya bîr û baweriyên xwe yên ku di dibaceya *Mem û Zînê* de behs kiriye di nav hemû dewletên cîhanê û Kurdan de hatiye nasîn. Ji ber ku Xanî pêşengê fikra neteweyî ye Hacî xwe û Xanî wek danerê helbesta Kurdî dide zanîn. Bêguman Hacî bi gotina xwe ya “esasî nezmî Kurdî” amaje bi helbesta neteweyî ya romantîk dike.

Le mecmû’î duwel Soran û Botan
Le sayey em kitêbe nasraw e

Le Kurdan xeyrî Hacî û Şêxî Xanî
Esasî nezmî Kurdî danenawe
(Koyî 2004, r. 21)

Cegerxwîn jî ji ber heman taybetiya wî Xanî ji Zerdeşt û Mezdik û Manî çêtir dizane û wî wek rêberê neteweyî nîşan dide:

Ne pêxemberên me ne Zerdeşt û Mezdik û Manî
Yek rehberê me heye seydayê Xanî
(Cegerxwîn 1992, r. 60)

Deysemê meydana milletperwer î
Salarê bajarê ristên gewher î
....
Serdarê ristevan û pehlewana î
Rêberê Kurdistan Seydayê Xanî
(Cegerxwîn 2000, r. 261)

4. DI HELBESTÊN HACÎ Û CEGERXWÎN DE MIJARÊN HEVBEŞ ÊN ROMANTÎZMA NETEWÊYÎ

Di navbera Hacî û Cegerxwîn de her çend sed sal hebe jî gelek mijarên ku di helbestên xwe de amaje pê kirine li hev diçin. Helbet em dikarin bibêjin Cegerxwîn di bin tesîra Hacî de maye û ev rast e jî. Ji xwe di dîwanên xwe de Cegerxwîn gelek caran navê Hacî hiltîne û wî bi bîr tîne. Lê ji bilî vê kartêkirinê mirov dikare vê hevbeşiyê bi romantîzma wan a neteweyî ve jî girê bide. Lewra ne tenê di edebiyata Kurdî de di edebiyata cîhanê de jî di navbera helbestvan û nivîskarên romantîk de hevbeşiyên girîng hene. Niha em ê di helbestên Hacî û Cegerxwîn de van mijarên hevbeş rêz bikin û hevbeşiyên wan destnîşan bikin.

4. 1. Fikra Neteweyî

Fikra neteweyî yek ji encamên herî girîng ên Şoreşa Mezin a Fransayê bû. Ronakbîrên Fransî di vê serdemê de li hemberî sistema monarşiya şahîtiyê fikra dewleta neteweyî derxistin pêş û bûn danerên fikra dewleta neteweyî. Ji xwe dewletên neteweyî yên Rojava jî di encama van hewldanan de hatin dameziran-din. Fikra neteweyî di nav neteweyên xwedan dewlet de li hember “vîna monar-kan” bi danîna “vîna giştî ya neteweyê” derket holê. Ji xwe J. J. Rousseau bû ku bi gotina “vîna giştî” yekem car “netewe” weku bikerê rasteqîne pênase kir. (Ke-restecioğlu 2009, r. 330) Di nav neteweyên bêdewlet ên mîna Kurdan de jî fikra neteweyî û vîna giştî ya neteweyê li hemberî vîn û desthilata dewletên serdest hate pênasekirin. Ji ber vê çendê di helbestên romantîk ên Kurdî de fikra neteweyî, ne bi danîna sistema “komar”ê, ne jî bi avakirina “meşrûtiyet”ê hate derbirin. Lewra

ji bo derketina “vîna neteweyê” pêwistiya romantîkên Kurd bi “serxwebûn”ê hebû. Loma jî Hacî serxwebûna hin neteweyên Balkan ên ku berê di nav sînorên dewleta Osmanî de bûn wek nimûne nîşanî Kurdan dide û wan ji bo serxwebûnê han dide. Cegerxwîn jî çareserîya hemû êş û janên Kurdan di serxwebûnê de dibîne.

Bulxar û sîrb û yonan, hem Ermen û qeretax
Her pêncyan be te’dad nabin be qeddî baban

Her êke musteqîllin, kullekî dewletêk in
Sahîbî ceşş û rayet, erkanî herb û meydan
(Koyî 2004, r. 86)

Heta ko serbest nebî Kurdistan
Her dem sergêjî nayên rawestan
(Cegerxwîn 2003, r. 80)

Serê xurtemêran pira serxwebûn
Bi xwîna me millet dibênî hebûn
(Cegerxwîn 1997, r. 66)

Her du helbestvan jî ji ber rewşa nelibar a Kurdan serxwebûnê wek tekane rîya rizgariyê dibînin. Bi dîtina Hacî tu dewleteke cîhanê mîna Kurdistanê di rewşeke weha nizim de nîne. (Gellêkim bîstuwe pestî û billindiy dewlletan emma / Cîhan neydiwe pestî wa mîsalî halî Kurdistan) (Koyî 2004, r. 87) Cegerxwîn jî rewşa Kurdan bi “bindestî û zigurdiyê” destnîşan dike (Belê ez im Kurd / Îro ez mame / Bindest û zigurd / Ew tac û eywan / Tev çûn û rizîn / Dijmin nav û deng / Tev ji min dizîn / Xistin laşê min mîqrobên teres / Ta bûm perîşan bê nav û nekes) (Cegerxwîn 2003, r. 16).

Derbarê çareserkirina vî halê nebaş ê Kurdan de her du helbestvan jî di heman fikrî de ne. Li gor her duyan jî divê Kurd di nav xwe de teba bin, berê xwe bidin cîhana pêşketî, bi ilmê nûjen xwe perwerde bikin û bi rîya çekên pêşketî şerê rizgariya welatê xwe bikin. Bi dîtina Hacî heta Kurd “rêk nekevin” dê weha “xerabeabad” bimînin (Koyî 2004, r. 113). Cegerxwîn jî ji ber nebûna yekîtiyê, Kurdan di nav milletên cîhanê de wek miletekî “bêserî û parçebûyî” bi nav dike (Cegerxwîn 1992, r. 25). Ji bo rizgarbûna ji vê rewşê Hacî “selah” a Kurdan di “sîleh”ê de dibîne (Koyî 2004, r. 75). Ji ber vê jî bi dîtina wî divê Kurd wek mêşên hingiv kar bikin û çekên pêşketî yên mîna “top, tifeng û hawan”an peyda bikin (Koyî 2004, r. 84). Cegerxwîn jî herweku Hacî “necat” a Kurdan bi “tîving û top û şûr” ve girê dide (Cegerxwîn 1992, r. 91).

Ji bo çêkirina fikra neteweyî û gihîştina serxwebûnê her du helbestvan jî dawa homojenkirina komelê dikin. Hacî û Cegerxwîn herweku neteweperwerên serdema xwe jî bo avakirina nasnameya neteweyî yekîtiya ziman, çand û îdealên paşerojê pêwîst dizanin. Ji ber vê çendê Hacî bi gotina “yek berg û yek zuban û yek deng” dawa homojenkirina komela Kurdî dike û ev mijar paşê jî aliyê Cegerxwîn ve jî tê behskirin (Yek berg in û yek zuban û yek deng / Bê keybet û ‘eyb û ‘ar û bêdeng) (Koyî 2004, r. 113). (Ger nexwênin yekziman û berg û yekarmanc nebin / Her bibazin, wer bigazin vî berî nebin serî) (Cegerxwîn 2000, r. 316).

4. 2. Hişmendiya Zimanê Zikmakî

Hişmendiya ziman yek jî taybetmendiyên girîng ên romantîkan e. Lewra romantîkên Rojava jî ber fikra neteweperweriyê dixwestin xwe jî bin bandora ziman û edebiyata klasîk a Latîni û Yûnanî rizgar bikin û bi zimanê gelê xwe edebiyateke neteweyî ava bikin. Ji xwe yekgirtina zimanên neteweyî û fermîkirina van zimanan piştî van hewldanan pêk hat. Hacî û Cegerxwîn li ser rêçîka Xanî jî aliyekî ve li hemberî zimanên der û cîranên Kurdan pesna zimanê Kurdî didin; jî aliyê din ve bala Kurdan dikişînin ser girîngiya ziman û dawa zimanekî yekgirtî û pet dikin. Hacî li hember zimanê edebî yê farisî pesnê Kurdî dide û di vê mijarê de jî ber xemsariya Kurdan gilî û gazincan li wan dike. Lewra bi dîtina wî belaxeta ku di zimanê Kurdî de heye ne di farisî de ne jî di zimanekî din de heye, lê ev ziman jî ber “bê te’essubî”ya Kurdan “bê rewac û beha” maye (Koyî 2004, r. 13). Hacî jî bo vê xemsarî û bête’esubîya Kurdan a derheqê zimanê Kurdî de di helbesteke xwe de mînaka Kurdekî Koyî dide. Ev zîlamê Koyî li Stenbolê dema Hacî dibîne jê re dibêje “alimên me yên qenc tev ji nav çûne û kes nemaye rê nîşanî xelkê bide, tenê şêx û alimê hêja Kak Ehmed heye, ew jî mixabin Quranê bi Kurdî ji xelkê re rave dike.” Zîlamê koyî jî ber vê kiriyara wî heyfa xwe li Kak Ehmed tîne û dibêje xwezî bi Kurdî Quranê jî wan re rave nekira (Koyî 2004, r. 140). Hacî li hemberî helwesta vî zîlamî gelek xemgîn dibe, jî aliyekî ve vî kesî bi kerîtiyê tewsîf dike, jî aliyê din ve careke din behsa hêjayîya zimanê Kurdî dike û di Kurdî de tu eyb û arî nabîne. Bi dîtina wî zîlamê Kurdî bi tu awayî jî farisî kêmtir nîne; eger mirov bala xwe bide her du zimanan, dê bê dîtîna ku farisî jî Kurdî dizî ye, lewra bi dîtina wî Kurd jî farisan dêrîntir in. (Ya le gell Farisî çî ferqî heye / Bo çî ew rast e, bo çî em keçe ye / Ba wicûdî eger bikey diqqet / Tê degen kam le kamî ye sîrquet) (Koyî 2004, r. 141).

Hacî jî ber ku di avakirina nasnameya neteweyî de ziman tişteki girîng dizane, di helbesteke xwe de dibêje “eger mela, şêx, mîr û padişahên me kitêbên xwe bi Kurdî binivîsandana dê heta mehşerê nav û nîşanên wan bimana.” (Koyî 2004, r. 60-61). Ji ber vê çendê kesên ku Kurd in û bi zimanê xwe nizanin, bi bêeslî û

nesebiyê tawanbar dike. Hacî dibêje “eger Kurdêk bi zimanê bavê xwe nizanibe muheqeq diya wî hîz (qehp) e û bavê wî jî zînakar e.” (Koyî 2004, r. 60). Di mallekeke xwe ya din de jî sedema pesindana Xwedê bi pêşgirtina lomeyên xelkê ve girê dide û dibêje ji bo kes nebêje bi Kurdî pesnê Xwedê nehatiye dayîn ez pesnê Xwedê didim. (Me’lum e bo çî Hacî medhit deka be Kurdî / Ta kes nellê: Be Kurdî nekirawe medhî barî) (Koyî 2004, r. 58).

Cegerxwîn jî wek Hacî ji ber giringîpênedana Kurdî dikeribe û gazincan dike, lê di heman demê de behsa kêşeya yekîtiya zimanê Kurdî jî dike. Bi dîtina wî xelkên bajaran girîngî nadin zimanê xwe û bi zimanên biyanî diaxivin, herweha di nav gundan de jî yekîtiya ziman nayê dîtin. (Cegerxwîn 1992, r. 30) Ji ber vê çendê Cegerxwîn nexwendina bi zimanê xwe bi gotinên “şerm û esef”ê derdibirine. (Cegerxwîn 1992, r. 278) Bi dîtina Cegerxwîn divê hemû Kurd li ser Kurdmancî li hev bikin. Navên “lor, zaz, gor û bext”an dide û dibêje em hemû “Kurd” in û zimanê me jî “Kurdmancî” ye. (Ferqê lor û zaz û gor û bext çî ye / Em hemî Kurd û ziman Kurdmancî ye.) (Cegerxwîn 1992, r. 62).

Cegerxwîn derbarê pêşvebirin, pakkirin û yekxistina zimanê Kurdî de jî pêşniyazên xwe rêz dike. Bi dîtina wî divê bêjeyên pûç û xav ji Kurdî bîn avêtin û di şûna wan de bêjeyên sivik û ciwan bîn peydakirin, awazê Kurdî bê xweşikkirin û peyvên qelew bi nazikî bîn bilêvkirin, ji bo ziman destûr bê danîn û Kurdî bi tîpên nû yên Latîni bê nivîsandin (Cegerxwîn 1997, r. 83-85).

Bi vî awayî hem Hacî hem jî Cegerxwîn di avakirina nasnameya neteweyî de girîngiya hişmendiya ziman derdixin holê û bi nêrîneke serdemiyane hem di nav Kurdan de hişmendiya ziman çê dikin hem jî wek neteweyên din di pêvajoya netewesaziyê de ji bo çêkirina zimanekî yekgirtî pêşniyazên xwe rêz dikin.

4. 3. Şanazikirina bi Dîroka Neteweyî û Lehengên Dîrokî

Madam de Stayl romantîzmê wek helbestên zindîker ên rabirdûya neteweyan û edebiyata siwarçakîyê bi nav dike (el- Hemdanî 1989, r. 83). Buşra Ersanlı jî taybetiya herî mezin a rêbaza romantîzmê di nav heyraniyeke nostalgîk de di mezinkirina dîroka berê de dibîne (Ersanlı 2009, r. 29). Bêguman dîrok ji bo hemû romantîkan laboratuara sazkirina nasnameya neteweyî û hêza manewiya “roja îro” bû. Bîranîna serweriyên berê ji bo serkevtinên duwarojê dihat bikaranîn û lehengên dîrokî ji bo xortên dema niha wek nimûne û modelên şênber dihatin nişandan. Ji bo vê mebestê gelek caran serweriyên berê û lehengên neteweyî ji rastiya xwe dûr diketin û li gorî pêwîstiyên îro bi hunermendî dihatin drametîzekirin û bi awayekî mubalexeyî dihatin derpêşkirin.

Martin van Bruinessen di helbestên Hacî de îdealîzekirina nostalgîk a serdema feodal bi romantîzma wî ya neteweyî ve girê dide (Bruinessen 2005, r. 71). Dîsa ji ber heman sedemê di helbestên Cegerxwîn ê ku dijminê arîstokratên serdema xwe bûn, kesayetên dîrokî yên arîstokrat payebilind û ronîdar in. Lewra herwek romantîkên neteweyên din di nêrîna Hacî û Cegerxwîn de jî dîrok û lehengên dîrokî çavkaniya manewiyata îro û hêza sazkirina paşerojê bûn. Ji ber vê çendê jî di helbestên Hacî û Cegerxwîn de bi hesret yada serweriyên rojên berê dihat kirin û “doya wan a xweş” ji ber “îroya wan a malkambax” (Alan 2009, r. 224) û “duwaroja wan a hêvîbexş” şemal didan. Hacî behsa mîrekên berê dike û di serdema wan de Kurdan azad û serbixwe, xwedan mulk û artêş û îrfan dizane. Cegerxwîn jî behsa dîroka dêrîna Kurdan dike û bi hesret serdema cîhangîriya Kurdan bi bîr tîne.

Kiwa waliyî Senenduc, begzadey Rewanduz
 Kiwa hakimani Baban, mîrî Cizîr û Botan

Kiwa ew demey ke Kurdan azad û serbexo bûn
 Sultanî mulk û millet, sahibî ceşş û ‘îrfan
 (Koyî, 2004, r. 84)

Berê em hikûmeteke cîhangîr bûn li dinya;
 Wer temaşa bike eywana Kesra, neqş û nîgar.
 (Cegerxwîn 1992, r. 67)

Di helbestên Cegerxwîn de peywendiya do, îro û duwarojê di çarçoveya romantîzma neteweyî de baştir derdikeve holê. Di “Şerefnameya Menzûm” de ji bo rizgariya Kurdan gazî û hawara xwe dibe ber padişah, mîr û begên Kurdan û rasterast dewlet û hikûmetên berê dike hêza manewî ya damezirandina duwaro-jeke geş. Cegerxwîn li ser bingeha Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî di vê berhema xwe de navê çil û pênc xanedanên Kurdan dijmêre û ji mîr û padişahên van xanedanan hêvî dike ku bi hawariya Kurdan ve bînin û wan ji vî halê nebaş rizgar bikin. (Cegerxwîn 2003, r. 13-100) Di helbesta “Şehname Şehîdan” de jî yek bi yek navê beg, şêx, axa û pêşengên serdema xwe dijmêre û ji bo hişyarkirina bîra neteweyî ya Kurdan ji rûhaniyeta wan arîkarî dixwaze. Ev jî nîşan dide ku di helbestên Cegerxwîn de dîrok wek ruhekî neteweyî tê nîşandan û ji bo vejandina neteweya Kurd tê bikaranîn.

Ji bo vê armancê Hacî û Cegerxwîn di helbestên xwe de navên gelek xanedan û xweşmêrên Kurd dijmêrin. Hacî di diwana xwe de gelek caran navê Mîrekiya

Ezîzan a Cizîra Botan, Mîrektiya Erdelanê û Mîrektiya Baban bi bîr tîne. Cegerxwîn berê xwe dide dîroka kevin û behsa Mîtan, Sobar, Mîdya, Kardox, Hewrî, Elwend û Kaşoyan dike; herweha behsa Eyûbî û mîrekên serdema îslamî jî dike. Di mijara lehengên dîrokî de repertura her du helbestvanan jî dewlemend e. Hacî tevî navên mîrên Kurdistanê navê Selahedîn, Erdeşêr, Deysem, Qubad û Baz hiltîne. Lê repertuara Cegerxwîn ji ya Hacî dewlemendtir e. Ew jî tevî navê mîr û mezinên dîroka nêzik; behsa Ferîdûn, Erdeşîr, Keykawis, Xesro, Direfs, Guhderz, Ristem, Merwan, Ebû Mislim, Şêrgûh, Selahedîn, Kerîm Xan, Ferhad, Salar, Deysem û Behram dike.

Bêguman di mijara şanazîkirina bi dîroka Kurdî de helbesta herî navdar “Kî Me Ez” a Cegerxwîn e. Ev helbest seranser li ser vê nêrîna romantîkî hatiye hûnandin. Di vê helbestê de lehengê herî bihêz ê Cegerxwîn Selahedîn e. Helbestvan serfiraziyên Selahedîn yek bi yek dijmêre û li ser hîsabê Kurdayetiyê şanazî pê dike. Selahedîn ew kes e ku leşkerê Richard şikandiye û hemû Rojhilata Navîn parastiye, Tirk û eceman xwe dane ber siya wî û padişahan serê hespê wî girtîye. Di helbesta Cegerxwîn de ji bilî Selahedîn, Erdeşêr û Noşîrewan jî pehlewane dîroka Kurdan in. Di serdema wan de sînoren hukumraniya Kurdan berfireh dibe û Kurd ji hind û yûnanan xeracê distînin (Cegerxwîn 2003, r. 15-16). Bi vî awayî Cegerxwîn di dîroka Kurdan de behsa serdemeke zêrîn dike û ji bo avakirina paşerojê geş tabloyê romantîk pêşkêş dike.

4. 4. Wek Desthilatdarên Komela Kurdî Dijayetiya Şêx, Axa û Began

Yek ji taybetmendiyan rêbaza romantîk ew bû ku peyrevên vê rêbazê li dijî çîna arîstokrat derdiketin û behsa wekheviya civakî dikirin. Ji xwe erkeke diyar a helbesta romantîk jî dijayetiya desthilata siyasî û behskirina kêşeyên komelayetî û siyasî bû (Reûf Îsmail 2010, r. 20). Di serdema Hacî û Cegerxwîn de arîstokratên komela Kurdewarî şêx, axa û beg bûn. Ji ber vê Hacî û Cegerxwîn di helbestên xwe de êrişî wan kirin. Xwestin xelkê li dijî wan hişyar bikin û otorîteya wan a li ser xelkê bişkînin. Lewra ev kesayet piranî ji hişmendiya neteweyî bêpar bûn, li dijî berjewendiyên neteweyî ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî û malbatî têdikoşin û xizmeta dijminên Kurdan dikirin.

Herwek li jorê jî hat diyarkirin dijayetiya arîstokratên Kurd di helbestên Hacî û Cegerxwîn de diyardeyeke mitleq nîne, lewra ji ber ku her du helbestvan di çarçoveya romantîzma neteweyî de li meseleyên civakî û siyasî mêze dikin, gelek caran nakokiyên çînî li aliyekî dihêlin û wan arîstokratên Kurd ên ku Kurdayetî kirine, wek qehremanên neteweyî nîşan didin û navê wan bi pesn û minet bi bîr tînin. Lê arîstokratên ku ne bi vî awayî ne wek dijmin dibînin û li dijî wan têdikoşin. Ev jî nîşan dide ku hem Hacî hem jî Cegerxwîn, ji nakokiyên çînî zêdetir ji ber

berjewendiyên neteweyî rexne li arîstokrat û malmezinên Kurdan digirin û pîvana wan a eslî “netewe” ye. Ji ber vê çendê di helbestên Hacî û Cegerxwîn de ew kesayetên arîstokrat ên ku tên rexnekirin, ew kes in ku xêra wan ji bo xelkê nîne û li dijî pêşketina gel in. Bi dîtina Hacî û Cegerxwîn, ev kes xelkê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin û ji bilî mêtîngerî û xapandinê tu sûda wan ji bo komela Kurdî nîne (Alan 2009, r. 226-228). Di dîwana Hacî de ev mijar tenê li ser dijayetiya şêxan tê behskirin, lê di dîwanên Cegerxwîn de ji ber paşxaneyê wî ya fikrî ya marksîzmê tevî dijayetiya şêxan, dijayetiya axa û began jî tê kirin.

Bi dîtina Hacî, şêx li pêşiya pêşketinê asteng in, xelkê ji karûbarên dinyayê û xwendinê sar dîkin û wan hînî tenbeliyê dîkin. Çavê wan li malê xelkê ye û li ser piştê xelkê ji xwe re serwetê kom dîkin (Koyî 2004, r. 60-61). Xaneqa û tekyayên wan cihê şêlandina mirovan û komgeha mal û serweta xelkê ne. Loma jî Hacî bang li xelkê dike ku tu carî nekevin tora şêxan û xwe ji wan biparêzin. Lewra bi dîtina wî, şêx bi van kar û helwestên xwe, ne ku rêberiya xelkê dîkin, beravajî wê rêberiya xelkê dîkin (Koyî 2004, r. 104).

Cegerxwîn ne tenê êrîşî şêx, axa û began dike herweha êrîşî îdeolojiya wan jî dike. Bi dîtina wî dîn ne ew e ku xelk biçe destê şêxan maç bike, di vê serdemê de dînê rastîn ew e ku xelk ji bo serxwebûna xwe kar bike. Lewra li gor wî, şerên dînî êdî bi dawî bûne. Ji ber vê çendê jî di cîhana pêşketî ya Ewropayê de xortên Fransî û Îngîlîzî ne ji bo dîn, belku ji bo neteweya xwe şer dîkin. Bi dîtina Cegerxwîn Kurd heta nexwînin û hişyar nebin ew dê her di bin hikmê şêx, axa û began de bin (Cegerxwîn 1992, r. 26).

Bi baweriya Hacî û Cegerxwîn şêx li pêşiya xwendina xelkê rêgir in û ji ber xebatên wan medrese kavil bûne. Hacî şêxan wek mirovên durû bi nav dike û dibêje “tu kes ji wan naçe mizgevtê û medrese jî bêxwedî hiştine.” (Koyî 2004, r. 115). Herwek Hacî Cegerxwîn jî wan bi kavilkirina medreseyan tawanbar dike (Cegerxwîn 2003, r. 129) û dijayetiya wan a li hember xwendin û pêşketinê berçav dike.

Hacî jî Cegerxwîn jî şêxan û arîstokratên dewlemend bi xizmetkirina dijminan tawanbar dîkin û wan wek dijminê millet nişan didin. Hacî dibêje ew kesê dewlemendekî baş be, bêguman bendeyê Romiyan e û mirovekî nepak e. (Koyî 2004, r. 107). Cegerxwîn jî beg, axa û şêxên ku mîna mar û mişkan in, hevkar û hevparê dijmin dizane û wan wek tabûra pêncan a dijmin li qelem dide (Cegerxwîn 1992, r. 407).

Ji ber van kirinên kirêt ên şêxan her du helbestvan jî van kesayetên wek mirovên nepak, şehwetperest, nêrbaz û bêrewişt berçav dîkin. Hacî dibêje şêx mîna seyên har di kolanan de li pey jinan digerin û ne tenê mêbaz in di heman demê de hetîwbaz in jî (Koyî 2004, r. 60, 61, 107). Cegerxwîn jî van kesayetên bi keçperestiyê bi nav

dike û wan di nav sefahetê de dizane (Cegerxwîn 1992, r. 303). Ji ber vê jî bi dîtina wan tekyayên şêxan ciyê pîsî û bênamûsiyê ne. Li gor Hacî divê mirovekî têgihîştî neçe wan mekanên pîsiyê, (Koyî 2004, r. 107) lewra li van deran ne dîn tê fêrkirin, ne jî namûs tê parastin (Koyî 2004, r. 67). Ji ber vê Hacî xaneqayan wek cihê “edeb-xaneyaya ‘am” bi nav dike û sedemê çûyîna xelkê jî wek “qezaya hacet”ê dizane (Koyî 2004, r. 162). Cegerxwîn jî hişyarî dide xelkê û dibêje Neqşebendî û Qadiriyan tekyaya kirine xana keran, loma jî divê xelk xwe navêje nav wî agirî (Cegerxwîn 2003, r. 109). Ji ber vê helwesta wan, her du helbestvan jî ji aliyê şêxan ve bi kufrê tînan tawanbarkirin û gelek caran ji ber vê çendê neçar dibin xwe biparêzin.

Wişke softî billê be şêxî teres
Ba be ser ma neyê mîsalî heres
...
Hez dekey têbigeyî le bêdînî
Bibe derwêşî şêxekan be hewes

(Koyî 2004, r. 95)

4. 5. Helbestvanên Romantîk Wek Rêberên Komela Nûjen Dêrdikevin Pêş

Helbestvanên romantîk ên Kurd jî wek ronakbîr û edîbên Fransî bi têkoşerîya xwe dêrdikevin pêş û rêberîya felsefeya nû ya jiyane dikin. Lewra bi gotina Octavio Paz “*Helbesta romantîk îdîa dike ku ew bi xwe kirdar e. Helbest tenê gotin nîne, danezanekê baweriyê û çalakî ye.*” (Paz 1996, r. 62). Bêguman helbestvan jî di vê rewşê de ne tenê ronakbîrekî derveyê çalakî û rûdanan e, bikerekî çalak û rêberê cemawerê bixwe ye. Hacî û Cegerxwîn, dema şêx û axa û began li ber çavê xelkê reş dikin mirovên mîna xwe wek rêber û pêşewa nîşan didin. Hacî dixwaze Kurdan li beramberî pêşketinê cihanê û dewletê hişyar bike, lewra heta Kurd hişyar nebin û ji dewletê agahdar nebin dê di bin barê Romîyan de bimînin. Hacî ji ber ku Kurd di şûna gotinê wî yê rast de (qisey sax) dilê xwe ji gotinê pûç ên şêxan re (wehîmey şêxekan) vedikin, dixwaze xweliyê li serê xwe bike, lewra doza hişyar-kirina Kurdan jê re bûye “îlletî sewda”. Bi dîtina wî eger Kurd guhdariya wî nekin dê roj bê xwe bê weris bixeniqînin. (Kê dellê Kurdekan be îdrak in / Bes e em neqs e givê le min naken / Le qisey saxî min xelê degirin / Wehîmey şêxekan le dill degirin) (Koyî 2004, r. 107). (Ta le jêr barî Romîyan nemirin / Zehmet e qedrê beytî min bigirin / Qurşî kam cê bikem be ser xo da / Eme lêm bûyte ‘îlletî sewda) (Koyî 2004, r. 108). (Qurî kiwê kem be ser xoma le xurbet / Xewim nayê le daxî milk û mîllet / Eger wek min xeberdar bin le dewlet / Le heyfan xo dexinkênin be bê pet) (Koyî 2004, r. 135).

Cegerxwîn ji Hacî gavekê pêşdatir diçe û xwe wek rêber û seydayê Kurd bi nav dike. Wezîfeya xwe teblîxkirina Kurdan dizane, ji gotinên xwe re dibêje “ayet” û felsefeya xwe wek dînekî raber dike. (Wezîfey xom her teblîxî Kurd e / Le mirdû herçî demînî naw e. / Cegerxwîn gerçî seydayê Kurd e, / Ta êsta pesnî kesêk nedawe.) (Cegerxwîn, 1992, r. 33). (Xêzên me nivîsîne bi xwe ayetê Kurd in; / Dê piştî me re ew di civatan de bixwînin.) (Cegerxwîn 1992, r. 52) (Ezê oleke pir ciwan çêbikim / Ji bo ez di wê de ewan rê bikim.) (Cegerxwîn 1992, r. 72).

Hacî û Cegerxwîn ji ber ku xwe wek rêberên civakî dibînin derbarê pêşketina komela Kurdî de jî pêşniyazên xwe raber dikin. Hacî dawa li Kurdan dike ku bixebitin û ji aliyê aborî ve mihtacî kesekî yan welatekî din nebin. Ji ber ku leymûn, xurme, rûnê zeytê û tiştên bi vî awayî ji Bexdayê tînan Kurdistanê Hacî dilgiran e û dibêje divê Kurd vana bi destê xwe li welatê xwe hilberînin (Koyî 2004, r. 153). Cegerxwîn jî dawa dike ku welat bi her awayî bê avadankirin. Li her cihê welat dezgeh, xwendîgeh û zanîngeh bînin damezirandin. Li kargehan firoke bînin çêkirin (Cegerxwîn 2003, r. 61-63). Li ser çeman pir û ji bo erebeyan riyên şose bînin çêkirin, di ser riyên hasin re tirên biçin û bînin, mirov bi riyê veguhestina asmanî li ser stêrkan bigerin, elektrîk li her cihê welat bê belavkirin û li her derî serayên bilind bînin lêkirin (Cegerxwîn 1997, r. 38, 95). Ev jî nîşan dide ku Hacî û Cegerxwîn edebiyatê wek çalakiyê siyasî û civakî dibînin û xwe jî wek rêberên nû yê civata Kurdewarî pênase dikin.

4. 6. Di Şûna Hesta Dînî de Xurtbûna Hesta Welatparêziyê

Piştî serdema ronakbîriya Rojava li Ewropayê hesta dînî her ku çû kêm bû. Mirovên mîna Martîn Luther li hember mezhebê katolîk ê ruhanî mezhebêkî eqlî û sekuler damezirandin. Loma jî Octavîo Paz li ser tîkiliya romantîzmê û protestaniyê dibêje “*Sînorên nivîskî yê romantîzmê digel sînorên dînî yê protestaniyê eynî ne.*” (Paz 1996, r. 66). Wate edîbên romantîk dema edebiyata klasîk red dikirin, ew paşxaneyê wî ya manewî jî red dikirin û xwe li ser manewiyateke nû ji nû ve saz dikirin. Bêguman ev manewiyata nû jî di bin sîbera dînê sekuler ê protestaniyê de “welatparêzî” bû. Di sedesela XIXan de ji ber ku her tişt li ser nasnameya neteweyî careke din dihat pênasekirin bi gotina Thomas Nipperdy “di vî serdemê de neteweyî bûbû dînekî bihêz ê laîk.” (Ersanlı 2009, r. 32).

Di edebiyata klasîk a Kurdî de jî çavkaniya manewiyata helbesta berê dîn bû, lê di helbestvanên romantîk ên mîna Hacî û Cegerxwîn de êdî şopên manewiyata berê nayên dîtin. Helbestvanên klasîk pesnê Xwedê û pêxember didan, lê di helbestên Hacî û Cegerxwîn de pesnê welat û miletî tê dayîn. Hacî şivan û gavanekî Kurd beramberî du lek leşker dizane, şivaneke jin a Kurd li hember dijmin wek

qesab tewsîf dike, Hatemê Tai fîdayê cotkarekî Kurd dike û Alê Bermek jî dike qurbanê rêncberekî Kurd. Kurd di çavê Hacı de weha wêrek in ku mirîşkên wan jî hêjayî nêçîrvanê şahan in (Koyî 2004, r. 75, 81). Cegerxwîn ji Hacı gelek pêşdetir diçe û hezkirina welat û mîletperestiyê wek dîn şîrove dike (Cegerxwîn 1992, r. 42). Welat ji bo Cegerxwîn “dîn, îman, but û lat” e. Ji ber vê çendê Kurd wî wek gawir û bêdîn bi nav bikin jî ji bo Cegerxwîn ne xem e, lewra dîn û îmana wî welat bi xwe ye (Cegerxwîn 1992, r. 113). Loma jî li ser navê hemû xortên Kurd mîletperestiyê wek dîn qebûl dike.

Ola me xortan mîletperestî,

Ji me dûr dixî xwarî û sistî

(Cegerxwîn 1992, r. 114)

4. 7. Li Hember Nêrîna Manegerî Cihgirtina Nêrîna Madegerî

Herçend romantîkên Rojava derbarê dîn û nêrîna manegeriyê de yek deng nebin jî bi peydabûna fikra pozîtîvîzmê re manewiyat û dîn ji binî ve hatin redkirin. Piştî demekê pozîtîvîstan li ser mîrata romantîkan fikrên xwe yê zanistperweriyê sebandin û dema romantîzm gihîşt ronakbîrên Rojhilat romantîzm û pozîtîvîzm tîkelî hevdu bûbûn jî. Lê bi nêrîneke giştî ji xwe piştî tevgera Ronesansê di nav ronakbîrên Rojava de karîgeriya dîn û manewiyatê şikiyabû. Ji ber vê çendê Octavio Paz jî balê dikêşe ser vê rasyonelîzasyonê û dibêje “*Di serdema navîn de helbest di bin xizmeta dîn de bû; lê di serdema romantîk de rastî bû dîn.*” (Paz 1996, r. 56).

Di sedsala XIXan de pozîtîvîzm jî herwek romantîzmê di bin navê nûjeniyê de di nav ronakbîrên Osmanî de belav bû. Îbrahîm Şînasîyê ku wek damezirînerê edebiyata nûjen a Osmanî tê qebûlkirin, dema li Parîsê ye Ernest Renanê pozîtîvîst dinase û dikeve bin karîgeriya fikrên wî. Herweha her du edîbên pêşeng ên edebiyata Osmanî Namîk Kemal û Ziya Paşa jî di nav çalakîyên Komeleya Osmanîyên Nû de (Yeni Osmanlılar Cemiyeti) di bin bandora fikrên pozîtîvîst de dimînin. Ji xwe di 1894an de bi derketina Kovara “*Servetî Funûn*”ê re pozîtîvîzm di nav edebiyata Osmanî de bi awayekî bihêztir cihê xwe digire (Yüce 2012, r. 2165-2166) û wek fikreke nûjen tê pêşwazîkirin.

Di nav vê fezaya ronakbîrî de fikra pozîtîvîst di nav ronakbîrên Osmanî yê ne Tirk de jî belav dibe û bi vî awayî Hacı Qadirê Koyî jî ji fikrên pozîtîvîzmê agahdar dibe. Di encama vê kartêkirinê de jî Hacı di helbesta Kurdî de yekem car ji hebûna tiştên ku nayên dîtin û nayên bihistin guman dike. Lewra Auguste Comteê ku danerê fikra pozîtîvîzmê ye dîroka mirovahiyê li ser qonaxên dînî, metafîzîkî û pozîtîfî ve dabeş dike û dibêje “*di serdema pozîtîfî de tiştên ku bi azmûnên zanistî neyên*

destnîşankirin cihê baweriyê nînin.” (Yüce 2012, r. 2159). Ji ber vê çendê Hacî jî ji ber ku nayên dîtîn û nayên bihistin guman dixê ser hebûna “hûr, xilman û perî”yan û dibêje: (Basî hûr û basî xilman û perî bo min meken / Wek mehî bêmihîrî xom nemdîtuwe û nembîstuwe) (Koyî 2004, r. 43).

Cegerxwîn nêrîna manegeriyê ji binî ve red dike û bi nêrîneke materyalîstî her tiştî ji nû ve şîrove dike. Bi dîtina wî tiştên ku bi “tekrar û tehsîl”ê yanî bi azmûnên zanistî neyên îspatkirin bêbingeh in û divê xelk guhên xwe nede tiştên bi vî awayî. Herweha divê berhemên edebî û dînî jî ji nû ve bîn xwendin û bi nêrîneke materyalîstî bîn şîrovekirin. (Çi tiştê ko esil nîne çima pir jê xeberdar î / Tu vî tiştî qe nas nakî bi tekrar û bi tehsîlê / Wekî min gotine Pîrê Cizîr û Hafîzê Şîraz / Serîhê wan temaşa ke, meke bawer bi te’wîlê) (Cegerxwîn 1992, r. 172). (Go: Ma te diye, fetwa te qey qewlê qedîm e? / Min gotê: Bi min qewlê qedîm xewn û xeyal e (Cegerxwîn 2003, r. 197).

Cegerxwîn di hin helbestên xwe de van fikrên xwe zelaltir dike û êdî wek mirovekî materyalîst; Xwedê, hemû dînan û fikra afirandina cîhanê jî red dike. Bi dîtina wî Xwedê nîne û kesek jî nîne ku bikare cîhanê biafirîne, lewra cîhan ji mêj ve her hebûye û dê her bimîne. Bi dîtina wî çawa ku Xwedê nîne nebûn jî nîne her tişt di nav tevger û guherîna de ye û dê mirov jî wek madeyek her bimîne. Loma jî hemû dîn û mezheban derew dizane û peyxemberan jî wek rêberên civakî qebûl dike (Cegerxwîn 1997, r. 161).

Bêguman rasyonâlîzasyona ku di pêvajoya modernîteya Ewropayê de her di werarê de bû di qonaxa pozîtîvîzmê de gihîşt lûtkeyê. Ji ber vê çendê dema ronakbîrên dewletên Rojhilat li hember Rojava bi paşvemayîna xwe hesiyar, çareserî di wergirtina zanistên pozîtîf ên Rojava de dîtîn û zanistên pozîtîf wek rêçeteya rizgariyê li ser xelkên xwe yên nexweş belav kirin. Di vê çarçoveyê de herwek helbestvan û ronakbîrên Rûs, Tirk, Fars û gelên din ên Rojhilatê, helbestvanên romantîk ên Kurdistan jî di helbestên xwe de xelk ji bo fêrbûna zanistên nûjen han dan.

Hacî sedemê paşvemana Kurdistan di perwerdeya dînî ya çewt de dibîne û li dijî vê têgihîştina şaş a dînî, rîya eqil û fenên nû nişanî xelkê dide. Bi dîtina wî cenet ne ji bo şivan û gavanan e, ji bo xwedî fen, ilm û îrfanê ye. Bi zîkr û diayan mirov nikare bigihîje miradê xwe û tenê bi rîya xebatê mirov dikare daxwazên xwe bi cih bîne. Bi dîtina Hacî dema xelkên Rojhilat bi rimûz û naz û niyazan mijûl dibûn Ewropa bi rîya fenê gihîştibû pileya “îcaz”ê (Koyî 2004, r. 104) û zanîna wan a cîhanê ewçend zêde bûbû ku êdî li ser valahiya asîman lêkolîn dikirin.

Li beramber van pêşketinan Hacî alîgirê vê fikrê ye ku dîn bi nêrîneke rasyonel bê şîrovekirin. Ji ber vê çendê vê hedîsa Pêxember a ku dibêje “Utlubu’l ‘ilme we lew fî’s-Sîn”ê (Eger di Çînê de be ji daxwaza ‘ilm bike) jî xwe re dike palpişt û tehsîla

zanistên fenê wek wacibeke dînî û eqlî nişan dide (Koyî 2004, r. 105). Weku diyar e Hacî mîna pozîtivistên Ewropayî ji rêça dîn dernakeve, lê di bin karîgeriya vî fikrî de û li hember pêşketinên Ewropayê neçar dimîne dîn bi awayekî rasyonel şîrove bike. Bi dîtina wî eger dîn rast neyê şîrovekirin û zanistên nûjen neyên tehsîlkirin dê dîn jî ji nav biçê. Loma jî dibêje “ku alim birçî bimîne dê mushefa Xweda bi du nanan bifiroşe, sofî sed nimêjî dê bi tasek av bide û Şîî jî ji tîna sînglêdana xwe dê Huseyn û Hesên bi du dilopên avê bifiroşin.” (Koyî 2004, r. 106). Cegerxwîn jî xwendina zanistên fenê ji bo pêşvebirin û ronîkirina welat tiştêkî pêwîst dizane (Cegerxwîn 1992, r. 156) û herwek Hacî xwendina zanistên nû hem li ser mêran hem jî li ser jinan ferz dike.

Nêr û mê lem hedîse ferqî nîye
Ger mela nehîyî fermû dînî nîye
(Koyî 2004, r. 105)

Ey keçê rabe bixwîne da tu serbest her bijî
Zû ji xew tu ser hilîne bes bimîne bêmijî
(Cegerxwîn 1992, r. 132)

5. ENCAM

Herçend romantîzma Kurdî mîna romantîzma gelên din ên Rojhilat ji romantîzma Rojava derengtir rûdabe jî digel romantîzma Tirk û Fars û Ereban hema hema hevtemen e, lê Kurd jî van gelên navborî ciyawaztir qewmekî bêdesthilat bûn, ji ber vê jî edîbên Kurd jî gelek aliyan ve ji wan derfetên edîbên romantîk ên neteweyên serdest bêpar bûn. Di wan salan de rojname û çapemeniyêke azad a Kurdan nebû ku fikrên edîb û ronakbîrên Kurdan di nav xelkê de belav bike û bikare raya giştî bi pêşketinên cihanê agahdar bike. Lê milletên cîranên Kurdan tevî derfetên desthilatê xwedî rojname û çapemenî bûn û dengê wan berztir derdiket. Ev bêderfetî û sernegirtina serhildanên Kurdan ji bo avakirina dewleteke Kurdî bûn sedem ku romantîzma Kurdî wek hêviyêke serqurmiçandî tenê di sedsala XI-Xan de nemîne di dirêjahiya sedsala XXI de jî dewam bike. Ji ber vê çendê, herçend di navbera wan de sedsal hebe jî helbestên Hacî Qadirê Koyî û Cegerxwîn ji gelek aliyan ve li hev diçin û wek dewama hev xuya dikin. Helbet ev lihevçûn, ji ber neguherîna mercên siyasî, civakî û aborî ya komela Kurdî bû.

Romantîzma Hacî û Cegerxwîn herçend bi rewşa komela Kurdewarî ve girêdayîbe jî taybetmendiyên romantîzma Rojhilat û Rojava jî nişan dide. Rênişandana komelê, fikra neteweyî, hişmendiyê ziman, li dijî hesta dînî xurtbûna hesta welatperweriyê,

şanzîkirina bi dîroka neteweyî û têkoşerî taybetmendiyên romantîzma Rojava û nemaze taybetmendiyên romantîzma fransî bûn û ev taybetmendî di romantîzma Kurdî de jî reng vedabûn, lê di heman demê de daxwaza fêrbûna zanistên pozîtîf, pêşketina madî û aborî û teqlîdkirina Rojava taybetmendiyên romantîzma Rojhilat bûn û ev taybetmendî jî di edebiyata romantîk a Kurdî de dihat dîtin. Ji ber vê çendê jî mirov dikare bibêje ku edebiyata romantîk a Hacî û Cegerxwîn hem taybetmendiyên komela Kurdî nîşan dide, hem xwedî karektera romantîzma rojhilatî ye, hem jî di çarçoveya giştî ya romantîzma rojavayî de ye.

Taybetiya herî berbiçav a romantîzma Hacî û Cegerxwîn fikra neteweyî ye. Ji ber vê jî romantîzma wan zêdetir bi aliyê xwe yê neteweyî û siyasî derdikeve pêş. Her du helbestvan jî edebiyatê dikin navenda karûbarên siyasî û civakî. Helbesta wan di bin xizmeta hişyarkirina gel, afirandina fikra neteweyî, nasandina pêşhatên cîhanê, handana xelkê ji bo xwendin û zanistên pozîtîf, dijberîkirina diyardeyên kevin û dijayetiya nûnerên civaka paşdemayî de ye. Bi vî awayî her du helbestvan jî li ser şopa ronakgerên Ewropayî wek pêşengên romantîzma neteweyî di helbesta nû ya Kurdî de dibin damezirînerên îdeolojiyê nû.

6. ÇAVKANÎ

- Aytaç, G. (2012). *Yeniçağ Alman Edebiyatı* (Edebiyata Alman a Hevçerx). Ankara: Weşanên Doğu Batı.
- Alan, R. (2009). "Em di Eyna Dîrokê de", *Bendname*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Bruinessen, M. V. (Edt. Abbas Vali), (2005). "Ehmedê Xani'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanışının Ortaya Çıkmasındaki Rolü", (Mem û Zîna Ehmedê Xani û Rola Wê ya di Derketina Hişyariya Neteweyî ya Kurdî de) *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (Rîşeyên Neteweperweriya Kurd), (ç. 1.) Stenbol: Weşanên Avesta.
- Cegerxwîn (1992). *Dîwana Yekan*, (ç. 1.). Stenbol: Weşanên Deng.
- Cegerxwîn (1992). *Sewra Azadî*, (ç. 1.). Stenbol: Weşanên Deng.
- Cegerxwîn (2000). *Aşitî*, (ç. 2.). Stenbol: Weşanên Deng.
- Cegerxwîn (2003). *Kî Me Ez*, (ç. 3.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Cegerxwîn (1997). *Zend Avista*, (ç. 2.). Stenbol: Weşanên Deng.
- Cegerxwîn (2003). *Ronak*, (ç. 3.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Cegerxwîn (2003). *Şerefnameya Menzûm*, (ç. 2.). Stenbol: Avesta.
- Cegerxwîn (2003). *Salar û Mîdya*, (ç. 3.). Weşanên Avesta.
- Cegerxwîn (1995). *Jînenîgariya Min*, (ç. 1.). Stockholm: Weşanên Apec.
- Cegerxwîn, Keyo (1985) "Jînenîgariya Cegerxwîn", *Kovara Hêvî*, 3, 17-18.
- el-Hemdani, S. E. (1989). *Mezahîbu'l-Edebî'l-Xerbî we Mezahîruha fî'l-Edebî'l-Erebiyî'l Hedîsî*, (Rêbazên Edebiyata Rojava û Rengvedana Wê Di Edebiyata Erebi ya Nûjen de). Mûsil: Metbe'ût-Wezaret'it- Te'lîmî'l-Alî.
- Ersanlı, B. (2009). *İktidar ve Tarih*, (Desthilat û Dîrok), (ç. 3.). Stenbol: Weşanên İletişim.

- Firset, L. (1978). *er-Romansîyye*, (Romantizm). Mewsu'etu'l-Mustelehî'n-Neqdî (c. 2, r. 12). Bexda: Daru'l-Hurriyye.
- Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, (Li Kurdistanê Neteweperwerî û Ziman), (ç. 1.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Husên, H. (2010). *Rêbaze Edebiyekan*, (ç. 2.). Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Kerestecioğlu, İ. Ö. (Berhevkar: H. Birsen Örs), (2009): "Milliyetçilik: Uyuyan Güzeli Uyandıran Prensten Frankeştayn'ın Canavarına" (Neteweperwerî: Ji Prens ku Rinda Razayî Radike Ber bi Dirindeyê Frankeştayn), *19. Yüzyıldan 20. Yüzyıla Modern Siyasal İdeolojiler* (Ji Sedsala 19. Heta Sedsala 20. İdeolojiyên Siyasî yê Nûjen), (ç. 3.). . Stenbol: Weşanên Zanîngeha Bîlgî ya Stenbolê.
- Koyî, H. Q. (2004). *Dîwan*, (ç. D.). Weşanxaney Nefelê.
- Serdar, H. M., Kerîm, M. Ş. (1984). *Dîwanî Hacî Qadîr Koyî*. Sine: ?
- Hiseynî, R. S. (2006). *Qutabxane Edebiyekan*, (ç. 1.). Hewlêr: Dezgay Twêjînewe û Billawkirdnewey Mukriyanî, Çapxaney Wezaretî Perwerde.
- Moran, B. (1991). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, (ç. 8.). Stenbol: Weşanên Cem.
- Nesrîn, R. İ., (2010). *Erkî Şî'r Le Edebî Kurdîda*, (ç. 1.). Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Olçay, T. (2008). "19. Yüzyıl Rus Edebiyatında Romantizm Üzerine" (Di Edebiyata Rûsî ya Sedsala 19an de li ser Romantizmê). *Kazım Karabekir Eğitim Fakültesi Dergisi (Kovara Fakulteya Perwerdeyê ya Kazım Karabekir)*, 17, 367-381.
- Paz, O. (1996). *Çamurdan Doğanlar* (Kesên ku ji Heriyê Çêbûne). (Wergêr: Kemal Atalay). Stenbol: Weşanên Can.
- Xeznedar, M. (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî*, (ç. 2.). Bergî Çarem. Hewlêr: Çapxaney Aras.
- Yüce, S. (2012). "Felsefi Düşüncenin Edebiyata Yansıması: Türk Edebiyatında Pozitivist ve Materyalist Anlayış" (Rengvedana Fikra Felsefî ya li ser Edebiyatê: Di Edebiyata Tirkî de Têgihîştina Pozitivist û Materyalist). *Turkish Studies - International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, 7(1), 2155-2183.

Extended Abstract

As a literary method, Romanism, in XVII century first appeared in England and in a short time spread among the literature of European nations. Following this, under these different circumstances of these countries Romanticism took a new form. In this way, it took place with a sentimental interpretation in England, with an intellectual interpretation in France and with a national interpretation in Germany and Italy.

In the last half of XIX century when Ottoman state with the Tanzimat accepted the development of European countries and followed them as a model, it wanted to reach the stage of these developed countries by sending students there. Within this framework, the intellectuals who were sent to France were affected with romantic method and after returning they spread it among the Ottoman intellectuals by translations. In this way, the French romanticism spread the Ottoman people. After a while this effect appeared among the Ottoman intellectuals as pro-constitution and among the intellectuals subject to Ottomans as pro-independence against the monarchy of Sultan Abdulhamit II.

When this happened in Istanbul, the capital of the Ottoman, Hacı Qadirê Koyî was also in Istanbul and for the first time he represented the national Romanticism as a poet and pioneered this method as an intellectual of an oppressed nation. Because of the fact that in Hacı Qadirê Koyî's century the Kurds couldn't reach their political aims, throughout the XX century the idea Romanticism remained lively in the Kurdish literature. Therefore, a century after Hacı Qadirê Koyî and following him as a short time, Cegerxwîn represented the national Romanticism.

Although there were also some differences between Hacı and Cegerxwîn, when one takes attention to their writings it is very clearly understood that both the poets in the national Romanticism meet one other and in this point Cegerxwîn is a follower and inheritor of Hacı Qadirê Koyî. When one pays attention to the subjects of their poems, this fact is clearly seen.

Hacı and Cegerxwîn had an idea about all the subjects such as national idea, importance of mother tongue, reviving of national history, strengthening the feelings of patriotism, praising the idea of rationalism and evaluating scientific positivism. Both of the poets explain the present tense as the period of struggle, the past tense as source of power and proud of a nation and the future tense as the period of success and performing of national goals.

In order to reach their goals, both the poets think that changing of Kurdish association and its pioneers must be necessary. Therefore, in Hacı's poets shaiks, also in Cegerxwîn's poets shaiks, aghas and begs were shown as the figures such as dishonests and foes of Kurdish people. Both of the poets showed those patriotics like themselves as pioneers instead of the feudal guides. In their opinions, the people must begin to follow the new and patriotic guides instead of shaiks, aghas and begs

Hacı and Cegerxwîn wanted to change the structure of the Kurdish association. Hacı reinterprets the religion and explains it rationally and suggests a new interpretation of the religion in order to develop. However, Cegerxwîn sees the religion as an obstacle to development of the national goals and rejects it and celebrates materialism. For this reason, he suggests a totally ideological change to the people.

All the points mentioned show that despite some differences between them, Hacı and Cegerxwîn, in their poems, deal with the common subjects and literature as a political effort.

Kurdish Contemporary Literature in Search for Ordo Amoris -Some Reflections on the Continuity of the Kurdish Literary Tradition and Ethics-*

Wêjeya Kurdî ya Nûjên
li Ordo Amorîs Digere
-Çend Pirs li Ser Berdewamiya Kevneşopiya
Edebî û Exlaqî ya Kurdî-

Joanna BOCHEŃSKA**

ABSTRACT:

Kurdish contemporary literature is often analyzed by the prism of the national identity ideas. However, as exemplified many times in novels and short stories identity can not be separated from ethical and philosophical

dimensions of human reality. Being based on Max Scheler's concept, *ordo amoris*, this article concentrates on the hierarchy of values, which seems a very meaningful continuation of ethic and literary tradition that has formed Kurdish culture for a long time. According to Max Scheler it is the distortion of harmonious "order of Love" that can make a visible sense of it. By exploring the state of weakness and many dark sides of man's soul by the prism of its oral, classical and mystical background Kurdish literature becomes a part of the world's important literary heritage. However, to understand it adequately one should be aware of the still alive motifs and values constructing the continuity of Kurdish culture.

* The article has been written in the scope of the research project (How to make a voice audible? Continuity and change of Kurdish culture and of social reality in postcolonial perspectives) approved for financing by the decision number DEC-2012 / 05 / E / HS2 / 03779 of The National Science Center of Poland.

** Dr. Section for Kurdish Studies at the Department of Iranian Studies of the Institute of Oriental Studies of Jagiellonian University, Kraków, Poland.

Dr. Zanîngeha Jagiellonianê, Enstîtuya Xebatên Oryantalîstîk, Beşa Xebatên Îranî, Binbeşa Xebatên Kurdî, Krakov Polonya.
e-mail: joanna.bochenska@Kurdishstudies.pl, joanna.bochenska@uj.edu.pl

Keywords: Kurdish contemporary literature, Kurmanji, ethics, philosophy, values.

PUXTE:

Wêjeya Kurdî gelek car ji perspektîfên fikrên nasnameya neteweyî tê nirxandin. Lêbelê naveroka tekstên wêjeyî gelek car îspat dike ku pirsra nasnameyê ji babetên etikî û felsefî nikare bê veqetandin. Bingeha vê nivîsê konseptê *ordo amoris* ya filozofê Almanî yê Max Schelerî ye û hiyerarşîya nirxan ber bi çav dike ya ku berdewamiya taybet ya kevneşopîya wêje û exlaqên Kurdî ji demên berê ye. Li gor Max Schelerî ev xerakirina teraza “sîstema evîne” ye ku maneya vê sîstemê derdixe holê. Wêjeya Kurdî ya nûjên bi bikaranîna tecrûbeya edebiyata devkî û klasîk û tesewîfî li aliyên tarî û qels yên ruhê mirovî digere û ji ber vê yekê dibe perçeya giring ya mîrasa edebiyata din-yayê. Loma ji bo nirxandina kûr ya wêjeya Kurdî ya nûjên hişyarmendiya wan motifên taybet yên ji demên berê pêdiviyê.

Peyvên sereke: wêjeya Kurdî ya nûjên, Kurmancî, exlaq, felsefe, nirx.

Love means to learn to look at yourself
The way one looks at distant things
For you are only one thing among many.
And whoever sees that way heals his heart,
Without knowing it, from various ills—
A bird and a tree say to him: Friend.

Then he wants to use himself and things
So that they stand in the glow of ripeness.
It doesn't matter whether he knows what he serves:
Who serves best doesn't always understand.

Czesław Miłosz

1. INTRODUCTION

During the 20th century for many Kurdish authors writing in Kurdish became an important way to confirm their own national identity. However, as stressed by Darîne Daryo - the main character of one of Hesênê Metê's short stories, creating literature is not only a question of ideology, politics or family honor but first of all it should answer the writer's deep need to tell the story and to do it in the best possible way. This is the very important moment when literature becomes both: philosophical or an ethical problem to resolve and subtle art of composition. It is

not a coincidence that ethical issues have been presented by the prism of literature, especially character's choices, behavior and dilemmas, not only by writers but philosophers as well to give the example of Alasdair MacIntyre's¹ remarks on Homer and Jane Austen's novels. Contemporary Kurdish literature can be a great example of seeking foundations for the system of values that is defined in this article following Max Scheler's² *ordo amoris* term.

2. *ORDO AMORIS* OF MAX SCHELER

In some inevitable simplification Scheler's *ordo amoris* (Scheler's translation: "the order of love and hatred") can be regarded as the hierarchy based on the multidimensional meaning of Love, which governs the understanding of other values. *Ordo amoris* is not only the system of norms being given by someone (God), but is very much determined by human will. However, unquestionably, such Love is understood by Scheler, as the element of transcendental (or God's) order and that is why it is considered an objective quality not only subjective feeling of an individual. Such objective "order of love" is contrasted with rational philosophy postulate of objectivity based only on reason, which to Scheler rashly neglects the importance of other sphere of human spirit activity. The main human aim to follow should be to love in a way God loves. This way the act of God and human love can unify in one point of the world of values. *Ordo amoris* hierarchy consists of things "being worth our love", which is not static and invariable but dynamic and an evolving kind of structure. Love and hate are understood as the primeval acts, preconditions for any cognition and knowledge. We always love or hate something and that is why *ordo amoris* creates the basis for human choices, wishes, customs and deeds. Such structure can be created as well as distorted by all individuals and

1 Alasdair MacIntyre (1929), Scottish philosopher known for his critic on liberal modernity. Previously inspired by Marxism than returned to Aristotelian tradition attempting to revive it by so called "peculiarly modern understanding". The ethics and political philosophy become to be the central focus of his interests. His most acclaimed work *After virtue* was published in 1981 being the analysis of – as he thinks - lost legacy of the ancient virtue tradition. He was criticized by Polish philosopher Jacek Filek for neglecting the great heritage of 19th and 20th century German and Eastern Europe philosophical tradition.

2 Max Scheler (1874-1919), German philosopher, known for his contribution to phenomenology, ethics, and philosophical anthropology. His thesis devoted to *ordo amoris* was written in 1916, after his most important publication entitled *Der Formalismus in der Ethik und die materiale Wertethik*. It was planned as the part of bigger work *Ordo amoris und seinen Verwirrungen*, however was never finished.

societies. Making *ordo amoris* visible, considering its inner structure, hierarchy and – what is most important - its points of distortions - seems to Scheler crucial in understanding the deep dimension of each individual, social and national life. (Scheler 2013, p. 15-47) Following this concept I intend to analyze selected motives of Kurdish (Kurmanji dialect) oral and literary tradition. Max Scheler's *ordo amoris* is a good example of Western term and concept that can be suitable and to some extent compatible with Eastern (here - mainly Yezidi or Muslim) ethical experiences. It can be understood by the common heritage of thoughts called "classical Greek tradition" which Europeans selfishly use to covet for themselves. One of the very significant common elements seems to be the legacy of Aristotelian ethics and Neo-Platonism. Especially neoplatonic hierarchy of hypostasies is the most significant. It can be traced both in Yezidism, Islam (Sufism) and in Scheler's ethics, where the concept of hierarchy (order) of values unified by God-Love idea plays the crucial role. However, similar to other theories Scheler's term must be applied firstly to awareness and concern with the reality to which it is addressed.

3. THE ROLE OF ORAL AND CLASSICAL TRADITION IN FORMING KURDISH CONTEMPORARY LITERATURE QUESTS FOR VALUES

Kurdish tradition of telling stories abounds in ethical issues. The process of telling fairy tales and legends by storytellers – *çirokbêj* / *dengbêj*³ was a kind of moral education, where not only direct hints but rather the example of deeds and the listener's emotional identification with characters plays a crucial role in understanding the meaning of good and evil. MacIntyre and Bettelheim emphasized the role of heroic stories and fairy tales in moral education and in obtaining maturity⁴. For the first it was the patterns of the protagonists' deeds that provided the ability to recognize true and false and to act in the most proper way.⁵ For the second,

3 The word *çirokbêj* is much more appropriate because it literarily means the storyteller. *Dengbêj* was rather a bard or a singer. However in contemporary Kurdish cultural reality the term *dengbêj* seems to be applied – following the way Mehmed Uzun uses it in his novels and essays - for any kind of Kurdish storyteller.

4 Bruno Bettelheim (1903-1990), Jewish-American child psychologist and writer, born in Austria. Applying Freudian psychology, he analyzed selected fairy tales in his best-known book *The Uses of Enchantment* (1976). He revived the meaning of dreadful fantasy showing that dark motifs such as witch, death, abandonment and injuries help children to grapple with their own fears and problems hidden deep in their sub-consciousness.

5 According to the Scottish philosopher, one's character "can only be exhibited in a succession of incidents and the succession itself must exemplify certain patterns. So to understand courage as a virtue is not just to understand how it may be exhibited in character, but also what place it can have in a certain kind of enacted story." (MacIntyre 1985, p.125)

whose interests were focused rather on psychological dimensions, fairy tales with its multidimensional structure of combating the evil could be a kind of therapy for children who are unable to grasp the abstract way of thinking and resolving problems. Due to such therapy a child was enabled to gain wise moral maturity (Bettelheim 1985, p. 39). As we can explore in Kurdish fairy tale structure, which was also emphasized by Mehmet Uzun in the context of Kurdish culture, storytelling could be considered a kind of common therapy and cure in many hopeless situations (Bocheńska 2011, p. 54).

However we can not discuss the role of Kurdish oral tradition without mentioning the rich Yezidi tradition. In this field it is indispensable to point out Philip Kreyenbroek and Khalil Jindy Rashow's anthology and analysis of Yezidi diverse texts. Their role in forming Yezidi sacred history, esoteric and exoteric reality and ethics was stressed many times. First of all, it's useful to remember "Yezidi sacred history is topical and memorable, rather than linear and objective. It relates those events which are thought to be most important for a Yezidi to know, largely disregarding the element of linear time." (Kreyenbroek, Rashow 2005, p. 19). Considering it in the context of MacIntyre and Bettelheim remarks the "topical and memorable history" can be seen as the best fitting one for the goals of moral education. It consists of images and incidents that represent certain meaningful patterns of proper behavior. For the purpose of this article I will allow myself the comparison between Yezidi esoteric and exoteric knowledge based on the creative, life-giving power of Love (Kreyenbroek, Rashow 2005, p. 28) with Scheler's concept of *ordo amoris*. According to the German philosopher Love is also the God given, creative, dynamic power of life which is building the hidden structure of individual and social hierarchy of values. However, it is rather the distortion of this structure than its harmonious order that reveals the meaning of human fate and lot (Scheler 2013, p. 18).

Following the Kurdish oral tradition we can find ethical issues in classical Kurdish literature as well. Seeking the source of good and evil is one of Ehmede Khani's basic concerns in his immortal *Mem û Zîn*. Ethic presented in his work was based on sophisticated structure of events, main personages detailed description, monologues and dialogs rather than on abstract discourse. However, the latter was not missing, taking into consideration the introduction and the final part of the work. Following Muslim and -as very plausible- Yezidi tradition⁶ Khani had built the

6 The introduction of *Mam û Zîn* presents the Khani's work as the part of Muslim cultural and literary heritage. However there are some motifs which irrefutably suggest that the links with Yezidi tradition are justified too. As far as we do not know and can only presume that Khani could have known Yezidi texts and tradition it seems better to call the links "plausible". They can

significant *ordo amoris*, which in many points can be compared with the Scheler concept of internal order guiding the individual and social life. I present it here regarding the pole structure of good and evil forming the plot of *Mem û Zîn*. Again; it is the distortion of harmonious order, which became meaningful in his work:

I. The source and role of evil are defined and revealed by:

1. Analyzing the reason of Kurdish and – in general – man’s failures:

a. The ruler, mir Zeid (i. e. prince Zeid), is guided only by his ambitions and therefore he is susceptible to Satan’s whispers. For him gaining and maintaining power are the main values to follow.

b. The Kurdish lack of humility is the reason for their susceptibility to quarrels and disobedience. That is also the main obstacle that precludes gaining national unity.

2. The introduction of Satan himself as Bekir, the ruler’s adviser.

3. Seeing evil as the crucial element of the world’s order planned by God. That is why Bekir turned out to be God’s envoy and his deeds are forgiven.

4. Seeing the responsibility of men – it is the ruler mir Zeid not Bekir who is responsible for bad deeds as he himself yields to his own weaknesses. Bekir is just using him.

II. Sources and role of good are defined and revealed by:

1. Stressing the role of Love which is presented in a very multidimensional way, by:

a. The story of the lovers Mem and Zîn,

b. The story of friendship: Mam and Tacdin, Zîn and Siti

c. The idea of patriotism and Khani’s decisive postulate to build unity not only on the power of the sword but also on its cultural heritage and language

be traced in *Mam û Zîn*. I wish to point at few of them which I think are of considerable importance. The first one is the Khani’s description of Satan, which we can find in the introduction. The Satan is presented rather as “tragic” not just “evil” creature. Khani stresses his faithfulness to God so the associations with Tawûsê Melek seem justified. The poet goes even further by personifying Satan as Bekir who is finally forgiven and understood as God envoy. But the most important element is the Khani’s God-Love idea which crowns his work. It seems also inspired by Yezidi tradition where Love was the main feature and instrument of God. Love (*eşq* and *mihbet*) is mentioned many times in Yezidi texts while not so often in Quran and sunnah. It can be found in other sufi traditions too but taking into consideration Kurdish ethnic links with Yezidism as well as the meaningful combination of all aforementioned motifs we can definitely presume that the Yezidi tradition inspirations can be revealed in *Mem û Zîn*.

d. Mysticism, based on the story of Mam and Zin's tragic unfulfilled love, which is the main reason for seeking God by both male and female characters. However, love to God became the very ambiguous cure for their misfortune. In this context God's love for a human being (and nation) is seen as a completely inexplicable phenomenon in which Bekir, as Satan, plays a special role as God's envoy.

e. Love is seen as the only value that can unify diversity, contrasts and contradictions, good and evil. In this way, the dualism of the world can be overcome.

2. Faith in God. Following Quran and Yezidi tradition faith seems to Khani the only reliable foundation for understanding God's Love towards a man and for conducting one's life in a most proper way.⁷

In his work Khani had constructed a meaningful literary idea of God-Love. In Yezidi, some ancient Greek and Muslim (especially in Sufism) traditions, Love was seen as the main attribute of God. According to Yezidi *qewls*⁸ it came into being along with God at the Time of Creation manifesting itself by both - the creative power causing the multiplication of the world and by the leaven which made the earth firm and solid (Kreyenbroek, Rashow 2005, p. 28, 95). Khani had followed this concept but his literary work was based rather on revealing the distortion of such *ordo amoris*. The Kurdish prince's deeds were based not on Love but on his own ambitions and longing for power, which made him absolutely helpless against Bekir - the personified evil. However, on the other hand Bekir's activity or rather his "bad whispers" (there is no place in the poem when he really acts or does something wrong), seem to be part of God's plan. Considering evil or Satan, a significant part of God's plan needs a strong faith based on the limitless trust in God's inexplicable Love, which in Yezidi tradition is called The Mystery of Love.

Being based on both Yezidi and Muslim oral and classical tradition such *ordo amoris* has formed the significant heritage for contemporary Kurdish literature. As we can see further it is certainly the distortion of such "love order" which troubles modern day writers.

7 For thorough analysis of Khani's work look for example: Resul, M.I. (2007) *Bir şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê Xani ve Mem û Zîn*, İstanbul: Avesta

8 The term *qewl* is understood here after Philip Kreyenbroek and refers to *qewls* published in a book edited by him and Rashow's book. Philip Kreyenbroek states: "unlike Western 'genre', the Yezidi categories *Qewl*, *Beyt*, and *Qeside* appear to be based largely on tradition: one knows a text belongs to one of these categories because one has been thought to define it as such. The category of poem cannot be deduced from such features as rhyme or metre, and content may at best provide an indication". (Kreyenbroek, Rashow, 2005: 48).

4. KURDISH CONTEMPORARY WRITERS AND THEIR WAYS TO REVEAL *ORDO AMORIS*.

Mehmed Uzun⁹ was one of the Kurdish writers who had seen the necessity of undertaking the tradition of the storyteller's heritage and adapting it to the contemporary conditions of Kurdish literature. In his novel *Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê* (*A Day from Evdalê Zeynikê's Days*) he stressed the role of some values that to him need to be applicable by *dengbêj*. Interesting that it has a form of direct hints given by Evdalê Zeynikê to his pupils:

Şagiritino, rûgeşino, bi xwe bawer, bi zimane xwe şêrîn, bi dengê xwe xweş, bi gotina xwe fesih û sivik bin. Hunermendî; daxwaz, coş, sebir, înad, xebat, nermî û ziravbihîstiyarî ye. Bila çar tişt ji we kêr nebin; jirî û ciwanmerdî comerdî û xêrxwazî. Bila çar tişt ji we bi dûr bin; qelsî û namerdî, çikosî û xirabîxwazî. Ev her çar tişt, jirî, ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî dê alikarî li hunermendiya we bike. Gava hûn bi xwe û bi gotina xwe ne bawer in, mebêjin. Li serê bixebitin, lê hûr bin da ku hûn pê bawer dibin. Gava gotin û stran we nahejin, kela dilê we hilnade û bi germî ruhê we venagire, hingê hûn wê gotin û stranê mebêjin (Uzun 2002, p. 59).

Pupils of bright faces, believe in yourself, use kind language, a sweet voice and the open and light way of telling. The creation consists of will, enthusiasm, patience, obstinacy, hard work, gentleness and sensitivity. Four things should not be lacking: cleverness and nobleness, generosity and goodness. But beware of four things: the lack of will and courage, avarice and malice. These four features, I mean: cleverness and nobleness, generosity and goodness will help your art. If you do not believe in yourself and your words do not tell the stories. Work on them, try to understand their deep meaning to be able to believe them. If the song or story does not move you, or touch your heart, or warm your soul, then do not tell it.¹⁰

It seems that contemporary Kurdish literature has maintained tradition, considering writing stories as a kind of "moral education". However, it has to be pointed out at the very beginning that it is based on dealing with concerns, rather than on instructions. It is not the hints of how to live a good and happy life, but rather

9 Mehmed Uzun, (1953-2007) was born in Siwerek in Northern part of Kurdistan (Turkey). A - claimed Kurdish novelist, one of the first Kurdish language writers who became to be known to wider Kurdish audience and abroad. For many years lived in exile in Sweden. He is the author of several novels: *Tu* (You, 1985), *Mirina Kalekî Rind* (The Death of the Beautiful Old Man, 1987), *Siya Evînê* (The Shadow of Love, 1989), *Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê* (One Day of Evdalê Zeynikê, 1991), *Bira Qederê* (The Well of Fate [memory of destiny?], 1995), *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* (The Light like Love, The Dark like Death, 1998), *Hawara Dicleyê* (The Call of The Tigris River, 2001,2003).

10 All translations from Kurmanji to English of the modern Kurdish prose have been done by the author of this article.

questions of whether the good and happy life is possible and what does it mean. Moreover, the aim of those questions seems to be awakening doubts in communities where many values are traditionally given and undisputed. Awakening doubts are crucial to the process of the rethinking of values, which troubles contemporary Kurdish writers such as Hesenê Metê, Firat Cewerî or Jan Dost. Such reinterpretation is based on revealing the distortion of the *ordo amoris*, by exploring the dark side of the human soul and of many social phenomena. However, it is also important to underline the role of self-confidence (believing in yourself) in the aforementioned piece of Mehmed Uzun's work. Self-confidence is crucial in the true understanding of other values. Is it right to ask whether it is contradictory to the process of awakening doubts, as mentioned above?

به‌ چاو خشاندینیک به‌ سه‌ر میژووی کولتوری تورکیدا ئەم راستیه بۆ ئیمه به‌روونی وه‌ده‌ر ده‌که‌وئیت که سه‌چاوه‌کانی تورکیش به‌ شیوه‌یه‌کی یه‌کجار به‌ربلاو باسی کورده‌کانیان کردوو. بۆ موه‌نه، ده‌توانین ناماژه‌ بۆ وینه‌ی کورده‌کان له په‌ندی پیشینیانی تورکی، گالته و جه‌فه‌نگی تورکی، چیرۆک و پۆمانی تورکی و هتد بکه‌ین. له زۆریه‌ی هه‌ره‌ زۆری ئەو بابته‌تانه‌دا وینه‌هایه‌کی ناشیرین له کورده‌کان کیشراوه‌ته‌وه که به‌ بروای ئیمه هیندیک له‌وان به‌ میرات له کولتوره‌کانی عه‌ره‌بی و فارسی وه‌رگیراون و هیندیک تریان

تابەت بە خودى كولتورى توركىن. بە پىچەوانەى ئەم وینە ناشرىنانە، لە هیندیک بابەتدا ئیمە دەتوانین وینەهاىەكى باش و جوان لە كوردەكان لە ئەدەبىيات و كولتورى توركيدا بىنین. هۆى مەسەلەكەش ئەمەیه كە لە بازە جىگایەكدا نووسەرەكان لە بنگەوه كوردن و لە هیندیک شوینى تر هۆى ئەمەیه كە بە چاویكى مروفانه پروانویانەتە كوردەكان.

لە كولتورى توركىشدا و بەكارىگەرى لە كولتورەكانى عەرەبى و فارسى، وینەى كورد لە گەل دەشت و چۆلگە و بىابان و شاخ و چىا هاتوو. لە پەندى پيشینانى توركيدا خوا كوردەكانى خولقاندوو بە ئەوهى كە چىاكان و دەشتەكان چۆل نەمىننەوه:

(Allah Kürtleri yaratmış dağlar hali kalmasin diye)

”خوا كوردەكانى خولقاند بۆ ئەوهى كە چىاكان چۆل نەمىننەوه“.

تەنانەت ئەو پەيوەندى بەینى كورد و چۆلگە و كۆ و دەشت لە كولتورى توركيدا ئەوهەندە قايمە كە كوردەكان ناتوانن بى شاخ و چىا و دەشت و سەحرا زىندوو میننەوه. ئەم وینەیه هەرەها كارىگەرێكى قوولى كردۆتە سەر چىرۆك و پۆمانى توركى لە سەردەمەكانى داويدا. لە بەشێكى زۆر بەرچاو لە پۆمانەكان و چىرۆكەكانى توركى تەنانەت تا كۆتابى سەدى بىستەمىش شار و مەلبەندى كوردەكان وەكوو مەلبەندى چۆلگە و پر لە مەتەرسى ناسىندراوه كە كاروانىك لەو پۆوه تىپەر نايت و جىگایەكە پر لە پىگر و دز. هەر وەكوو شەمسەددىن اوناڵ لە پۆمانەكەدا ”Yukarışehir“ وینەى شارى الازى (Elazığ) كە لەو سەردەمەدا لە ژىر چاوه‌دێرى كوردەكان بوو، وەكوو مەلبەندى چۆلگە و دوور لە شارستانىت كيشاوتەوه. (Ünal ۱۹۸۶, ۸۵)

جىا لەم وینانەى كە مەلبەندى ژيانى كوردەكان وەكوو چىا و دەشت و چۆلگە نیشان دەدەن؛ وینەهاىەكى تریش لە بەر دەست دانە كە كۆمەلێ كوردەكان وەكوو كۆچەر و خەلكى دىهات و تەنانەت دۆم و قەرەچى دەناسىنن. پەيوەندى نىوان دۆمەكان و كوردەكان گەلێك قايم و بەهیزە، دۆمەكان تەپل و تووزەلە و زورنا لىدەدەن و كوردەكان هەل دەپەرن:

(Çingene çalar, Kürt oynar)

”دۆمەكان لى دەدەن، كوردەكان پى هەل دەپەرن“.

مۆونەهاىەكى زۆر لەبەر دەست دانە كە نیشان دەدەن چۆن وینەى كوردەكان لە كولتورى توركيدا بە شىوہەكى بەرچاو وەكوو كۆچەرى و گوندى و كىوى ناماژەى پى دەكرىت. وەكوو دەزانن كوردەكان بۆ ماوہەكى زۆر بە توركانى كىو ناویان لىدەبردا. بە برۆى ئیمە ئەو وینەبەش كە لە كولتورى توركيدا لە كوردەكان كيشراوتەوه، بە شىوہەكى راستەوخۆ تا رادەيەك كەوتۆتە بەر كارىگەرى كولتورەكانى عەرەبى و فارسى.

لە بەشێكىتر لە كولتور و ئەدەبىياتى توركيدا بە چا و لىكەرى و هەرەها كەوتنە بەر كارىگەرى كولتورەكانى عەرەبى و فارسى، كوردەكان وەكوو مروفانىكى ئەحمەق و كەم هۆش و خەرفاو دەناسىندرىن كە هىچ شتىك نازانن. بۆ وینە چا و لەم پەندە پيشینانەى توركى بكەين:

(Kürtler ne bilmiş?)

”كورد چ دەزانن؟ - واتا هىچ نازانن -“.

يا وەكوو ئەم پەندە توركىە كە ناماژە بەمە دەكات كە لە نىو كوردەكاندا مروقى ئاقل هەر پەيدا نايت:

(Kürt kısmında akıllı olmaz).

»دەنىو كوردەكاندا مروقى ئاقل هەر نىبە.«

بەلەم بەشێكى زۆر لەم پەندە پيشینانەى توركى بەوئەندەيان قەناعەت نەكردوو؛ بەلكو كوردیان هیناوتە هاوړیز و

هاوتەرازی چۆرپێ و ئاژەل. بۆ وێنه:

(Allah Kürt kısmını yaratmasaydı, eşeklere baha biçilmezdi).

«ئەگەر خودا کوردی بەدی تێهینابایه، بەهای کەر زۆر دەچۆ سەر.»

تەنانەت لە بازە جینگایه کیشدا کوردەکانیان لە کەر کەمتر داناوه:

(Eşeğe Kürt demişler, eşek kırk yıl yem yememiş).

«بە کەریان وت کە کوردی، کەر - لە حەیفان واتە مانى گرت - چل سال جۆی نه خوارد.»

مەسەلەى بە کەم بێر و هۆش دانانى کورد و تەنانەت هاوڕێز ژماردنیان لە گەل ئاژەل و چۆرپێ، بە شێوەیەکی بەرچاو لە کولتوری تورکیدا دەکەوێتە بەر چاو. تەنانەت تا سەردەمەکانی نزیکیش، کوردەکانیان مەروفا نیک خەیاڵ دەکرد کە کلکیان هەیە. ئەو وێنەى تا پادەیهک بەهێز بوو کە کاریگەریکی قوولی کردبو سەر چیرۆک و رۆمانەکانی سەدەى بیستەم. بە کەر فەهری (Bekir Fahri) لە رۆمانە کەیدا "Jönler" ئاخافتنی ئەرمە نیک لە گەل تورکیک ئاوا دەگێرێتەوه، ئەرمە نییە کە بە تورکە کە دەلیت: "بۆرە کە زۆر پروواست قسان دەکەم. ئێوه ئەم کوردانە بە چی حەسب دەکەن، ئەمانە ئینسانن؟ حەیانن، ئەمانە چن؟ (Fahri 1985, 104) یا بۆ وێنە حوسین بە یاز (Hüseyin Beyaz) لە چیرۆکە کەیدا Köroğlu-Antep ئاوا وێنەى کوردەکان دەکیشێتەوه: چاو لەم کوردە بکە، قامکەکانی وه کوو هارۆ، ئانیشکی وه کوو شاخی داره چناره، . . . ئەو کوردە بە قوربانى ئەو ئەسپەى بێت کە سواری دەبێت، چۆنکە ئەو ئەسبە حەیانێکی نەجیبە بەلام کوردە کە نا. . .

یەکیک لە نیشانەکانی تێ نەگەشتن و نەزانی کورد، مەسەلەى نەزانیی زمانە. کوردەکان لە بەشێکی هەرە بەرچاوی ئەو پەندانەدا وه کوو کەسانێک پێناسە کراون کە زمان نازانن و هیچ پەيوەندێکیان لە گەل شارستانیەت نییە:

(Dil bilmez Kürtler; Yol bilmez Kürtler; Dili dönmez Kürt).

هەر سێ دانە لەم پەندە تورکییانە بە واتای ئەمەنە کە کوردەکان زمان نازانن و تەنانەت لە پێشکەوتویی و شارستانیەت هیچ حاڵی نابن. ئەو مەسەلەى نەزانیی زمان بە شێوەیەکی یە کجار بەرچاو لە چیرۆک و رۆمانەکانی سەدەى بیستەم بە کار هێندراوه. بۆ وێنە دورسان ئە کچام (Dursun Akçam) لە رۆمانی "Zozan" دا و دیمیر جیهون (Demir Ceyhu) لە "Yılanı Öldürmek" دا باس لەمە دەکەن کە چۆن کوردەکان لە بەر نەزانیی زمانی تورکی دەکەونه بەر تەنبی بوون و لیدان. پەس بەم شێوەیە دەبینن کە دوویەمین وێنەیک کە لە کوردەکاندا لە ئەدەبیات و کولتوری تورکیدا کیشراوه تەوه: وێنەى مەروفا نیک کەم بێر و کەم هۆشە کە زمان نازانن و دوور لە شارستانیەتن. ئەو وێنەیهش تا پادەیهکی بەرچاو و بە وێنەى میرات لە کولتورەکانی عەرەبی و فارسی را هاتۆتە ناو کولتوری تورکی.

یەکیکی تر لەو وێنە نەزانیی کە لە کوردەکان لە کولتور و ئەدەبیاتی تورکیدا کیشراوه تەوه، پەيوەندی هەیه لە گەل مەسەلەى دین. لە بەشێک لە کولتوری تورکیدا کوردەکان وه کوو مەروفا نیک بێ دین پێناسە کراون. لە بەشێکی کێتردا سەرچاوه تورکیەکان دانیان بەمەدا هیناوه کە کوردەکان موسولمانن، بەلام دەرمان بریوه کە موسولمانانێکی بە راستە قینە نین. واتە کەمترین پەل و پایەى موسولمانەتیان بۆ کوردەکان تەرخان کردووه. بۆ وینە:

(Gavurla karşılaştırdığımda Kürt Müslümandır).

«کورد تەنیا وهختیک موسولمانە کە بەراورد بکری لە گەل گاور.»

بەلام ئەو مەسەلەیه بە شێوەیەکی زۆر بەهێزتر و ناشیرینتر لە چەندانە لە پەندەکانی تورکیدا نیشان دراوه. بۆ وینە ئەو پەندەى خوارهوه:

(Kürt ile itin Allah'ı birdir).

«خودای کورد و سه‌گ یه‌که».

واته کورد هاوردراوته پژی سگ که له کولتوری ئیسلامیدا حیوانیکی نه‌جس و پیسه. به‌هه‌مان ئەندازه‌ی که سگ له خودا دووره و هیچی لی نازانیت، به‌هه‌مان شیوه‌ش کورد له خودا دووره و هیچی لی نازانیت. به بیر و رای ئیمه ئەم وینه‌یه‌ش درێژە‌ی هه‌مان وینه‌یه که له کولتوری فارسیدا به وینه‌ی مه‌جوسی و له کولتوری عه‌ره‌بییدا به وینه‌ی شه‌یتان له کورده‌کان کیشراوه‌ته‌وه.

به‌لام جیا له‌م وینه‌ ناشرین و ناحه‌زانه‌ی که له کورده‌کان له کولتوری تورکیدا کیشراونه‌ته‌وه، پیوسته‌ ئاماژه به‌مه بکه‌ین که ده‌توانین هیندی‌ک وینه‌ی جوانیش له کورده‌کان له چیرۆک و رۆمانی تورکیدا ببینین. هیندی‌ک له هۆیه‌کانی ئەم بابته‌ش به‌ر ئەمه‌یه که نوسه‌ره‌کان له بنگه‌وه کورد بوون. بۆ وینه‌ یاشار که‌مال (Yaşar Kemal) له رۆمانی *“Karımın Su İçtiği Yer”* دا وینه‌یه‌کی جوان له کورده‌کان ده‌کیشیته‌وه و باس ده‌کات که چۆن ژنانی کورد چه‌کداریکی تورکیان پاش ئەوه‌ی که له زیندانی رۆسه‌کان هه‌لاتپوو؛ له رەق هه‌لانن رزگار کرد. (Kemal 2002, 135) جیا له‌مه‌ش، هیندی‌ک هۆی دیکه هه‌نه که یه‌کتیک له‌مانه مه‌سه‌له‌ی دین بووه. بو وینه‌ "نامیک که مال" (Namık Kemal) هه‌رچه‌ند بیرو‌رای باش و جوانی سه‌بارهت به کورده‌کان نییه، به‌لام له رۆمانه‌که‌یدا له ژیر ئیوی «جی‌زمی» (Cezmi) وینه‌یکی باش له کورده‌کان ده‌کیشیته‌وه؛ وه‌ختیک که کورده‌کان لای عوسمانی سونیه‌کان بوون و دژی سه‌فه‌ویه شیعه‌کان به‌شهر ده‌هاتن. هه‌ر له‌م رۆمانه‌ش دابه که وینه‌یه‌کی جوان له سه‌لاحه‌ددین ده‌کیشیته‌وه و به کوردی ده‌زانیته و به پیشه‌وا و سه‌رداری له قه‌له‌م ده‌دات. (Kemal 1963, 41) به‌لام به‌ ئاشکرایێ دياره که ئەم وینه‌ جوانه به هۆی ئەمه کیشراوه‌ته‌وه که کورده‌کان لایانگری ده‌سه‌لاتی عوسمانیان کردوو. هه‌نا به‌ گشتی نووسه‌ر بیرو‌رایه‌کی جوانی سه‌بارهت به کورده‌کان نییه. هیندی‌کی دیکه له نووسه‌رانی تورک له روانگه‌یه‌کی مرۆفانه‌وه رۆانیویانه‌ته کورده‌کان. هه‌ر له به‌ر ئەوه‌شه که وینه‌یه‌کی جوانیان له به‌شیک له به‌ره‌مه‌کانیادا ته‌رخان کردوو به کورد. بو وینه‌ ئورهان که‌مال (Orhan Kemal) له *“Nurettin Şadan Bey ve Fakir Baykurt’un Casım”* که‌مال تاهیر (Kemal Tahir) له *“Bir Mülkiyet Kalesi”* و هه‌روه‌ها عوسمان شاهین (Osman Şahin) له *“Özlu Hamurlar”* دا وینه‌هایه‌کی باشیان له کورده‌کان کیشاوه‌ته‌وه. بۆ نموونه عوسمان شاهین ئاوا له سه‌ر کورده‌کان وه‌جواب دیت: "ئایا که‌سێک بۆ ئەو زمانه‌ی که قسه‌ی پێده‌کات، ئەو نانه‌ی که ده‌یخوات، ئەو ئاوه‌ی که ده‌یخواته‌وه، چکۆله ده‌کرێته‌وه؟ لێی ده‌دریت؟ ئایا بۆ ئەو جل و به‌رگه‌ی که ده‌به‌ریان ده‌کات، ئاداب و رسومی‌ک که بروای پێیان هه‌یه، گالته‌ی پێ ده‌کریت؟" (Şahin 1984, 63)

له کۆتایی مه‌سیری درێژ و به‌کره‌نگی وینه‌ی کورده‌کان له کولتوری نه‌ته‌وه‌کانی فارس و عه‌ره‌ب و تورکدا ئەم پرسیاره دیته‌ گۆری، که ئیمه له چ روانگه‌یه‌کیوه ده‌بیت پخوانینه وینه‌ی کورد له کولتوری تورکیدا؟ به‌ بروای من ئیمه ده‌توانین له دوو روانگه‌وه پخوانینه‌ بابه‌تی وینه‌ی کورده‌کان له کولتوری تورکیدا. روانگه‌به‌کی تابه‌تی کوردی-تورکی ئەمرویی و روانگه‌یه‌کی گشتی کوردی - فارسی، عه‌ره‌بی، تورکی سه‌به‌ینی.

له روانگه‌ی یه‌که‌م، ئەو شتانه‌ی که ده‌بیت له تۆژینه‌وه‌که‌ماندا سه‌بارهت به وینه‌ی کورد له کولتوری تورکیدا بیخه‌ینه به‌ر چاو، ئەم دوو بابه‌ته‌یه: یه‌کێکیان، به‌شیکێ زۆر له‌م وینه‌ ناحه‌زه‌ی که له کولتوری تورکیدا له کورده‌کان کیشراوه‌ته‌وه وه‌کوو میراتیکی شووم و پیس له کولتوره‌کانی فارسی و عه‌ره‌بیوه هاتۆته‌ ناو کولتوری تورکی. قامکی رەخنه‌ی ئیمه ده‌توانیت له قۆناغی یه‌که‌مدا بۆ کولتوره‌کانی فارسی و عه‌ره‌بی، و پاشان بو کولتوری تورکی درێژ بکریته‌. بابه‌تی دووه‌میش ئەمه‌یه که به‌شیک به‌رچاو له‌م وینه‌ ناشرینه‌ی که له کولتوری تورکیدا ته‌رخان کراوه به کورده‌کان، له بنگه‌وه ده‌که‌رپته‌وه بۆ سه‌ر ده‌سه‌لاتی سیاسی و راپۆرتی چه‌که‌ده‌ستان و ئەفسه‌رانی عه‌سکه‌ری و هه‌روه‌ها کاربه‌ده‌ستانی سه‌رده‌می خه‌لافه‌تی عوسمانی و کۆماری تورکییه. ئەم راپۆرتانه کاریگه‌ریکی قوولیان کردۆته سه‌ر ناحه‌ز نیشان دانی وینه‌ی کورده‌کان له چیرۆک و رۆمانه‌کانی سه‌ده‌ی بیسته‌می تورکی. که وایه ئیمه ده‌توانین له قۆناغی یه‌که‌مدا ده‌سگا‌کانی سیاسی و حکومه‌تی ئەو سه‌رده‌مه به به‌رپرسیاری ناحه‌ز نیشان دانی وینه‌ی کورده‌کان بناسین و پاشان کولتور و ئەده‌بیاتی تورکی. وه‌به‌ر چاو

خستنی ئەم دوو خالە دەتوانیت کەمێک لە قورسایى بارى كيشەى كوردەكان و توركەكان لەم بابەتە گرینگەدا كەم كاتەوه و هەنگاوێكى چچووك بىت بۆ بەهێزتر كردنى پڕۆسەى گەيشتنى كوردەكانى باكور بۆ بەشێك لە مافە سەرەتايەكانيان و هەر دەها بۆ سىفر كردنى گرتەكانى نۆخۆى توركییە، پێش سىفر كردنى گرتەكانى دەرەوهى.

لە روانگەى دووهمەوه، كاتێك چاوا و وینەى كورد لە گرینگترین سەرچاوهكانى كولتورى ئىسلامى، پىكهاواو لە فارسی و عەرەبى و توركى دەكەين، بۆمان وەدەر دەكەوێت كە ئەو سى كولتورى كە بە درێژايى مێژوو لە گەل كورد پەيوهەنديان هەبووه، تا چ پادەهەك لە بەرابەرى كورددا سىاسەتێكى يەك گرتوو و يەك شىوهەيان بە كار هێناوه. لەم تۆژىنەوهدا وا بۆ ئىمە دەرەوهكەوێت كە ئەو سىاسەتەى فارسەكان دژ بە كوردەكان دايان رىشبوو، بە پووخانى ساسانىەكان و هاەتە سەركارى عەرەبەكان، درێژەى پىدرا و لە دوا قۇناغيشدا عوسمانىيەكان ئەو سىاسەتەيان لە عەرەبەكان بە ميرات وەرگرت و تا ئەمروى هەر دژ بە كوردەكان بەكار دەهيندريت. ئەم بىر و پايە يەك گرتوو و يەك شىوهى كە كولتورەكانى فارسی و عەرەبى و توركى دژ بە كوردەكان بەكاريان هێناوه – چ بى پروگرام بىت و چ پروژەيەكى دارىشترائو بىت – لە مەسىرى دوور خستەنەوهى كوردەكان لە پىروا پىهێنان و دامەزراندنى نەتەوه – حكومەتى كورددا بەكار دەهيندريت. ئەم بىر و پايە فارسی-عەرەبى-توركى دژ بە كوردەكان، تا ئەو كاتە كە لە چوارچۆهەيى كولىنالىسىمى دەرەوهى بىت، بۆى هەيه كە هەبىت و تەنانەت لە بازە وەختىكدا بە كەلكيشە. چوونكى ئەم جۆرە روانگەنە لە "ئەوانىديكەوه" – تەنانەت ئەگەر ئىگەتيفىش بن – تايهەتمەندىكى و جىاوازيك دەبەخشە "من" و جوورېك بە رەسمىەت ناسىنى منە. تەنانەت ئەگەر ئەوانىديكەى فارسی و عەرەبى و توركى نەبن، منى كوردىش پەيدا نابىت و ماناى نىيە. بەلام ئەو روانگەى كولىنالىسىمى دەرەوهى كاتېك دەبىت بە مەترسى كە بىتە بە روانگەيەكى كولىنالىسىمى ژوورەوه، ئەو كاتەيە كە "منى" كوردى دەكەوێتە نۆو قەفەسىكى ئاسنى فارسی – عەرەبى – توركى. (سىوهەىلى ۲۰۰۳) ئەو «شتەى» كە لە ناو ئەم قەفەسە دىتە دەر، يا خو پەيوهەندىكى بە من نەماوه، يا خو پەيوهەندىكى يەكجار كەمى بەمنەوه ماوه و دەبىتە ئالەتېك بەدەستى ئەوانىديكەوه، يا خو دەبىتە ئەوانىديكە. مەرفانىكى نەزان و شەيتانى وەكوو كورد كە بە درێژايى مێژوو لە گوند و چۆلگە ژيانىان بردۆتە سەر و ناسنامەى وان هەمىشە لەگەل وشەكانى فارسی و عەرەبى و توركى دىتە ناساندن؛ بە"تەنبايى" شارەزايەتى و ئەزمون وەحقى ئەوهيان نىيە كە وەكوو نەتەوه – حكومەتېك لە عۆرفى نۆو نەتەوهىيدا و لە پۆژەهلانى ناوەراست – ئەو جىگايە موقەدەسە – بىتە ناساندن. ئەگەر ناسنامەى كوردەكان لە مێژوى كولتورى ئىسلامىدا و لە پڕۆسەيەكى زەمانى و موزەزم، كە پەيوهەندىكى راستەوخۆى هەيه لە گەل سەنتەرى هیز، لە روانگەيەكى كولىنالىسىمى دەرەوه وەكوو فارسەكانى دەشت و كپو، عەرەبەكانى سەحرا و توركەكانى كپو هاەتە ناساندن؛ و پىراى ئىترانى بوون پەچەلى فارسى، و وىراى ئىسلامى بوون پەچەلى عەرەبى و توركى بۆ ئەوان داندرا؛ ئەمروى بە هەمان شىوه و لە هەمان روانگەى كولىنالىسىمى دەرەوه ناسنامەى كوردەكان لە مێژوى پۆژەهلانى ناوەراستى نۆيدا دىههەوئى لەگەل نازناوآيتىكى وەكوو كوردى ئىران، كوردى توركى، كوردى سوريە و كوردى عىراق بىتە ناساندن. بەلام ئەوهى جىگاي مەترسى ئەوهيه كە، بە هەمان شىوه كە روانگەى كولىنالىسىمى دەرەوه تولى كە لە مێژوودا و لە نۆو نووسەران و دەسەلاندارانى كورد كارىگەرى بكات و بىت بە روانگەيەكى كولىنالىسىمى ژوورەوه، ئەمروى هەر ئەم مەترسىيە هەيه كە "ئەيبوبىانى نۆئى" ناسنامەى كوردى لە قالمب و شكلى وشەى كوردستاندا لەگەل نازناوآيتىكى كولىنالى ديارى بكەن. پەنگە پۆژەهلانى ناوەراست كە بە تەواوى ئەو قۇدسىيەتە مەكانىيەى كە لە مێژوودا هەيهتى و بە زانىن و تىگەيشتووى و زمانى شارستانىەتى فارسى و عەرەبى و توركى نەبتوانووه كەمترین پەل و پايەى مافى مەرف و دىموكراسى راستەقىنە بە ديارى بىت، بو ئەو ئىشە نيايى بە زمانىكى جىاواز هەيه، زمانى شەيتانى و نەزانى و گوندى كوردى.

تېيىنى

بۆ زياتر ناگادار بوون لە وینەى كوردەكان لە كولتورەكانى دنباى ئىسلام و دنباى ئىسلام كرابوو، بىروانە:

Alakom 2010. مالمیر ۱۳۸۷، ۱۶۱ - ۱۷۴؛ الخلیل ۲۰۱۲؛ سیوه‌یلی ۲۰۰۳؛ یۆلادیان ۲۰۰۰.

۵. سه‌رچاوه‌کان:

ا: کوردی، فارسی و عه‌ره‌بی:

- ابن حوقل. (۱۳۴۵) صورة الأرض. ترجمه جعفر شعار. ۱. تهران: بنیاد فرهنگ ایران.
- الاصهبانی، الراغب. (۱۹۷۰). محاضرات الأدباء ومحاورات الشعراء، د. م. د. ن.
- آکویف، هاگویان. (۱۳۷۶). کردان گوران و مسأله کرد در ترکیه. ترجمه سیروس ایزدی. ۱. تهران: هیرمند.
- الآلوسی. (۱۹۷۸). روح المعانی فی تفسیر القرآن العظیم و سبغ المثنی، بیروت: دار الفکر.
- بن علی سه‌لگی، محمد. (۱۳۸۴). دفتر روشنائی. ترجمه محمد رضا شفیع کدکنی. ۱. تهران: سخن.
- یۆلادیان، نارشاک. (۲۰۰۰). کورد له سه‌رچاوه عه‌ره‌بییه‌کاندا. وه‌ر گه‌پانی: نازاد عوبید صالح. هه‌ولیز: چاپخانه‌ی زانکۆی سه‌لاحه‌دین.
- الجاحظ. (۱۹۷۹). رسائل الجاحظ. تحقیق عبد السلام هارون. ۱. القاهرة: مکتبه الخانجی.
- جامی، نور الدین عبد الرحمن. (۱۳۷۰). نفحات الأنس من حضرات القدس. تصحیح محمود عابدی. ۱. تهران: اطلاعات.
- الحموی، یاقوت. (۱۹۹۰). معجم البلدان. تحقیق فرید عبد العزیز الجندی. ۱. بیروت: دار الکتب العلمیه.
- الخلیل، احمد محمود. (۲۰۱۲). صورة الكرد فی مصادر التراث الاسلامی. ۱. اربیل: اراس.
- الزبیدی. (۱۳۰۶). تاج العروس من جواهر القاموس. القاهرة: المطبعه الخیریه.
- سافراستیان، آرشاک. (۲۰۰۷). الكرد و الكردستان. ترجمه أحمد محمود الخلیل. بیروت: دار هیرو.
- سیوه‌یلی، پرتیوار. (۲۰۰۳). قه‌قه‌سی ناسنین. ۱. سلیمان: نه‌نج.
- الطبری. (۱۹۶۷). تاریخ الطبری (تاریخ الرسل والملوک). تحقیق: محمد إبراهیم. القاهرة: دار المعارف.
- عوفی، محمد. (۱۳۶۲). جوامع الحکایات ولوامع الروایات. ۱. تهران: موسسه مطالعات و تحقیقات فرهنگیه.
- غلامی، ابذر. (۱۳۸۵). واژه‌ی کرد در فرهنگ گیلان. چیستا، (۲۲۸ - ۲۲۹)، ۵۹۵ - ۶۰۳.
- فردوسی، ابو القاسم. شاهنامه. ۱. تهران: هرمس.
- گنجه‌ای، نظامی. (۱۳۶۳). لیلی و مجنون، سبعة ی حکیم نظامی گنجه‌ای. تصحیح وحید دستگردی. ۲. تهران: انتشارات علمی.
- مالمیر، تیمور. (۱۳۸۷). کرد در شاهنامه. جمله‌ی مطالعات ایرانی. کرمان: دانشکده‌ی ادبیات و علوم انسانی دانشگاه شهید باهنر کرمان.
- سال ۷، شماره ۱۴. ۱۶۱ - ۱۷۴.
- المسعودی. (۱۹۷۳). مروج الذهب ومعادن الجوهر. تحقیق محمد محیی الدین عبد الحمید. ۵. بیروت: دار الفکر.
- مولوی، جلال الدین. (۱۳۶۸). مثنوی معنوی. به اهتمام نیکلسون. ۱. تهران: مولی.
- مینورسکی، ولادیمیر. (۱۳۸۲). کردها نوادگان مادها. تر: جلال جلالی زاده؛ جاماسب کردستان. ژنار.
- نفیسی، سعید. (۱۳۶۱). تاریخ اجتماعی و سیاسی ایران در دوره معاصر. ۴. تهران: بنیاد.

- Alakom, Rohat. (2010). *Türk Edebiyatında Kürtler*. 3. İstanbul: Avesta.
- Damrosch, David. (2006). Rebirth of a Discipline: The Global Origins of Comparative Studies. *Comparative Critical Studies*. Pp 99-112.
- Fahr, Bekir. (1985). *Jönler*. İletişim Yayınları.
- Kemal, Namık. (1963). *Cezmi*. İnkılap ve Aka Kitapevleri.
- Kemal, Yaşar. (2002). *Karınca'nın Su içtiği*. Adam Yayınları.
- Melas, Natalie. (2007). *All the deference in the World: postcoloniality and the ends of comparison*. Stanford: Stanford University Press.
- Pizer, John. (2007). Toward a Productive interdisciplinary Relations: Between Comparative Literature and World Literature. *The Comparatist*. University of North Carolina, 31 / May. Pp. 6-28.
- Spivak, Gayatri. (2003). *Death of a Discipline*. New York: Columbia University Press.
- Şahin, Osman. (1984). *Özlu Hamurlar: Ağz İçinde Dil Gibi*.
- Tahir, Kemal. (1982). *Bir Mülkiyet Kalesi*. Tekin Yayınevi.
- Ünal, Şemsettin. (1986). *Yukarışehir*, Remzi Kitabevi.
- Varsava, Jerry. (2007). Comparative Literature without Borders. *Symploke*. University of Nebraska, 15 / 1-2. Pp. 331-340.

Extended Abstract

Kurdish people have been described in mainstream Turkish culture as the “other”, which stands in opposition to the Turkish “ego”. Turkish culture has distorted the Kurdish image throughout history, and we see that process of distortion in Turkish proverbs, literature, art, cinema, etc. This distortion often pictures Kurds as peasants, fools, thieves, miscreant, barbaric, devilish, hillbillies and so on. From an extra-Turkish perspective, this article connects the process of distortion of the Kurdish Image in Turkish culture to the distortion of the Kurdish image in Persian and Arab cultures. It traces the transference of negative images from Persian culture to Arab culture, and finally to Turkish culture, as a legacy of the transference of power from the Persians to the Arabs and then the Turks. From an internal-Turkish perspective, the article also attributes a major share of the process of distorting the image of Kurds in Turkish culture to the political and military reports that were sent out to the Tiles of the Ottomans by Turkish military and administrative personnel present in the Kurdish areas.

In the first part of this article, we study the terminology of the word “Kurd” in Persian classic culture. There are two major perspectives regarding the word “Kurd” according to first-hand Persian texts such as the poems of Ferdowsi, Nezami-i Ganjavi, and Jalal al-Din-i Rumi. The majority of Persian scholars concur that the word “Kurd” is equivalent to words such as “occupation” and “profession” and has the same meaning as “barbarian” and “hillbilly” for both Kurdish and non-Kurdish people, but is not synonymous with Kurdish nation and ethnicity. These scholars refer to

geographical dispersion of Kurds from the north to the south and the west to the east of Iran to substantiate their claims. On the contrary, most Kurdish scholars interpret this dispersion based on historical evidence, and they consider the word “Kurd” to have a national and ethnic connotation. In this section, we compare both abovementioned concepts and simultaneously study the image of Kurds in Persian culture. The most prevalent image of the Kurds in Persian terminology is classified in three major parts: uncivilized and barbarian, imbecile and fool, and finally, impious and magus (majūsi).

In the second part of the article, we study the image of Kurds in Arab culture, beginning with the demise of the Sassanid dynasty and advent of Islam transferred by Yemenite and Ḥīraite schools to Arab society, especially in the first and second century A. H. In this transference, we focus on the relationship and replacement of the word “Kurd” with the word “Mād” (Median).

In the third part of this article, we study the broad image of Kurds in Turkish culture, particularly how its grim legacy was transferred from Persian and Arabic cultures to Turkish culture during the transmission of power from the Arabs to the Turks.

In the last part of the article, we propose two interpretations about the Kurd’s image in Turkish culture that confirm the different shades of opinion towards Kurds. In the first part, we study the mere Kurdish-Turkish interpretation of the Kurd’s image in Turkish culture. We hereby reiterate the fact that the major part of that unreal, grim, and negative image of Kurds in Turkish culture has been handed over and distorted from Persian and Arab cultures into Turkish culture. This interpretation helps Turks and Kurds to arrive to the point of “zero problems with internal neighbors” that should be before of external neighbors.

In the second part, we explain the Kurdish-Islamic interpretation / perception of this image and confirm that the Persian, Arab, and Turkish cultures are similar and work together to coordinate a policy of disseminating a grim image of Kurds throughout history. In this section, based on an extra-colonialist concept, we try to explain how the Persian, Arab, and Turkish cultures make a force creolisation against the Kurds during the history by creating for them Persian identity under the overlap of Iranian, and Arab and Turkish identity under the overlap of Islam.

As we can see, extra-colonialism in the ancient periods became a reactionary internal-colonialism, for example in the ’Ayyūbyān dynasty. Today also there is the threat of a new extra and internal colonialism against Kurds. From a post-colonial view, the article concludes with the necessity of the presence of Kurds as a distinct, meaningful and individual entity in the Middle East.

Vera Modernbiyayîşî de Medreseyê Rojhelatî / Şerqî

Against the Modernization Eastern Madrasas

Nurettin BELTEKİN*

KILMÎYE:

Armancê nê cigêrayîşî “medreseyan bi çi stratejîyan teberê tewhîd-î tedrisat de mendê û bi çi stratejîyan tesîr xo ramitê” cakerdiş o. Metodolojîyê xebat, kalîtatîf a. Bi cigêrayîşê lîteratûr û mulakatan ameya viraştîş. Xebate de rojhelat / şerq, sey yew faîl ameyo dîyayîş. Îlmanê cematkiyê modernî de rojhelat / şerq sey yew obje yeno dîyayîş. Xebate de no fikir, rexne / krîtîk beno û her gelê rojhelatî / şerqî û karê înan sey yew faîl yeno dîyayîş û tehlîlkerdiş. Netîceyê xebate de ameyo dîyayîş ke medreseyî sey yew îqtîdar mîyanê şare de xebitîyê. Bi cîya-cîya fonksîyonan heyatê xo û tesîrê xo dewam kerdê. Medreseyan mîyanê şarî de fonksîyonê halkerdişê sey dewayanê medenî, deyn, arazî ardo ca. Reyna medreseyan sey yew merkezê muxalefetê sîyasî, kulturî û dînî xebitîyê. Fonksîyonê bînî zî o yo ke wextê qedexekerdişê kirdkî / zazakî de medreseyan kirdkî / zazakî sey zîwanê perwerdeyî qabul kerda.

Kelîmeyê kîldî: modernbîyayîş, mederseyê şerqî, kerdoxîye, stratejîyê medreseyan.

* Het. Doç. Dr.,
Universîteyê Artuklu yê
Merdîn, Fakulteyê Edebîyatî,
Qismê İlmanê Perwerdeyî.
Assistant Professor, Faculty
of Art, Department of
Education, Mardin Artuklu
University, Turkey.
e-mail: nbeltekin@yahoo.com.

ABSTRACT:

The aim of this study is to research how the madrasas stay out Tevhidi Tedrisat and by which strategies continues their effects. Method of the study is qualitative. It is based on screening of the literature and

obtaining data from in-depth interviews on the subject / topic. In the study, contrary to modern social sciences, the east has been recognized as a subject/maker as the east is analyzed as an object in the modern social sciences. In this study, this approach has been criticized and all actions of the east are analyzed in the context of its subjectivity. As a result, the madrasas are committed as a power in the society. They have continued to impact the society by performing different functions. These functions transformed madrasas as a power into the society. Madrasas have resolved problems among people related with civil law, land law and commercial law. In this sense, they have worked as a court. Madrasas are a religious, political and cultural opposition center. Another positive aspect of madrasas was that they maintained teaching Zazaki/Kirki Kurdish (as well as Kurmanji Kurdish) at a time when Kurdish language was banned.

Keywords: modernization, East / Kurdish Madrassas, subject, strategy.

1. DESTPÊK

Seserra hewtêsin ra pey Awrupa de hadîseyî pîlî ameyê meydan. Reform, Ronasans û Înqilabê Sanayî ke hem semedê rojawan, hem zî semedê cayanê binan tesîrê bingehîn viraştî (Giddens 2010, r. 9). Xususan yew fikro newe rojawan de bi bingehê her çî. Fikirê roşnayîye (bi Tirkî aydınlanma) ke aqsê dînan, merdimî parçeyê kaînat ra vet û merdimî vera kaînat de ca da ci. Mîyanê însan û tebiat / xoza de yew mucadele îlan kerd. No fikir gore, merdim ganî tebiat bigêro binê destê xo. Însan û tebiat sey yew wasita ameyê dîyayîş (Adorno û Horkheimer 1995). Fikir, bi modernîye yew sureta siyasî, îktisadî û cematî girewt. Modernîye sey yew proje her hetê dinya de ame tetbîqkerdişî (Vali 2010 r. 43; Özsoy 2009). Çunke goreyê nê fikirî insanîyet yew xet ser herikîyena. Serê na xeta zamanî de tanî şarî lez herikîyo, tanî zî tepîya mendî. Ê ke aver şîyê, şarê rojawan ê û ê ke tepîya mendê, şarê rojhelat û ê bîn ê. Cematê merdimîyê zî, goreyê ney tesnîf kerdê: Aversîyayê û Tepîyamendê. Semedê berdişî şaranê tepîyamendîyan, bi sevîyeya şaranê aversîyeyan “proje yê modernbîyayîşî” her ca de ameyê tetbîqkerdiş.

Modernîye, bi projeyanê modernbîyayîşî her cayê dinya de xususan bi destê dewleta neteweye / mîliye ya modern yew tesîro pîl viraşt. Verê cû modernbîyayîş zafê, cor ra cêr bi zorkanî ameyo tetbîqkerdiş la badê cû her ca de terefê şaran ra sey yew esas ameyo qebulkerdiş. Çunke modernbîyayîşî û awanbîyayîşî eynî mana de yeno fehmkerdiş. Goreyê na zîhnîyet helbet çend awanbîyayîş bibo, hende zî medenîbîyayîş yeno meydan. Na mana de modernbîyayîşî yeno manayê medenîbîyayîşî. Bi no rasyonâlîte modernîye yew projeyo zorkanî ra bî yew projeyo ke semedê awanbîyayîşî û medenîbîyayîşî yê “zarurî”. Modernbîyayîş bi no qeyde

her wareyê cuye / heyat girewtî binê destê xo. Modernîye bi destê dewleta neteweye / mîliye her ware de monopola / tekela xo ronaya. Mavajî wareyê / sahaya emniyete de şuxulnayîşê çek û sileh, aye deste de yo. Reyna wareyê perwerdeyîye de perwerde û mueseseyanê înan, tena destê dewlete de yê. Modernbîyayîşî de perwerde û mueseseyê perwerdeyî sey mektebî, faktorê muhîm ê. Perwerdeyî, hem yew projeya modernîyeyî ya û hem zî modernîye projeya perwerdeyî ya. Modernkerdişê cematî û gelan de mektep û perwerdeyîye, faktorê zaf muhîm ê. Çünke pê destê muesesanê perwerdeyî, dewleta neteweye / mîliye hemê hedefanê xo ana ca. Mavajî mektebanê ewilî / dibistanî viraştîşê hemwelatîyan de wayîrê rolê giran ê.

La şarê ke marûzê projeyanê modernkerdiş biyê vera nê projeyanê cîya-cîyayan stratejîyanê xo pawito û vera ci vinderto. Medreseyê rojhelatî / şerqî bi tebermendişê tevîd-î tedrisatî, xo û şarê xo tesîranê modernbîyayîşî ra pawitî. Xayeyê na xebate “medreseyî bi çî stratejîyan teberê tevîd-î tedrisat de mendê û bi çî stratejîyan tesîrê xo ramitê” cakerdiş o.

Metodolojiyê xebat, kalîtatîf a. Bi cigêrayîşê literatûr û mullaqatan ameya viraştîş. Xebate de, rojhelat / şerq sey yew kerdoxî / failî ameyo qebulkerdiş. Îlîmanê cematîyanê modernî de rojhelat / şerq sey yew obje yeno dîyayîş (Wallerstain 2005). Xebate de no fikir rexne / krîtîk beno û her gelê rojhelat / şerqî û karê înan sey yew fail yeno dîyayîş û tehlîlkerdiş. Mavajî literatûrê îlîmanê cematîyanê modernî de kelîmeyê “şerq” wayîrê manaya pejoratîf a. Kelîmeyêka nebaş a û manaya feqîriye, tepîyamendeye, ûêb. de yena şuxulnayîş. Naye ra, na xebate de semedê referansê literature, kelîmeya “şerq” ameya şuxulnayîş. Feqet semedê kerdoxîye / failîye yê şerq zî kelîmaya “rojhelat” ameya şuxulnayîş.

Kerdoxîyê / failîyê medreseyan bi xebata wareyî / saha ameya tespîtkerdiş. Mullaqatê ke mezunanê medreseyan de ameyê kerdiş, seba na xebat gelek materyalî dayê. Mullaqatê ke ti ra îstîfade biyê, zêde ra mezunanê Medreseyê Sipyeni yê. Tanî zî yê medreseyanê cîya-cîya mintiqayann ê. Yew mullaqat zî derheqê alaqayê medreseyan û musedeyê sîyasiyan de yo. Materyalo ke nê mullaqatan ra arêdiyayo, pabesteyê kerdoxîyê medreseyan ameyo tehlîlkerdiş. Kerdoxîyê medreseyan bi hewayo tematîk tespît biyê û ameyê şîrovekerdiş. Helbet na xebate, yew xebatê saha ya û xayeyê yê medreseyan ser o yew hukmo peroyin / umûmî vatiş nîyo. Na xebate, bi xebatê wareyî / saha, fehmkkerdişê medreseyan yew gam a.

2. MEDRESEYÎ Û TEWHÎDÎ TEDRÎSAT

Seserra desin ra nat alemê Îslamî de medreseyî, sey musedeyê îlmî estê û xebata îlmî kenê (Şengül 2008). Wexta ke Kurdî biyê musulman, her bajarê Kur-

dan de medreseyi abiyê. Mavajî, Cizre, Urfa û cayê bînan de. Wextê Eyubîyan de, yew tanzîmatê perwerdeyi biyo. Goreyê nê tanzîmat medreseyan de îlmê Îslamî, astronomî, muhendîsî, mantiq, tip, tarîx, coğrafya, edebîyat ûsn. . yewendes îlmî belî biyê û sey mufredat ameyê wendiş. Medreseyi, na xet ser roj bi roj aver şiyê. Wexta ke Moxolan alemê Îslamî îstîla kerd medreseyan zaf zerar dî û zaf tepîya şî. Badê Moxolan wextê Mîrîtîyê Kurdan de mavajî Farqîn, Silîva, Hasankeyf, Bedlîs, Hasankeyf, Cizre û Urfa de yew tradîsyonê medrese esto (Epözdemîr 2009). No tradîsyon de xususan tesîrê tesewuf aseno. Verê Mewlana Xalid ke ey Neqşîbendîye ard mîyanê Kurdan, medreseyan de tesîrê Qadîrîyan bibî. Badê ardişê Terîqatê Neqşîyî, medreseyê Qadîrîyan vurîyê û biyê Neqşîbendîyê. Naye ra, nê medreseyi bi nameyê Medreseyê Neqşîbendîyan yenê namekerdiş (Şengul 2008; Epözdemîr 2009). Medreseyan cîya-cîya dewreyê tarîxî de cîya-cîya namêyi girewtê: Medreseyanê wextê dewreyê mîrîtîya Kurdan ra “Medreseyê Mîran”, medreseyi ke bine tesîrê terîqatê neqşîyî de şekil girewtî ra “Medreseyê Neqşîbendîyan”, semedê ke medreseyi mintiqayê Kurdan de awan biyê û bine kulturê Kurdan de şekil girewto nameyê “Medreseyê Kurdan” û yew zî nameyo ke lîterature de vîyeren “Medreseyê Şerqî” yenê şuxulnayiş.

Modernbiyayîşê Osmanîyan ra nat mîyanê medreseyan û mekteban de yew mucadele destpêkeno. Xususan badê Cumhuriyet seba ke di hebî zîhnîyetan temsîl kenê, fikrê veradayîşê medresan mîyanê ronayoxanê Cumhuriyet de qewet geno. 1924 de bi qanûnê “Tewhid-i Tedrisat” hemeyê mueseseyê perwerdeyi gênê binê Wezaretê Perwerdeyiye Millî û perwerdiye de “yewîye” temîn bena (Kaymakcan 2006; MEB 2010). Perwerdiyê dînî nêwedariyayo, mîyanê sisteme de ca dayo ci: “Mektebê” îmam xetîp û îlahîyat abiyê. Bi îfadeyo bîn, perwerdiyê dînî, mîyanê sistema modern û sekulerî de goreyê ihtîyacê wextî reyna însa benê. La dewreyê tek partî (1923-1946) de semedo ke perwerdeyiye dînî zerar dano “inqilaban” no tetbîqatê Cumhuriyet terk kenê û sereyê 1930an de “mektebê” îmam xetîp û îlahîyat qefelyenê û mekteban de dersê dînî nêna diyayîş. 1946 ra pey perwerdeyiye dînî reyna agêriyena sistema perwerdeyi. Verê cû dersê dînî, bi waştîşî ameyê diyayîş, bade zî wextê îqtîdaranê bînan de xususan 1970an û 1980an de, dersê dînî benê mecburî (Kaymakcan 2006). Cumhuriyet teberê yew dewreyo kilmî de yanî dewreyê tek partî de wareyê perwerdiyê dînî veng nêverdayo.

Badê herbê yewinê dinya, mintiqayê Çewlîgî de zaf medreseyi nêmendî. Hem tesîrê herbî ra hem zî tetbîqatanê Cumhuriyeti ra, medreseyi zayı û zaif bî. Na mesela îfadeyanê Mehmedî Mela Emerî ra zî yena fehmkardiş. Seke nameyê yi ra zî fehmbeno ke babîyê yi zî mela biyo. Vatişanê yi ra yeno fehmkardiş ke keso ke eşkeno Qur’an biwanî, meyîti wedaro zî tira vanê mela:

“Mala Ehmed bi, Mala Ehmêdî Zeydûn, tiya Fexrûn ra bi, hol yo malla bi, eyarî Seydayî di bi. Ūmi itya Sipêni di medresa kerd a. In mallûno g’ yi het wend, wi lez merd nêşkê malatî tamûm kirî. Yi (Mela Emerî) Mala Ehmedî het ders guret, Mala Memîş yi het ders guret, Mala Silêmunî Alzûnî yi het ders guret. Mala Silêmun yo wext şîbi Îran. Uja fariskî musabi. Zê bilbilî zûnêni. (. . . .) Mallayî bîn bile çine bî. Yo mala Silêmun bi Alzûn di, yo Mala Şukrî bi Duernûn di, Mala Şukrî xu rî qarî’ Qur’anî bi (Qur’an wendbi). Ehendo g’ zûnêni meyt bişuyî, kefen kirî. In duarmalê ma di kum ca meyt bibênî ven dênî babiyê mi Mala Emerî, wi şîni şitîn. Sekerat di ço bibênî ven dên ci wi şîn çend ruejî serî niweşi ya wendîni” (Mehmedî 2005).

Wextê Halk Partî de hukmê cendirmeyan bêsinor o, bi îfadeyo bîn “asin wenî paxir virajeni”. No wexto xidar de Mehmedî Mela Emerî¹ qedexeyo ke medreseyan ser de yo wina vano: “O wext ders dayiş yasax bi. Yasax hama senî yasax! Tay kitabî çî ma berdî nimitî. Willayî pê in destûnî xu mi kitabî berdî axuerî ma di kerdî zerrê harrun û simer da ser (Mehmedî 2005)”. Na qedexîye têna wareyê perwerdeyîyê dînî de çin bî her wareyê dînî de mavajî feraîzê dînî ke her roj yenê ca de zî este bî. 1950 ra ver Çarşiyê Cêrî de ezan bi Tirkî ameynê vengdayiş. Mehmedî Mela Emerî na zordariyê bi nê îfadeyan, hîkaye keno: “Heta o [1950] wext azûn Tirkî wêndîn. Yo Mela Yaqub bi, çarşuyê cêrî di yi vendên vatîn “Tanri uludur! Tanri uludur! Tanridan başqa yoktur tapacak!”

Badê Demokrat Partî biney serbestî viraziyena, helbet na serbestî medreseyan zî biney kena rehat la qedexîye ke medreseyan ser de ya nêwedariyena. “Aya ser Demoqratû seçim qezenç kerd. Celal Bayar bi cumhurreîsî, Menderes bi başwekîl. Menderesî wexto g’ hukmat na rû azûn kerd Erebkî. Dersê Qur’anî kerd serbest. Medrese(yî) nê, dersê Qur’anî. Ma hînî o nûme ra Sipêni de medrese kerd a. Medrese kerd a. Hînî feqî bî zafî (. . .) Pîyor piya benu hêştês serrî. Itya Mazrafaqî dî, bo kêy yi hama zî hûniyo estû, keyê xu di ders dênî. La feqî dew ra vila nîkerdî. Feqî Çolig ra ûmênî ders gurêtîn û têpiya şîni. In kitabûn di zaf bibi mahîr. Tu vatîn qey pîyorin ezber ra zûnû” (Mehmedî 2005).

Her çiqas medreseyî badê Demokrat Partî binekêk biyê rehatî la reyna dewlet roj bi roj alternatîfê xo viraştî û waşt ke herindê medreseyan de înan îqame bikero. Her yew dewre de goreyê şertan medreseyan û ehlê medreseyî reyde bi cîya-cîya stratejîyanê xo îqame kerdo.

1 Birayê Seyda Mela Sileymanê Sipyenî yo

3. STRATEJİYÊ MEDRESEYAN

P. Berger, B. Berger û Kellner (2000), behs kenê ke vera moderbîyayişi de şarê ke rojawanij nîyê hîre tewirê înan estê. Goreyê nê fikirî netîceyê xebate de ameyo dîyayiş ke medreseyi sey yew îqtîdar mîyanê şare de xebitîyê. Bi cîya-cîya fonksiyonan, heyatê xo û tesîrê xo dewam kerdê. Medreseyan mîyanê şare de fonksiyonê halkerdîşê sey dewayanê medenî, deyn, arazî ardo ca. Reyna medreseyan sey yew merkezê muxalefetê sîyasî, kulturî û dînî xebitîyê. Fonksiyonê bin zî o yo ke wextê qedexekerdîşê kirdkî / zazakî de medreseyan kirdkî / zazakî sey zîwanê perwerdeyi qebl kerda.

3. 1. Îmamtiya Fexrî

Wextê Tek Partî de dewlete îmam perwerde nêkerdênî. Naye ra dewan û bajaran de îmamê camîyan ke medreseyan de wendebî, îmamîyê kerdênê. Maîşetê nê medreseyan de tewr ameyênê dîyene: Terefê şarî ra û terefê şêx û axan ra (Şengül 2008, r. 109). No munasebet ke mîyanê medrese û Melan de virazîyayo badê Tek Partî de zî dewam keno. Çünke çimê şarî de dîn têna bi medreseyan temsîl beno. Badê Tek Partî qedexeyîye ke medreseyan sero ya binekî bena sist. Medreseyi no wextî de binekî nefes gênê la ancî zaf rehet zî nîyê. 1950 ra pey dewreyo zafpartiyin de dewlete lîseyanê îmam xetîp akena û wazena venganiye ke medreseyi dekenê bi mezunanê îmam xetîp dekeroye (Şengül 2008, r. 110).

Îmamtiya fexrî semedê kultur û giraniye medreseyan, mîyanê şarî de ca girewtîşî yew faktoro gelek muhîm o. Medreseyan pê destê nê îmaman her bîyayişi ra heta mergî cayê xo şedna. No qeyde Melayê dewî sey giragiran mîyanê cematî de cayê xo girewtî. Hurmet û giraniyê melayan ke mîyanê cematî de virazîya badê cû zafê înan rê lazim bîya. Çünke wexto ke badê akerdîşî îmam xetîp û îlahîyat dewlet waşt ke cayê Melan bi mezunanê nê mekteban dekeroye. Melayan no hurmet û giraniya xo ra zaf îstîfade kerd.

3. 2. Ma Şinî Şerîat

Mîyane şarê Çewlîgî de yew qiseyo meşhur o ke hetê kerdoxîyê medreseyanê rojhelatî / şerqî yew stratejiyo muhîm îfade keno. Seke yeno zanayişi ke badê 1923 şarê mîyanê Çewlîgî û dewlete de yew serdinî virazîya. Şarê Çewlîgî muessesanê dewlete ra xo dûr girewt. Medreseyan zî no hal semedê estbîyayişê û ramitişê hukumê xo sey yew strateji dîyo. Mîyanê şarê Çewlîgî de sey yew mehkema xebitîyê, qiseykerdixî medreseyan zafêrî waran / sahan ra meseleyanê şarî rê “şerîat” ker-

do. Meseleyî ke şarê Çewlîgî pê medreseyan hal kerdênê, ewro teşkilatê edliye de mehkemayê asliye, sulh, arazî ûeb. de yenê mehkema kerdîş.

Helbet bê qewetê emniyet / pawitişî mehkema kerdîşî gelek yew gureyo çetin o. Bi vatişo bîn, bê dewlet tesîsê adalet, zaf çîyo balkêş o. Melayan bi çi qeyde hukmê xo romito seba fehmkerdîşî, na meselayê Seyda Mela Sileymanî Sipyenî fikir dana. Ehmedî Mela Emerî şahîdê na mesela bîyo, mesela goreyê vatişê ey yena neqilkerdîş. Rojek yew merdim semedê meselayê telaqî yeno verê Seyda Mela Sileymanî Sipyenî. Seyda goreyê vatişê merdim “şerîat keno” û merdimî ra vano “To cînîyê xo verdaya”.

Yo modow’ derg qedîya Mela Feyzî ûmi Sipênî qey Seydayî Ez şîya hetî. Nuno çî werdî çay çî ûme –xura Mela Feyzîyî zê waharî keyî çayê mizafirûn kerdîn de, sifri daritîn we- wextî şî hîn wextî rakowtişûn u, guya ma hîn cilun çî ûnî kenî ra. Va. “Willayî Seyda inî mallayî hetî ma me’dî (xiybetî) tu kenî zaf mi zuar yenu!”. Seydayî va. “La kenî vûnî se?” Yi va. “O yo merdim estu, [....] ra, ûmo (ameyo) tu het, cînîyê yi verdîyawa ma pîyorin vatu “verdîyawa”, yi vat –la ez şîya Mela Selîm Az (Şarî wever Seydayî ra ihna vatîn) fitwayê mi dawa ez ûmeya! Xura fitwayê tu kum vînu hîn nêftun toyê vaju. (... .) E! Senî g’ vatu Mela Silêmunî fitwa dawa, birarû cînek dawa ci. Gureta şîyu. Lîya wi bi sur. Va: “Feyzo ti serî siway ûmêyî!. Tu qey ina qal serî siway ra mi ra nivata?” Yi va. “Willayî Seyda insun çî itya bî mi nîva!” Seydayî va. “Willayî ti ina hel kuwenî min a ver! –wextî hînî erêy o, wextî rakowtişûn o-“ Va. “Îna hela pey ez nêşkema itya vindirî!” Va: “Pey vasitey mi cînî ya vêrdîyayî şîyu nûmey mi birarûn ra vatu, birarû cînî dawa ci. ” Willahî aya sewi Seydayî Mela Feyzî zî eştî xuwa ver û şî. Hîn çî meheli rasey aya dew ez nêzûn. Şîbi uja vatbi ay mêrikî biyarîn ez çuwey kena (ma pêro piya huyennê). Mêrik remabi. Vendabi birarunî cînek, ez vun qey hîri birayî bîy, vatbi:” Lîya willayî mêrik umo mi het qeydo k’ mi rî qalî kerdî, pey îfadey feki yi cînî verdîyawa. Mi fitwa ci nêdawa! Ha verdayî!” Aye dima, birayî şîni cînek mêrikî ra genî. Vatey Seydayî kerd.

Na mesele mojnena ke medreseyan bi rîayetê şerîatê de bi cîdîyet û hesasîyet şarî hete de bîyê wayîrê îtibar. Ê pê no îtibarê xo hukm ke dayo ameyo tetbîqkerdîş. Mulaqatan de wasfê Seydayan ra ê ke zaf yenê vatiş; îlîm, selahat û teqwa bî. Nê wasîfî, mîyanê şarî de yew îqtîdaro manewîyê medreseyan awan kerd û hukmê medreseyan ramit.

3. 3. Zazakî / Kirdkî Tedrîsat

Proje yê modernbiyayîşî ê Cumhuriyet projeyeko homojen o. Yew dîn, yew zîwan û yew kultur ser o yo. Naye ra zî teberê zîwanê Tirkî de hemê zîwanî ameybî

qedexe kerdene. Na qedexîye seba ziwanan zaf tengasiye viraştîbî. Zafê ziwani binê tehlikeyê vindîbiyayîşî de mendê. Xususan mekteban de qijî ke ziwane înan Tirkî niyê gelêk tengasî anta. Na mesela de gelêk tecrubeyê trawmatîk estê (Coşkun Derrince û Uçarlar 2010). Wîna yew wexte de medreseyan de kirdkî sey yew ziwane perwerdeyî / tadrîsat ameyo qebulkerdiş. Qisedayîşî ke bi mezunanê medreseyê Sipyeni ameyê kerdiş de çîyo balkêş o bî ke ziwane medrese roj bi roj hetê kirdkî ya vurîyayo. Çünke Seyda wendişê xo zafê Binê Xetî de û Misir de kerdibî. Naye ra zafê tadrîsatê ey de tesîrê wendişê nê cayan estbî. Mavajî verê cû dersî bi Erebkî û kurmancî dayîyêne la badê zî herindê kurmancî û Erebi kirdkî gêna. La reyna ziwane dersdayîşî de reyna giraniya kurmanckî asena.

Mehmedî Mela Emerî vano medreseyê Sipyeni de, “[Seydayî] ders kurmuncî dênî. Seydayî talebeyê ke kird î (zaza yî), kirdkî ders dênî ci. Xora kamo ke kurmanc binî kurmanckî ders denî ci. La zafî kurmancî ders dênî.” Mezunanê medreseyê Sipyeni ra Mela Feyzî Buegij na prosesî wina îfade keno: “Ma zazakî ders dînî. Seydayî ewil kurmuncî ders deynî. Bîlaxere yo mude Şex Burhanedîn Efendî ûme uja va: “Şîma in zûnî ma qey eştu binî lingûn?” Madem kî ti zazakî hîna hol zûnî. (...) Ti zaza yî, talebey tu zaza yî. Seyda zî inê ra zaf memnun bi. Cuwa pey Seydayî hîn dest kerd pê zazakî ders da. Mi ra yo talebey yi wo kurmunc bibênî, zazakî nêzûnênî ay kurmuncî ders dênî ci. Zobîna zazakî ders dênî.”

Helbet vurîyayîşê ziwane dersdayîşî de tesîrê merdîmanê giragiranê Çewlîgî ra teberê faktoro tewr muhîm eleqeyê xo yo fehmkerdişê dersî yo. Bi îfadeyê Mela Feyzî Buegij “îstîfade” yo. Semedo ke wendekarê Seydayî zafê Kird ê Seyda zî roj bi roj ziwane dersdayîşî keno kirdkî. Mela Feyzî Buegij na mesela wina neql keno:

Kurmuncî zî hol zûnenî. La, zazakî him yi him ma hol zûnenî ma rî hîna zaf îstîfadey yi bi. Hetta yo di hebî hevalî mi bî, yin zî yo di serrî Seydayî het wend bîlaxere şî başqe cûn (cayan). Wexto g’ ma ûmey yo ca, qey Humayî ez raşt a vûna, ay hevalûnî mi ez berda yo kişt mi ra persey vatû: “Tu çendêk perey dey Seydayî?” Çi ra? Mîn u yin eynî kitab ra ders dîya, mabên mîn u yin di zaf ferq bi, ez yin ra zaf vernî di bîya. Yin vatu in gure pey torpîl bîyû. Aye ra Seydayî xusûsî îhtîmam mueto mi. Ez wiyawa. Mi va. “In senî qalî şîma hê kenî? In qalî seni yenî vatiş?” Mi Qowlî Ehmed wend Seydayî het. Mentiq. Seyda mentiq de xayet waharî ilm bi. Ez şîya yo seydayî het. Aw seyda zî meşhur bi guya. Ay seydayî mi ra va: “Tu in çend rey wendu? Ti qey tecrubî ya ûmê mi het?” Çünkî mi dersê xu Seydayî het guretîbî. Yanî mi ra yo şubhe kerd. Heta mîn feqîyun di dedîqudî virazîya. Va. “In sade qey denemî ûmo!”

Wina aseno ke meleyan seba ke ders seydayanê kurmancan ra girewta, înan zî ewilî de dersa xo kurmanckî danê. Na mesela tecrubanê Mela Mehemedê Mu-

radan de zî yena fehm kerdîş: “Derse xwi kurmunckî deni. Derse, Mela Yusuf yin zi kurmunckî denî; medresunî ze terefi Muşî di kurmuncun ra ders girotbi. Aye ra kurmunckî ders deni. Hetta ma bi xwi, ewil wexto g’ ma ders da -ma miyun kurmunckun di bi-, ma kurmunckî ders deni.” Bade cu wexta ke sey “dewuni Suelaxuni (Bongilani) ra Arzeng” yan zî “Pali” ke kirdî zaf ê, “hucrey” a xo kerda “ciya” û zîwanê dersdayîşî zî kerdo kirdkî. Mela Mehemed vano: “Hem mi imamti kerdin hem zi mi zazaki ders deni. Feqi ma zazayi bi. Ma hini kurmuncki ders nedeni, ma zazaki ders deni. Qaideye yin ma ewil ser nekotibi, cuwa pey ma g’ ders da, ma uniye (niyada) hina rehet a. Hina rehet yena fumkerdiş (Mela Mehemed 2003, r. 6).”

Mulaqatan de tayî vatişî eleqeyê medreseyan û kirdkî têna “îstîfade yan zi wayîrê medrese” bîyayîş ra wet, xo na mesele de mesul dîyayîş ra yo. Mesela Mela Kamil Puexî ke ey yew mewlido Kirdkî nuştî na ware de wina vano:

En hol çî yo. Ez wazena ina yew çî bibo. Werrekina yew teni ze mi xwi bieş-teni werte u bivaten “Liya, liya, ma zi esti!”. Erebi vuni “Entum rical, nehnu rical”. Yani şîma zi cumerd i, ma zi cumerd i. Werrekina cendna teni ina dewa bikeri. Mesela duar-male (dormeye) Cewligi de raştîa zi melay mumtazi esti. Werrekina ini melay mumtazi biumeni yew ca, derheqî nuştîşî zuni xwi de, tarixi xwi de eserek biviraştîni, biarden meydun. Kelimun ser o bixebitiyen zaf hol bin. Aye ra cido inayin ma wazeni. Feqet taye zi taye sebebuni qijkekun muejneni ra (nawneni). Dewlet zaten sansur virazena, gef-gurr kena. Nat-weta ma eşnaweni, hevalun bena heqaret pey kena. Vuna “Ti murteci yi, ti şerietci yi, nezuna ci yi”. Ancax ma cesaret keni g’ şî (şeri)) cumi u be (beri). Cesareti ma itya ya wet niviyerto. Feqet gerek ma hol bizuni g’ pey in cesaret tenya (tenya), pey şîyayîş u umeyîş cumi teyna merdim xwi nexelesnenu. Axirqiyamet de yew melaike ven deno (veng dano) vuno “Ya eyyuhel enbiya” (gele pexemberan) u “Ya eyyuhel ulema (gele zanayeyan)! Şîma wexto g’ dinya de cuwiye, şîma wezife xwi ardu ca?” In hedisi ra yeno zunayîş ke ehli ilmi mesul o. Allah ehli ilmi mesul tepşenu. Her mela gerek bizuno g’ mesul o. Wexto g’ qey (semedê) xatir şari ya, yani qey xatir zerero g’ ci re yeno, wezifey xwi ca nearo, mesul o. Wa qeti bizuno g’ ceza beno. (...) Efendim boluciye nibena. In heq-huquq Cenabi Allay dawo insani. Herkes hurr o. Dini islami wexto g’ ume, va “Herkes hurr o”. Qur’an de yew heqe milki diyo insanun. Insan eşkenu milki xwi de teserruf bikeru. Heqi dexl u mudaxeley cewi (kesi) cine yo. Zuni ma Kurdki yo. Wexto g’ yew mi ra vajo “Ti zuni xwi qali mekir!” yan zi yew Erebi ra, yew Tirki ra vajo “Zuni xwi qali mekir!”, mudaxeley huquqe ilahi kenu. Cunke Cenabi Allay vato: şîma heq-huquqi yewbinun bidin. Heqi yewbinun re riayet bikerin. Hududi yewbinun bişînasnin. Heqi tu heta kum ca wo, heta uca şo. Cuwa wet sirayet mekir, tecawuz mekir. Aye ra Kurdkiqalikerdiş parcekerdiş u boluciye niya. Gerek herkes riayeti

heq-huquqi yewbinun bikero. Zuni xwi bimuso, bi reheti zuni xwi qali bikero. Zunun binun zi wa xwi re bimuso. Kum vajo “Boluciye ya” xeta ya, qala yunliş a (Puexî 2002).

3. 4. Mîrasê Îlîmanê Îslamî

Medreseyi vera modernbiyayîşê îlîmanê Îslamî yew vazîfeyo giran ardo ca. Çünke ma zanê ke modernbiyayîşê osmanîyan ra nata modernî wazenê ke reformê dînî virazê. Mîyanê modernan, xususan kemalîstan de dînî “maniyê averşiyayîş / teraqî” ameyêne diyayîş. Medreseyan de xebata îlmî têna semedê fehmkerdişê muradê îlahî yena kerdiş. Moderniye her çî kena yew wasita. Dînî zî înan rê xam niyo. Mavajî reformê dînî ke protestanîzm ke semedê kapîtalîzm sey yew paştâ pîl yena qebul kerdiş. Badê modernîyê rojawan, de reformê dînî zî pabesteyê ihtiyacê modernîyê ameyê kerdiş. Yan zî wina yew paralelî asena.

Nînan ra Çewlîgi de îmam û xoca yê ke mektebanê dewlete de wendo yew zemano dergî de bi şuphe ameyê qebul kerdiş. Mavajî çiyê balkêşo ke wextoke îmamî tayînê dewan biyê dewijan zaf qebul nêkerdî. Dewe de hem îmamê dewlet hem zî melayê medreseyi bibî. Zafê dewan de eke ê ke dewlet tayîn kerdî şarê mintiqa ra yo hurmetê melayan zano û melayî biyê îmam, ê ke dewlet tayîn kerdê biyê muezzîn. Wina mesela rê yew reyêk ameyo diyayîş û mesela kerda safî. Eke îmamî ke teber ra ameyî û muwazeneyî şarê nêzanêne zafê meseleyê nebaşî ameyê meydan. Mavajî gereyê melayan û dewijan biyo derheqê melayan û dewijan de tehqîqatî virazîyê. Helbet nê meseleyan de melayan mîyanê şarî de paştê xo hîna kerda zixm.

Eynî tewr derheqê malumatê ma de zî esto. Badê 12 Eylule Anqara ra semedê “îrşadî”, “alîmî” şawitê. Înan ra yewî yeno camiyê Hecî Xidir de weaz dano. Weazî de seba îteatê cuntayî cemat “îrşad” keno. Cemat qerqîliyeno la keso ke qal bikero çin o. Cemat ra yewî werizeno û vano “ay ra vajîn wa biyor war, ez ha sunetu ken”. Cemat zî pa werizeno û weazê cuntayê eskerîye zî kursî ra yeno war. Na mesela gelêk balkêş a. Çünke Çewlîgi de yew meseleya winasî qe camîyan de nêbena. Hîna nêşnawîyo ke cemat kursî ra mela ardo war.

3. 5. Merkezê Muxalefet Biyayîş

Medreseyan û mezunanê înan de muxalefet wasifo balkêş o. Çünke dewreyanê cîya- cîyayan de medreseyan bi hewayanê tewiran muxalefet kerdo. Her çend sey Seyda Mela Sileymanê Sipyenî tayî medreseyan de vera siyasete yew mesafeyek ronayo zî reyna Çewlîgi de muxalefet kerdişê melayan / medreseyan eşkera yo.

Mavajî Şakîr Epozdemîr ke ronayoxanê KPD ra yo. Goreyê vatişê ey Çewlîgî de zaf melayanê medreseyî paşt daya partiye înan. O bi fekê serekanê KDP Said Elçî ra vatenê: “Miyane Kurdan de tradîsyonê medresa esta. Ge ge temasê yin û siyaset zî esta. Xususan hereketê Barzanî rê hawilêka cîdî esta. Mesela ez zana bi hereketê Barzani, Çewlîgî de rehmeta Saidî [Elçî] zafi Melayî û şexî dormale xo de aredabi. Humartênê filan Mela, filan şexî.”

Serranê 1970in ra pey wexta ke xetê siyasî ya KDP hetê çepgirîye het şî melayanê medreseyan zî hetê partiyanê muhefezakar girewt. Mavajî MNP ra nat partiye ke na xeta siyasî de yê her wext Çewlîgî de gelêk reyî girewtî. Tercîhê siyasî yê medreseyan xususan dewreya darbeyê eskerîyê 12 Eylule de gelêk maruzê muameleyê xiraban benî. Xususan referandumê qanûna esasî yê 1982î Çewlîgî de bi yew nîsbeto berz red bî. Zafêrî melayê medreseyî îmamtiye ra erzîyê yan zî sirgûn biyê. Înan ra Mela Mehemed Muradan meseleyê xo wina vano:

“Uja di ez zaf nimenda. Nizdiye serr u nim, di seri ez uja menda. Ena hewi uja ra mi neqil xwi girot itya, ez umeya Dare Yeni, Cumiye Petroli. Bilaxere imtihuni imumti vejîya, ma şî Xarpet, mi imumti qezenc kerdi. 1977 di yo qanun vejîyabi, ena hewi itya qadroye imumti cine bi. Mi waşt ke yo dewa ke tenha ya, ez uja ders bîdi. Itya ra nesib mi bi ez şîya dewe Arzeng. Pabesteye Suelaxuni ya. Uja di elhemdulillahi new-des hebi telebeye mi bibi. Hire serri kusur ez uja di menda. Inqilabi Kenan Evreni ya pey, uja d’ yo surgun ma re ume. Uja ra ma şawit, ma şî Gexi. Mi istifa kerd. Badi istifayî ez şîya Qiziltepe-Merdin. Medreseye fiex Selaheddini di guere hire serri kusur mu ara da ci. Ma uja ders deni telebun. Heddi ma nebi, tabi guere quwetî xwi ma ders deni. Nizdiye hiris hebi telebe bibi, elhemdulillah. Tabi, şexî uja hunci (anci, reyna) eynî şekilde meaşî ma deni. Vatin yin uja cendek meaş do tu, yi zi ehendek meaşî mi deni. Di-hire serri mi uja ders da” (Mela Mehemed 2003, r. 7-8).

4. NETÎCE

Na xebate de seba fehmkerdîşê tewirê medreseyan prosesê modernbîyayîşî ame xebatnayene. Xebate de perspektîfê îlmanê cematkî yê modern ke şerq û mueseseyê şerqî sey yew meful yenê dîyayîş, rexne bî û şerq û mueseseyê şerqî sey yew kerdoxî / failî ameyê qebul kerdiş. Xebate de ameyo dîyayîş ke medreseyî, sey yew iqtîdar, mîyanê şarî de xebitîyê. Bi fonksîyonanê cîya-cîyayan heyatê xo û tesîrê xo dewam kerdê. Medreseyan mîyanê şarî de fonksîyonê halkerdîşê sey dewayanê medenî, deyn, arazî ardo ca. Reyna medreseyan sey yew merkezê muxalefetê siyasî, kulturî û dînî xebitîyê. Fonksîyonê bînî zî o yo ke wextê qedexekerdîşê kirdkî / zazakî de medreseyan kirdkî / zazakî sey zîwanê perwerdeyî qebul kerda.

Medreseyi her çiqas tarîxê ma yê nezdîye de qedexe biyê la reyna bi cîya-cîya temsîlan eşkê estbiyayîşê xo dewam bikerê. Na xebate de asayo ke xebatê wareyi / sahayî seba fehmkerdîşê rojhelat zaf muhîm ê. Helbet tîya de perspektîfê îlmanê cematkî yê modern ra xelisiyayîş şarto ewil o. Çünke no perspetîfî de cemat têna cematê rojawan o û ê bîn ganî seba ameyîşê sewîyeyê înan bixebitê. Cigêrayîşanê rojhelat û muesesanê rojhelat de, ganî rojhelat sey yew cemato xoser, wayîrê bawerî, tarîx, kultur bêro vînayîş û sey yew kerdox / faîl qebl bibo.

5. ÇIMEYÎ

- Adorno, T. W., Horkheimer, M. (1995). *Aydınlanmanın Diyalektiği I*. İstanbul: Kabcacı Yayınevi.
- Berger, P., Berger, B. û Kellner, H. (2000). *Modernleşme ve Bilinç*. İstanbul: Pınar Yayınları.
- Buegij, Mela Feyzi. (2005). Mela Silêmanî Sipênî –III, *Roportajkerdixî: W. K Merdimîn*. -N. Celalî-W. Zozanî, Kovara Vate, İstanbul.
- Epözdemir, Ş. (2009). *Medreseyên Miran*. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=RizgariİNiviskar&cmd=read&id=184629/01/2009>.
- Epözdemir, Ş. (2010). *Medreseyên Neqşebendiyan I*. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=RizgariİNiviskar&cmd=read&id=185529/01/2009>.
- Coşkun, V., Derince, Ş. M., Uçarlar N. (2010). *Dil Yarası: Türkiye’de Eğitimde Anadilinin Kullanılması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Deneyimleri*. Diyarbakır: DİSA (Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştırma Enstitüsü).
- Giddens, A. (2010). *Modernliğin Sonuçları*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Kaymakcan, R. (2006). *Türkiye’de Din Eğitimi Politikaları Üzerine Düşünceler*. http://www.dem.org.tr/makaleler/dinegitimi_recep_06072006_EKEV.pdf Resavacı 18 Nisan 2012.
- MEB, (2012) *Tevhid-î Tedrisat*. http://www.meb.gov.tr/inkilaplari/egitim/tevhidi_tedrisat.htm 19/04/2012.
- Mela Emerî, Mehmedî. (2005). Çewligî Ra Seydayo Namedar Mela Silêmanî Sipênî-I *Roportajkerdixî: W. K Merdimîn Vate Dergisi*24, 134-147, İstanbul.
- Huni, Mela Mehemed Elî (2004). “Zûnî Ma Weş o La Alimû İhmal Kerdo”, *Roportajkerdixî: W. K Merdimîn-N. Celalî Vate Dergisi* 22, 34-56 İstanbul.
- Muradan, Mela Mehemedî. (2003). “Ez İnê Zê Yew Musibetêk vîna”, *Roportajkerdixî: W. K Merdimîn-N. Celalî, Vate Dergisi*21, 4-18, İstanbul.
- Siwanij, Mela Mehemed Elî (2005). Mela Silemani Sipeni-II, *Roportajkerdixî: W. K Merdimîn-N. Celalî-W. Zozanî, Vate Dergisi*, 25, 101-112
- Özsoy, S. (2009). “Türk Modernleşmesi”, *Demokrasi ve Eğitim: Dewey Perspektifinden Bir Çözümleme. Kuram ve Uygulamada Eğitim Bilimleri*, 9 (4), 1895-1931.

- Puexî, Mela Kamil. (2002). "Werrekîna İn Melayî Mumtazî Biûmenî Yew Ca", *Roportajkerdax: W. K Merdimîn, Vate Dergisi*, 18, . . sayfa numaraları eksik
- Şengül, S. (2008). *Bilgi, Toplum, İktidar: Osmanlı ve Cumhuriyet Modernleşmesi ile Karşılaşma Sürecinde Doğu Medreseleri*. Yayınlanmamış Doktora Tezi. Ankara: Hacettepe Üniversitesi.
- Wallerstein, I. (2005). *Dünya Sistemleri Analizi: Bir Giriş*. 2. Baskı. İstanbul: Weşanxaneyê Aram.
- Vali, A. (2010). Kürt Aydınları Modernleşmeye Pozitivistçe Yaklaşıyor. *Roportaj: Fırat Aydınkaya, Dipnot Dergisi*, 1, İstanbul.

Extended Abstract

Modernity has begun in the west and influenced the whole world. It is a dominant trend, encompassing all areas of life. Modernity, the nation-state-assisted, set up the monopoly of all areas of life. For instance, the use of firearm in the security field is in the state's monopoly. In addition, it is in force in the field of education. Education, and educational institutions are under the control of the state. In the process of modernization, education and educational institutions such as schools are very important because national states accomplish their targets through educational institutions. For example, primary schools have an important role in the construction of citizens and vocational schools provide the needs of the market manpower.

However, communities are exposed to modernization protecting themselves against modern projects with different strategies and focused against. Counter-strategies that are produced against modernization can be seen in all areas of life. Resistance of east / Kurdish madrasas are a good example in education area. Eastern / Kurdish Madrasas are prohibited with the law of TevhîdiTedisat. However, the madrasas have continued their activities in the underground. In this way, madrasas have retained themselves and its people from the effects of modernization. Especially the religious sciences were preserved. Reform in religion were to be implemented as a project of modernity in the early stages of the Republic.

The aim of this study is to research how the madrasas stay out Tevhîdi Tedrisat and by which strategies continue their effects. Method of the study is qualitative. It is based on screening of the literature and obtaining data from in-depth interviews on the subject / topic. In the study, contrary to modern social sciences, the east has been recognized as a subject / maker although, in the modern social sciences the east is analyzed as an object. In the study, this approach has been criticized and all actions of the east are analyzed in the context of its subjectivity.

As a result, the madrasas are committed as a power in the society. They have continued to impact the society by performing different functions. These functions transformed madrasas into a power in the society. Madrasas have resolved problems among people related to civil law, land law, and. In this sense, they worked as a court. Madrasas are a religious, political and cultural opposition center. Another positive aspect of madrasas was that they maintained teaching Zazaki/Kirdki Kurdish (as well as Kurmanji Kurdish) at a time when Kurdish language was banned.

A Sociological Analysis of Life Conditions within Kurdish Society: Kurdish People's Quality of Life (1998-2013)

Analîzeke Sosyolojîk li ser Şertên Jiyânê di Nava Civaka Kurdan de: Qelîteya Jiyânê ya Kurdan (1998-2013)

Fereydoon RAHMANI*

ABSTRACT:

Quality of life research nowadays has become an important discipline within the social science and humanities. It has developed itself out of the social indicators movement as a tool of social reporting or socio-economic evaluation of people's life conditions. Advancements in the field accelerated the research diversification in a way that today we encounter very much cutting-edge, professional subfields of quality of life, and many leading scientists within the discipline. Alex C. Michalos, Ed Diener, Heinz Herbert Noll, Ruut Venhoven, Richard Easterlin and Wolfgang Schulz are only a few names within hundreds of scientists who contributed to the discipline and its advancement to recognize important indicators of humankind's well-being and quality of life. Combinative model of Wolfgang Schulz has been used to evaluate the quality of life of Kurdish populations around the world and this article has tried to summarize some findings of those researches.

Keywords: Quality of life, subjective quality of life, life satisfaction, Kurdish population in Iran, Iraqi Kurdistan region, Kurdish immigration around world.

* Assistant Professor,
University of Duhok,
Kurdistan
Dr. Zankoya Dihokê,
Kurdistan

e-mail: fereydoon.rahmani@uod.ac or
rahmanif@hotmail.com

PUXTE:

Di van salên dawiyê de di qadên zanistên civakî û mirovî de lêkolînên li ser qelîteya jiyânê bûne disîplîneke girîng. Ev disîplîn di nav tevgera nîşaneyên civakî de wek ragihaner yan jî wek helsegîna mercên jiyana

mirovan derketiye pêş. Ji bo nirxandina qelîteya jiyana nifûsa Kurd li derdora dinyayê rêbaza têkel (combinative model) ya Wolfgang Schulz hatiye bikaranîn û ev gotare hewl dide ku hin encamên van lêkolînan bi awayekî kurt vebêje.

Pêşveçûnên di vê qadê de lêkolînên ciyawaz derdixe holê, îro em pêrgî gelek nêrînên nû û bin-qadên qelîteya jiyane û gelek zanistên sereke di vê disîplîne de tên. Alex C. Michalos, Ed Diener, Heinz Herbert Noll, Ruut Veenhoven, Richard Easterlin and Wolfgang Schulz tenê çend nav in ji nava bi sedan zanistên di vê disîplîne ne yê ku serzêdekirin li disîplîne û pêşveçûn li ser danasîna nîşaneyên kamranî û qelîteya jiyane ya mirovahiyê kirin.

Peyvên sereke: qelîteya jiyane, qelîteya sûbjektîf a jiyane, tetmîna jiyane, nifûsa Kurd li Îranê, herêma Kurdistanê Îraqê, koçerên Kurd li derdora dinyayê.

1. INTRODUCTION

Contemporary Quality of Life research has developed itself into a multidisciplinary field of applied sociology. It cannot be seen anymore as just a subordination of social indicators movement of the last half a century. Quality of Life research has become a fundamental technique of peoples' life evaluation within different, but still interrelated science of sociology, psychology, economy, social policy and welfare systems, as well as social work and social planning. The field has diversified itself further in recent decades and has evolved into a standalone field within the social science family. It has led to erecting bridges between the field and the health / medical science, as well as the industrial development and globalization. Nowadays, many scientists are concerned about the effects of the globalized world on people's quality of life and well-being or the effects of the industrialization and expansion of technology or nanotechnology on communities' well-being. Advancements in the field accelerated the research diversification in a way, that today we encounter some cutting-edge, professional subfields of quality of life, and many leading scientists within the discipline. Alex C. Michalos is a leading Quality of Life scientist, who has gathered huge international data on Social Indicators of Quality of Life. His 1500 pages report on comparison between the Quality of Life indicators of US and Canada, added tremendously to the discipline's development. The world ranking psychologist, Ed Diener today counts as the forerunner of the Happiness research one of the foundations of Subjective Quality of Life measures. He believes that a real analysis of well-being and Quality of Life is not possible without proper evaluation and understanding of people's happiness level. Ruut Veenhoven, a professor of social conditions of human happiness at Erasmus University in Rotterdam, also helped greatly to develop the field further and is still leading researches on the main elements of happiness and subjective quality of life. Richard Easterlin, a professor

in economic and quality of life research and economic demography, has extensive studies on the relationship between economic and financial factors and happiness level or well-being of humankind. His theory on the effects of the economic growth on happiness and subjective quality of life in a form, that no economic growth alone could have a longer run increase in the level of quality of life or happiness, has led to a series of contradictory analysis and arguments.¹

A valid and scientifically appropriate evaluation of Quality of Life is merely achievable, when an approach triangulation and theory diversification is incorporated in the analysis process. In this regards, Wolfgang Zapf has been using a combination of subjective and objective indicators to better evaluate the people's living conditions or well-being, in which, one's life could be categorized from a very low living condition i. e. "deprivation" (combination of bad objective and negative subjective indicators) to a higher life level i. e. "well-being" (existence of both good objective and positive subjective indicators). Incorporating the material life indicators in the analysis will furnish the objective quality of life index; while non-material indicators provide subjective quality of life index. Wolfgang Schulz (1985), at the University of Vienna has incorporated psychosomatic indicators: "*general life satisfaction*", "*general happiness*" and "*material life satisfaction*" into a combinative index of "Subjective Quality of Life". This model later on is being used to evaluate the quality of life of Kurdish populations around the world (Schulz W. et al. 1985).

Apart from which elements we are going to incorporate in our subjective quality of life analysis, there are two main approaches, nowadays recognized in this field: Top-Down-Model and Bottom-Up-Model, in which the first one (Top-Down-Model), by measuring the global / overall subjective quality of life, is trying to provide some assessments of important effective domains. Conversely, the second model (Bottom-Up-Model) assumes, that a measurement of the global and overall subjective quality of life is best possible by assessing its different elements or social domains like quality of employment's life, income, health, dwelling, education, leisure, environment, etc. Although, both these models have accordingly reached some level of success in analyzing the population's quality of life, but what best features here, is normally to consider a combination model of these approaches. The only consideration here might be the incorporating a huge number of mostly meager indicators into the model, which would make the obtaining of scientific result very difficult or it will even make the research process at the stage of data-gathering or interview very long and exhausting.

1 Ruut Veenhoven and Floris Verguns, in a coauthored article (the Esterlin Illusion) claim that an increase in the GDP and economic growth will affect further increase in people's happiness and this contradicts Richard Easterlin's assertion in this regard.

2. AN ANALYSIS OF QUALITY OF LIFE OF KURDISH POPULATION

Although, the first academic studies on the Quality of Life started almost 40 years ago in United States and Europe, but it hasn't found its stronghold within the social sciences or practical research in developing countries including the Kurdish society yet. Analysis of Quality of Life in Kurdistan or within the Kurdish population may have indirectly been discussed in some research or academic writings, but it has never been considered for a holistic scientific regard. Mainly, the small scale research projects conducted in these countries were either focusing on specific target groups, which is the usual concern in the health related quality of life analysis, or it incorporates just some objective indicators, which cannot explain the overall quality of life of the population ever.

Maybe the first practice in applied sociological analysis of people's life conditions within the Kurdish population has been a field research at the University of Vienna in 1998-99 (Rahmani 1999), in which the subjective quality of life of Kurdish and Non-Kurdish population has been measured and compared. In this research, the author has tried for the first time to evaluate both objective and subjective quality of life of Kurdish urban population in Iran. Here, subjective quality of life has been evaluated at a general as well as domain levels. The subjective quality of life in this research is been built on a combination of three psychosomatic variables: "General Life Satisfaction", "Happiness" and "Material Life Satisfaction". The KMO test (Measure of sampling adequacy) has shown a satisfactory value of 0.65, while the Cronbach's Alpha (coefficient of internal consistency) has shown here a higher positive value of 0.80, which means the three selected variables are in a great internal consistency. This research shows, that over 90 percent of the Iranians in 1999 have been suffering from a very low or low to an average subjective quality of life, out of which 40 percent show a very low quality of life. This indicates a catastrophic level of well-being for the whole country in this year. There is a huge disparity between the level of life between the agglomeration Tehran and the urban Kurdish region of the country. Less than 42 percent of the Kurdish urban settlers of Iran show a low subjective quality of life, while the same indicator for the agglomeration of Tehran is about 30 percent. Also, the percentage of the people with highest subjective quality of life in Kurdish region is only about 2 percent, while in Tehran, it goes beyond 6 percent mark. From the total 272 interviews in this year, 11 people indicated of having the lowest level of subjective quality of life, which all fell within the Kurdish urban region and none of them emerged in the agglomeration of Tehran. A comparison of these findings with ones of similar researches for the

city of Vienna (1998) and Austria (1984), conducted by Wolfgang Schulz, shows a huge disparity between the demographic groups. The data show that Viennese have comparatively enjoyed a better subjective quality of life than others and Kurdish urban population of Iran has suffered most for its high percentage of low subjective quality of life (Figure 1).




Figure 1: Comparison of Subjective Quality of Life for different areas

Source: Fereydoon Rahmani (1999)

Findings of this study on the quality of life of Kurdish and Non-Kurdish urban population in Iran show that four main life domains, like “*fulfillment of material needs*”, “*job quality*”, “*residence size*” and “*housing density*” are fundamentally affecting the level of subjective quality of life. These four life domains, together account for over 50 percent of the variance within the subjective quality of life, it means, there is still room for some other important elements such as political or socio-economic factors to get involved into this equation (Figure 2).




Figure 2: Relationship between subjective quality of life and some important impact factors (social domains) in urban population of Iran, 1999

A gender distribution of the findings show that the female population, although suffers from a low subjective quality of life in both Kurdish and Non-Kurdish regions of Iran, but it has a slightly better condition than the male population. The findings show that one third (33. 3%) of the female population in Kurdish urban area suffers from a low subjective quality of life while almost half of the male population (49. 5%), indicate a low quality of life. The condition in the agglomeration of Tehran is much better: 22. 2 percent of the female population and 35 percent of males show a low subjective quality of life.

Findings of a 2011 research² on the Kurdish immigrants and refugees to Canada show a relative higher and better subjective quality of life. In contrast to the findings of the comparable research project of 1999 for Kurdish and Non-Kurdish Iranian population, in which 90 percent of population indicated of having a very low or low to average subjective quality of life, this research gives a relative better living condition data for the Kurdish immigrants in Canada. Accordingly, two third of the population show a high to average subjective quality of life, from which close to 23 percent show a high subjective quality of life. People with low subjective quality of life tend to be more than 37 percent mark (Table 1).

Level	Frequency	Percent
High	76	22. 77
Average	80	39. 60
Low	46	37. 62
Total	215	100

Table 1: Subjective Quality of Life within the Kurdish immigrants of Canada 2011

Source: Fereydoon Rahmani, unpublished field research in 2011, Toronto

Comparing the findings of the same research with the ones calculated for Austrians in 1984 or for the city of Vienna in 1998, indicates a better, but still low subjective quality of life for the Kurdish immigrants and refugees in Canada in 2011. In other words, Kurdish immigrants and refugees in Canada show a much better rate in subjective quality of life and well-being than the whole Iranian population or the Kurdish urban population, but still lower than the one of Austrian or Viennese population. While 34. 2 percent of Viennese in 1998 and only 27 percent of Austrians in 1984 show a high subjective quality of life, close to 23 percent

2 This research is directed by the author as a community based research conducted at Kurdish House in Toronto on 2011 and all the data are available in a SPSS file format.

of the Kurdish immigrants and refugees of Canada have shown a high subjective quality of life in 2011.

Distribution of subjective quality of life index by countries of origin within the Canadian-Kurdish immigrants and refugees in 2011 shows, that those Kurds, who originate from Iraq and Iran, have much higher rates of low subjective quality of life, and a relative higher level in the average subjective quality of life. The Kurds from Turkey show to have a relative equally distributed rates; it means people with low, high or average subjective quality of life are the same size. Although Kurds from Iran show a bigger share in high Subjective Quality of Life, but they also, controversially indicate a relative higher percentage of the low Subjective Quality of Life (Figure 3).




Figure 3: Subjective Quality of Life within Kurdish community of Canada, 2011

Source: Fereydoon Rahmani (2011)

By incorporating the “Happiness” variable into our analysis, we would realize that the Kurdish immigrants of Canada are better off than their level of Subjective Quality of Life. In average, there are more people that are happier than having a high Subjective Quality of Life. While the number of “very unhappy” and “unhappy” people within the Kurdish Canadians is extremely lower for all four parts of the Kurdistan regions, the number of Kurdish people who are “very happy” or “happy” is remarkable in all parts of Kurdistan (Figure 4).




Figure 4: Happiness level within Kurdish immigrants of Canada, 2011

Source: Fereydoon Rahmani, unpublished field research 2011, Toronto

In term of general life satisfaction also, these people have shown a tremendously satisfied level of life and Kurds from all four countries, simultaneously indicated a much higher level of general life satisfaction, even though they might have shown a relative lower subjective quality of life either. In term of “material life satisfaction”, although the situation doesn’t stay the same as “general life satisfaction” or level of “happiness”, but still it indicates a relative high satisfaction almost in all parts of Kurdistan within the Kurdish immigrants and refugees in Canada. Generally dissatisfaction in material life condition between the Kurdish immigrants of Canada is very marginal and it has led to a relative high subjective quality of life and general life satisfaction in 2011. From the total 92 Kurdish immigrants who, have indicated of being “satisfied” to “very satisfied” with their general financial / material life condition, more than one third originate from Iranian Kurdistan, 20 are from Turkish Kurdistan, 14 from Iraqi Kurdistan and only 12 from Syrian Kurdistan. The findings of the above discussed research project show that the number of people, who have indicated of having a very unsatisfactory financial or material life conditions, is very marginal between the Kurdish immigrants from all four parts of Kurdistan.

A distribution of the general life satisfaction within the Kurdish immigrants and refugees in Canada by gender shows, that male and female populations are both enjoying a high satisfactory level, while at the extreme level of satisfaction even female Kurdish immigrants indicate a better life satisfaction; it means number of women with a “very satisfied” life condition is relative higher than the same category in Kurdish male population (Figure 5).




Figure 5: General life satisfaction within Kurdish immigrants of Canada by gender in 2011

Source: Fereydoon Rahmani, unpublished field research 2011, Toronto

Findings of another research project³ for the Iraqi Kurdistan region at the beginning of 2013 show an extremely better upshot on the population’s quality

3 This research has been conducted as a series of students’ collective field evaluation for different areas at universities of Salahaddin-Hawler, Duhok and Koya in 2012-2013.

of life and well-being. According to such research the subjective quality of life of Kurdish population in Iraqi Kurdistan region is overwhelmingly higher than the one of Kurdish immigrants to Canada in 2011. While one fifth of the Kurds in Canada show a high subjective quality of life in 2011, this rate for Kurdish population of Iraqi Kurdistan indicates much higher than one third of the people. From 386 people, who have been interviewed in 2012-13, 137 people indicated to have a high subjective quality of life, and only 40 people showed a low subjective quality of life, which accounts for only 10 percent of all people (See table 2).

Level	Frequency	Percent
High Subj. QoL	137	35.5
Average Subj. QoL	208	53.9
Low Subj. QoL	40	10.4
Missing Value	1	3.
Total	386	100

Table 2: Subjective Quality of Life in Kurdistan region, 2013

Source: Fereydoon Rahmani, unpublished field research 2013, UoD, Kurdistan

As it has been often discussed, the people's "happiness" accounts for one of the most important elements in subjective quality of life index, which its level accelerates to a very high rate within the Kurdistan population in 2013. According to the research findings, 68 percent of all women and close to 60 percent of men show a high to very high happiness level in Iraqi Kurdistan region, while less than 7 percent of women and less than 9 percent of men indicated of being unhappy or very unhappy. The situation in term of general life satisfaction is even better: about 75 percent of women and 63 percent of men showed a high or very high general life satisfaction, while only 6 percent of each gender indicated to be unsatisfied or very unsatisfied with their general life conditions. In term of material life satisfaction also the situation remains almost the same with exception of a small increase in men's rates. While over 72 percent of women are "satisfied" or "very satisfied" with their material life, this for men, reduces to a bit over 60 percent. But the number of men with "unsatisfied" or "very unsatisfied" level of material life takes a rate of over 11 percent, while the same indicator for women stays as low as 5.6 percent mark (Figure 6).




Figure 6: Kurdistan region's subjective quality of life by gender in 2013

Source: Fereydoon Rahmani, unpublished field research 2013, UoD, Kurdistan

Further detailed analysis of findings shows that the marginal rates of subjective life dissatisfactions go to younger people, who have finished their high school or are at colleague stage. From 386 people interviewed in Kurdistan region of Iraq, only 40 people show to have a low subjective quality of life, from which 25 were college students or high school graduates; so it means a big portion of people with low subjective quality of life were young students and high school graduates, which require special attention in the economic developments and social planning projects by the Kurdistan regional government. The same way, from 30 people who indicated to be “unhappy” or “very unhappy” with their own life, 25 people are high school graduates or a college or university student.

REFERENCES

- Fereydoon, R. (1999). *Urbanisierung und Lebensqualitaet im Iran*. Unpublished doctoral dissertation, University of Vienna, Institut für Soziologie, Vienna, Austria.
- Fereydoon, R. (2011). *A community based research project on Quality of life*. (Unpublished data), the Greater Toronto Kurdish House, Toronto.
- Fereydoon, R. (2013). *A University research project on Quality of life* (unpublished data) SUH and UOD, Kurdistan.
- Schulz W. et al., (1985). *Lebensqualität in Österreich*. Wien, Austria: Institut für Soziologie der sozial und wirtschaftswissenschaftlichen Fakultät der Universität Wien

Xebatê Peter J. A. Lerch Derheqî Kurdolojî de*

The Studies of Peter J. A. Lerch on Kurdology**

Seyîdxan KURIJ***

KILMÎYE:

Armancê na xebatê, dasinaşynaişê xebatê ke Kurdologê Rusî, Peter. J. A. Lerch warê Kurdolojî kerdê yê. Peter Lerch seserre 19. de warê Kurdolojî de xebat kerda. O zanayê Rusan ê verênan ra yew o ke wareyê Kurdolojî de xebat kerda. Peter Lerchî 1850 de Petersburg de Akademîyî Qralîyet yê Zanayîye de qisimî tarîx–fîlolojî de xebat kerda. 1853 – 1856 beyntarê Împaratorîya Osmanî û Çarîya Rusya de herbî Kirim beno. No herb de taye Kurde ke hesîr gerîyayî bajarî Roslow de yenî ca kerdîş. Akademîyî Qralîyet yê Zanayîye de qisimî tarîx–ziwanzan wazîfe dano Peter Lerch ke o şêro Roslow. O şino o ca û Kurdan de beno sinaşî. Lerch tîya de Kurdkî (kurmanckî / kirdkî) metnanî folklorî are dano. Peter Lerch derheqî xebatê xo de yew rapor amade keno û nê raporî peşkeşî Akademîyî Qralîyet yê Zanayîye qisimî Tarîx – Ziwanzanî keno. O cuwa pey nê metnan ser o xebata zanistî keno. Vere cû foklorê Kurdan ser o nuseno. 1857 de xebatanê xo weşeneno. Nameyê kîtabê ey

* Ev nivîs digel hinek zêdehiyan ji nivîsa “Seyîdxan Kurij, *Xebatên Peter J. A. Lerch di Warê Kurdnasiyê de*, Kurdolojî -Gotarên Konferansa Kurdolojiyê-, edt. İbrahim Seydo Aydogan, Zanîngeha Hekariyê, 2011, r. 209-225” bi bal Kurdiya Zazakî ve hatiye veguhestin.

** This article was translated to Zazakî dialect of Kurdish with some additions from the study of “Seyîdxan Kurij, *Xebatên Peter J. A. Lerch di Warê Kurdnasiyê de*, Kurdolojî -Gotarên Konferansa Kurdolojiyê-, edt. İbrahim Seydo Aydogan, Zanîngeha Hekariyê, 2011, p. 209-225”.

*** Researcher, Lêkolîner.
seyidxan12@googlemail.com

“Derheqî Kurdan û Keldanîyî Bakûr yê Îranî de Cigêrayîşî” yo. Dima no kîtabî Amsterdam de bi almankî (Forschungen und die über die curing İranischen Nordchaldäer) çap beno. Hewt hebî tekstê kirdkî yê ey estî. Tekstî bi alfabeya lepsîsus ameyê nuştîş. Na alfabeya taybet terefê Peter J. A. Lerch ameya hedrekerdiş. Nê transkribe bi alfabeya latîni bî. Na cigêrayîşî de kîtabê Peter J. A. Lerchî, tekstê ke bi kurmanckî û zazakî amênuştîş ser o xebat bîya û tekstî transkribe bî.

Kelîmeyê kîlîdî: Peter J. A. Lerch, Kurdolojî, tekstê Kirdkî.

ABSTRACT:

The aim of this study is to examine Peter J. A. Lerch's work on Kurdish language. Peter J. A. Lerch is a Russian linguist who worked at Petersburg Royal Academy, Department of History and Languages in 1850. He is the first linguist who worked in the field of Kurdology. Ottoman Empire and Russian Empire had war called 'Kırım war' between 1853 and 1856. During that war, some innocent Kurds were captured in Roslow city. Petersburg Royal Academy appointed Peter J. A. Lerch to the camp where the captive Kurds as well as the other captives were kept so that he could study the languages spoken by the captives. Peter J. A. Lerch went to the camp and met the captive Kurds. He learnt Kurdish and collected language material related to Kirdkî /Zazakî and Kurmanji Kurdish as well as their folklore. Following this, he prepared a report on his work related to Kurdish language and folklore and gave it to Petersburg Royal Academy, Department of History and Languages. Afterwards, he studied on the Kurdish materials he collected. Later, he wrote his book on Kurdish language and folklore. He published his work in Petersburg in 1857. His book is titled "About Kurds and Chaldeans in Northern Iran". The book was later published in German with the title of "Forschungen und die über die curing İranischen Nordchaldäer" in Amsterdam. There are seven Kurdish texts in the book. The texts are written by Lepsisus alphabet. It is a special alphabet that prepared by Peter J. A. Lerch. They are later transcribed to Latin alphabet. The focus of this research is the contents of Peter J. A. Lerch's book which are on Kurdish language (i.e. the texts written in Kirdkî Kurdish dialect as well as Kurmanji Kurdish dialect).

Keywords: Peter J. A. Lerch, Kurdology, Kirdkî /Zazakî Kurdish texts, Kurmanji Kurdish texts.

1. DESTPÊK

Ma wazenî na xebatê xo de xebatê ziwanzanî Rus, Peter. J. A. Lerch ke warê Kurdoloji kerda, na xebat ser vinderi.

Peter Lerch seserre 19. de warê Kurdoloji de xebat kerda. O zanayê Rusan ê verênan ra yew-o ke warî / warê Kurdoloji de xebat kerda. Peter Lerchî 1850 de Petersburg de Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye de qîsimî Tarîx-Fîlolojî de xebat kerda.

1853-1856 beyntarê Împaratorîya Osmanî û Çarîya Rusya de herbî Kırım beno. No herb de taye Kurde ke hesîr gerîyayî bajarî Roslow de yenî ca kerdiş. Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye de qîsimî Tarîx-Ziwanzan wazîfe dano Peter Lerch ke o şêro Roslow. Nayê sero o wisarî 1856 de şino Roslow û tîya de 11 hefteyî maneno. Lerch tîya de Kurdkî (kurmanckî / kirdkî) metnanî folklorî are dano. O cuwa pey nê metnan ser o xebata zanistî keno û sey kitab çap keno. No kitab sey di cîldan yeno çap kerdiş. Ancî Peter Lerch derheqî xebatê xo

yê Roslow de yew rapor amade keno û nê raporî peşkeşî Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye qisimî Tarîx–Ziwanzanî keno. No rapor cildî yewin ê kitabî Lerch de esto. Peter Lerch no raporî xo de zaf hîra behsê metodanî xo yê îlmî keno. O îzah keno ke xebatê xo ya warê Kurdolojî de kam metodî şuxilnayî.

Wexto ke Peter Lerch bes Kurdkî museno, o bi îmkananî xo qaydeyanî grameri Kurdkî veceno orte û dest pê keno metnanî Kurdkî ser o xebat keno. O bi ardimî çend Kurdan her di lehçeyanî Kurdkî (kurmançî û kirdkî) ser o xebat keno. Peter Lerch goreyî alfabeya Linguistik von Lepsîus semedê nuştîşî Kurdkî ya yew alfabeya bi 39 herfan keno hedre. Nê herfan ra 9 tene bi veng î, 30 tene bê veng î. Bi venginan ra 5 tene bi vengo qalin, 4 tene bi vengo barî yî.

Peter J. A. Lerch materyalî ke Roslow de topkerdibî û sero xebat kerdibî bi nameyî “Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer (Derheqî Kurdan û Keldaniyî Bakûr yê Îranî de Cigêrayîşî), sey di cild 1857 de St. Petersburg de çap keno. Eynî kitab 1979 de Amsterdam de newe ra bi almankî yeno çapkerdiş. Ma na xebatê xo de no çapî almankî esas girewto. Metnî Kurdkî yê nê kitabî çapî Amsterdam de zî sey çapî St. Petersburg bi alfabeya Lepsîus sey orjînal ameyî çap kerdiş. La no çapî Amsterdam de tercumeyî almankî yê metnanî Kurdkî zî esto.

Ma no nuşte de nê temayan ser o vindertî:

1. Naverokî kitabani Peter J. A. Lerch

a) Nuştêyî bi lehçeyî kurmançkî

b) Nuştêyî bi lehçeyî kirdkî

2. Tarnskirîpsiyonî metnanî kirdkî

Seke ma cor de zî nuştîbi Peter Lerch' kitabî xo de 7 metnî kirdkî neşir kerdî. Heme 7 metnî bi alfabeya Lepsîus ya Linguistik ameyî nuştîş. Na alfabe yew alfabeya taybetî ya. Nê metnî kirdkî ke Peter Lerch kitabî xo de neşir kerdî, verî hetî nuşttox / cigêrayox Mehemed Malmîsanij ra bi alfabeya latînî ya Kurdkî (Alfabeya Celadet Bedirxan) newe ra ameyî nuştîş yanî ameyî transkîrîpe kerdiş û 1986 de kovara Enstîtuyî Kurd Paris “Hêvî” de ameyî çap kerdiş. Cuwa pey mi reyna nê metnî bi alfabeya Kurdkî newe-ra nuştî û ne metnî 1995 de rojnameyî “Azadî” ke Îstanbul de amênî neşir kerdiş de çap bîyi.

2. PETER LERCHÎ ÇIRA Û SENÎ DEST BI XEBATÊ KURDOLOJÎ KERD?

Ma wazenî na xebatê xo de xebatê ziwanzanî Rus, Peter. J. A. Lerch ke warê Kurdolojî kerda, na xebat ser vinderi.

Peter Lerch seserre 19. de warê Kurdolojî de xebat kerda. O zanayê Rusan ê verênan ra yew-o ke warî / warê Kurdolojî de xebat kerda. Peter Lerchî 1850 de Petersburg de Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye de qisimî Tarîx–Filolojî de xebat kerda. Peter Lerch verî ziwani farisî ser o xebitîyayo, çunke destananî îranî û sanskritî zaf dîqetî ey antênî. O yew mudet cuwa pey ferq keno ke no war zaf hera yew war o, no rid ra o warê xebatê xo keno teng, yanî tena yew

war de xebatê xo ramneno. Peter Lerch warê îranoloji de verî tay nuşteyan waneno, bade 1852 de çend nuşteyanî akademîkar – cigêrayox Kunîk waneno. Kunîk cigêrayîşanî xo de ziwan, kultur, tarîx û halî cemat yê sosyal û cematî yê şaranî îranî sero xebitîyeno. Kunîk kitabî xo yo bi nameyî “Les tribus des Courdes Iranien” (Eşîretî Kurdan ê Îranî) (Lerch 1857) de nuseno ke eke merdim biwazo derheqî Asûr, Babil û şaranî bînan de cigêrayîş virazo, ganî merdim Kurdan hol bisinasno.

Nayê sero Peter Lerch bawer keno ke xebatî derheqî Asûr, Babil û şaranî bîn de girêdayîyê xebatanî derheqî Kurdan de yê. Çünke o wext zafê cigêrayoxan bawer kerdênî ke alaqa yî Kurdan û Asûriyan esto, yanî ê yew kok ra yenî.

Peter Lerch zaf binî tesirî nê îddiayan de maneno û o wexta pey hinî Kurdan sero xebatê xo ramneno. No rid ra o dest ci keno tarîxî Kurdan sero çimeyan gêreno. No wext de kitabxaneyî

Akademiyî Qraliyet yê Zanayîye de kitabî Şerefxan Bêdlîsî „Şerefname“ vînenno. Mudurî kitabxaneyî Boris. von Dohrn musade dano Peter Lerch ke o no kitabî biwano. Lerch bê Şerefname çend kitabî bînan zî peyda keno û waneno. Peynîyê nê xebatanî xo de Peter Lerch yeno na bawerîye ke tarîxî Kurdan tarîxî devletan ra zaf tarîxî eşîretan o, la nê eşîrî tarîxî devletan de zaf yew cayo muhîm genî (Lerch 1857, I, 5). Nayê sero o xebatê xo eşîretanî Kurdan sero ramneno.

Peter Lerch no wext de kovara bi nameyî “Nordische Biene-23. 12. 1855” (Lerch 1857, I, 6) de bi manşetî “Bajarî Smolonskî de Kurdkî” yew xeber waneno. Na xeber de yeno nuştîş ke herbî benatey Împaratoriya Osmanî û Çariya Rusya de taye Kurdkî hesîr geriyayî û nê hesîrî cîya cîya bajarî Rusya de ameyî ca kerdiş. Lerch îdareyî Akademiyî Qraliyet yê Zanayîye de qisimî Tarîx – Ziwanzanî ra musade wazeno ke bieşko şêro bajarî Smolonskî nê Kurdanî hesîran vîno û yew mudet înan het de bimano. Îdareyî Akademiyî Qraliyet yê Zanayîye de qisimî Tarîx – Ziwanzanî no waştîş ey qebûl keno.

Peter Lerch bawer keno ke tarîxî yew şar sero cigêrayîş girêdayîye ziwan û kulturî ey şarî yo. O verî ke şêro Roslow cigêrayîşî ke Kurdan sero ameyî nuştîş înan peyda keno û waneno. Nê cigêrayîşan ra yew xebatê Nicol von Chanykow a. Chanykow konsolosî Rusya yê Tebrîz bi. O 1856 de çend metnan ê Tirkî, farisî û Kurdkî Akademiyî Qraliyet yê Zanayîye rê şaweno. Chanykow o wext kitabî Sadî Şirazî’ „Gulîstan“ zî Kurdkî ra açarneno ruskî.

Peter Lerch eynî wext de xebatanî konsolosî Rusya yê Erzurum Alexander Jaba zî peyda keno. Alexander Jaba hem folklorî Kurdan ra nimuneyan topkeno hem zî derheqî eşîretanî Kurdan û şairanî Kurdan de cigêrayîşan virazeno. Alexander Jaba nê xebatanî xo açarneno franskî zî û dano çap kerdiş. Înan ra teber Lerch kitabî A. Chodzko’ “Etudes philologiques sur la langue Kurde -dialecte de Suleimanie (Lerch 1857, I, 8) (Derheqî Ziwanî Kurdkî de Cigêrayîşî Filolojîk – Fekî Suleymaniye) sero zî xebat keno.

Peter Lerch nuseno ke, o neşkayo nê her di kitabî ca bikero (Lerch 1857, I, 10).

1- Kîtabî Guiseppe Campanelli bi nameyî “Storia della Regione del Kürdistan; Constantinopoli-1818”. No kitab yew kitabxaneyî Istanbul de biyo.

2- Yew xebata ke derheqî tarîx û ziwani Kurdan de hetî hîrê mîsyoneran ra ameya hedre kerdîş. No kitab de behsê taye nuşteyan bena ke verî 700- 800 serr hetî Mîrî Amediya Behram Paşa ra ameyî nuştîş.

No kitab ke Peter Lerch behs keno kitabî papazî Îtalî Garzonî bi nameyî “Grammatica e vocabulario della LINGUA KurdA’ yo. No kitab 1787 de Îtalya de ameyo çapkerdîş.

Seke yeno zanayîş Garzonî 18 serrî Kurdîstan de Misul, Amediya û Zaxo de mendibi û derheqî Kurdan de cigêrayîşî viraştîbî.

3. KURDÎ HESÎRÎ KE BAJARÎ ROSLOW DE AMEYÎ CA KERDIŞ

1853 – 1856 beyntarê Împaratoriya Osmanî û Çarîya Rusya de herbî Kirim beno. No herb de taye Kurde ke hesîr gerîyayî bajarî Roslow de yenî ca kerdîş. No herb de pêrodayişî hetî Kars de hende 300 eskerî Osamanîyan esîr gerîyênî. Mîyanî înan de Tirkî, Erebi û hende 50 tenî zî Kurdî estî (Lerch 1857). Kurdî ke Roslow de manênî ê heremanî Kurdîstan Merdîn, Cizire (Eyaleta Heqarî), Dêrsim, Muş, Diyarbekîr (Eyaleta Kurdîstan), Riha, Bircik (Eyaleta Helep), Xarput, Meletî, Maden, Arebgîr, (Eyaleta Xarput) û Erzirom ra yî. “Ê heremî Kurdîstano Rojava heremî beyntarê Firato corîn û Dicle ra amêbi. Pêroyin teberî Kurdî de, Tirkîya Anotolî zî qisêkerdênî.

Înan ra tayên (yew ser û nê de) ruski fehm kerdênî. Înan ra kes nêşkênî binuso, la tayî înan êşkênî hedî hedî biwanî. Ê 10-12 kes yew ban de mendênî û her wext yew bîn ziyaret kerdênî. Mîyanî Kurdan de yew hozan zî bi (Lerch 1857, r. 26).

Peter Lerch na xebatê xo yê Roslow sero yew rapor dano Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye de qisimî Tarîx–Ziwanzanî (Lerch 1857, I, 23-46). Lerch no raporî xo de behsê tayê Kurdan keno ke ey her tim înan de sohbet kerdo. Înan yew lacî serekî eşîreta Rişwan Eli Axa Muhammed o. Eli Axa o wext merdibi. Yê bîn warzayî serekî eşîretê Pêçar Husên û embazî xo Eli bî. Eli Hênî ra eşîretê Dimî / Demî ra yo. Ancî tîya de taye Kurdî ke kirdkî qisêkerdênî estbîy. Nê Kurdî qezayê Çewlîg Dara Hênî, mintiqayê Siwan ra bîy. Înan ra nameyî yewî Hesen o. Hesen dewê Siwan Kasan ra yo. Peter Lerch embazîye Kurdan ra zaf memnun maneno. O raporî xo de Kurdan zaf wasifneno.

Pêroyî nê rapor bi tercumeyî kirdkî no kitab de esto, no rid ra ez niwazeno dergûdila behsî nê raporî bikerî.

4. PETER J. A. LERCH ROSLOW DE BI HESÎRANÎ KURDAN DE PÎYA MANENO

Akademîyî Qraliyet yê Zanayîye de qisimî Tarîx – Ziwanzan wazîfe dano Peter Lerch ke o şêro Roslow. Nayê sero o wisarî 1856 de şino Roslow û tîya de 11 hefteyî maneno. Lerch tîya de Kurdî (kurmanckî / kirdkî) metnanî folklorî are dano. (Lerch 1857, I, 23-46)

Peter Lerch şîyayîşî xo yê Roslow raporî xo de wina nuseno, “Emser 28î sibat de qedîyayîşî qismî yewin yê xebatê mina bi nameyî “Kurdan Sero Cigêrayîşî” ra pey ez St: Petersburg ra vecîyaya. 7 Edar de ez resaya Roslow. Musadeyo ke mi walîtîye ra girewtîbî, mi o musade da îdareciyanî ucayî û bi ardimî înan ez eynî roj şîya cayî Kurdanî esîran. No hawa mi dest bi karî xo kerd. Seke şîma zanî mi cuwa ver no derheq de cigêrayîşî viraştîbî. No rid ra ez semedê no wazîfeya hedre bîya” (Lerch 1857, I, 23).

Lerch hetanî 26 Gulan 1856 Roslow de Kurdan het de maneno. O yew mudet cuwa pey ferq keno ke Kurdî tîyayî di lehçeyanî Kurdkî qisê kenî. Nê lehçeyî kurmanckî û kirdkî yî. Lerch pê ardimî materyalî xo semedê xo ya yew ferhengî qijkek keno hedre. O bi ardimî nê ferhengî û Kurdanî tîyayî kurmanckî museno. Lerch Kurdanî tîyayî de beno dost, her wext înan de yeno pêhet û sohbet keno. Peter Lerch metnanî kurmanckî kesanî sey Muhammed, Husên û Elî ra, metnanî kirdkî zî Heseno Sîwanîj ra geno. Lerch nê metnî ke Kurdan ra goşdarî kerdî pêroyin qeyd keno û cuwa pey înan sero xebat keno. O nê Kurdan ra klaman, sanikan, destananî Kurdan, pêrodayişî beyntarê eşîran, hikayeyî ke pêrodayişî beyntarê mîranî Kurdan, pêrodayişî beyntarê Kurdan û mîletanî bînan, anî zîwan, top-keno.

Nê sohbetan de Kurdî Lerch rê hikayeyanî derheqî heywanan de (fabl) zî vanî. Peter Lerch eseranî xo de behsê hikayeya Pûm Quçûn û Leyleg keno. Hesên ey rê hikayeyî Mirçîka Goîn (Bum) vano. Lerch bi ardimî Husên çend fikrayanî Xoce Nasreddîn açarneno ruskî. Ancî Hesên ey rê behsê çend bîyayeyanî o wext keno û ci rê klaman vano. Lerch înan pêroyin qeyd keno. Hesên Lerch rê behsê seramayanî Abdullah Beg keno. Abdullah Beg û Paşayî Xarpet pê nîkenî, naye sero, o verba Paşayî sere wedareno. Abdullah Beg verî surgunî / Istanbul beno, tîya ra zî sey qaşmaqam tayînî Rumelî beno. La o tîya de di aşma pey mireno. Hesên înan sey hikaye Lerch rê qalî keno. Peter Lerch semedê topkerdişî metnanî kirdkî ya û kirdkî musayîş a

Hesênî ra zaf îstîfadfe keno, no Hesên semedê xebatê Lerch a beno çîmeyo esasî.

Peter Lerch Hesênî sey Paloyij dano sinasnayîş. Çunke o wext Sîwan girêdayî Pali / î bi, nîka Sîwan 1936 ra girêdayî qezayê Çewlîg Dara Hênî yew nahîye / belde ya. Peter Lerch semedê Hesên'a wina vano, “No Hesên Kurdanî Roslow ra yew-o, tewr weş sohbet û hissî bî” (Lerch 1857, I, 26).

5. XEBATÊ PETER LERCHÎ DERHEQÎ ZIWANÎ KURDKÎ DE

Peter Lerch Roslow de Kurdan ra xeylêk materyal top keno. O cuwa pey nê metnan ser-o xebata zanistî keno û înan di cîlt sey yew kîtab çap keno (Lerch 1857).

No kîtab sey di cîldan yeno çap kerdiş. Ancî Peter Lerch derheqî xebatê xo yê Roslow de yew rapor amade keno û nê raporî peşkeşî Akademîyî Qralîyet yê Zanayîye qisimî Tarîx-Ziwanzanî keno. No rapor cildî yewin ê kîtabî Lerch de esto. Peter Lerch no raporî xo de zaf hîra behsê metodanî xo yê îlmî keno. O îzah keno ke xebatê xo ya warê Kurdoloji de kam metodî şuxilnayî.

Seke ma cuwa ver zî nuştîbî Petzer Lerchî verî ke şêro Roslow, warê Kurdolojî de cigêrayîş viraştîbî, hazîrîyê xo hol kerdîbî. O cuwa ver materyalanî oryantalistanî Îngîlîzan, Almanan, Îtalyanan û Rusan hol tetkîk keno. Peter Lerch wazeno zîwanî Kurdkî sero, bi taybetî zî fonetîk û gramerî zîwanî Kurdkî sero xebat bikero. Wexto ke Lerch şîno Roslow tîya de Kurdan het de maneno, înan de sohbet keno, o ferq keno ke heta o roj nuştîyî ke oryanlaîstan zîwanî Kurdkî sero nuştî yan şaş î, yan zî kê mî. No rid-ra o çîko ke tîya de Kurdan ra goşdarî keno, înan qeyd keno. Peter Lerch tîya de texmînî xo ra zî texmînî Akademî ra zaf materyal top keno.

Peter Lerch verî hewl dano ke lehçeyanî Kurdkî kurmanckî û kirdkî bimuso û yew mu-det cuwa pey nê her di lehçeyan museno. O hinî bi Kurdan a Kurdkî qîsêkeno. Lerch semedê xebatê xo yê arêkerdîşî metnanî Kurdkîya hîna zaf lehçeyî kurmanckî şuxulneno. Peter Lerch verî semedê nuştîşî Kurdkîya alafabeya akademîkkar Sjögren şuxulneno. Sjögnern na alafabe semedê gramerî zîwanî osetkî ya şuxulnayîbî. Peter Lerch behsî kîtabî Sjögnern “Grameri Osetkî” keno û no derheq de wina nuseno, “Bi na alfabe hem yew zîwano îranî sero xebat ameybî kerdîş, hem zî bi na alfabe yew zîwano ke qet niameyo nuştîş û şuxulnayîş, nê zîwan ser-o xebat kerdîş mumkun bi. Bi na alfabe çekuyan fekî însanan girewtîş û eynî o qede kaxit ser de nuştîş, yanî veng an eynî sey xo nuştîş mumkun bi. Sjögnern alfabe ya ruskî esas girewtîbî û no îskeletî sero semedê osetkîya yew alfabe îcat kerdîbî. Mi na alfabe vîcna, çünke veng anî Kurdkî û vokalanî Kurdkî bi alfabe ya Erebkî - fariskî nuştîş mumkun nebi. O wext Kurdan semedê nuştîşa na alfabe şuxulnayîni. Ancî ez eşkayîni bi na alfabe mîyanî 10 000 Kurdanî transkafkasay de rehet rehet xebatê xo biramnî. Goreyî bawerîye mi wexto ke merdim biwazo yew zîwan bisinasno, ganî merdim verî qaydeyanî gramerî ey zîwanî vejo orte. Alfabe ya Sjögnern cewab dayîni na hewcetiye mi (Lerch 1857, I, 31).

Wexto ke Peter Lerch bes Kurdkî museno, o bi îmkananî xo qaydeyanî gramerî Kurdkî veceno orte û dest pê keno metnanî Kurdkî ser-o xebat keno. O bi ardimî çend Kurdan her di lehçeyanî Kurdkî ser o xebat keno.

Peter Lerch verî materyalî ke Roslow de top kerdî înan bi alfabe ya Sjögnern nuse-no, cuwa pey zîwanî “Zend”, fariskî û metnî ke Erzîrum ra ameyî, înan sero xebat keno. Wexto ke Lerch nê hemeyin nano têver, o vînenno ke alfabe ya Sjögnern de problemî estî. Nayê sero semedê nuştîşî, yanî transkîrîpsiyonî metnanî Kurdkî ya 19 aşmê Çîle 1855 de Akademîyî Qralîyet yê Zanayîye qîsimî Tarîx-Zîwanzanî de yew kombîyayîş beno. Lerch zî no kombîyayîş de hedre beno. Tîya de qerar gêrîyêno ke semedê nuştîşî metnanî Kurdkî ya Alfabe ya Lepsîus ya Lînguîstîk yan zî Alfabe ya Standart bêro şuxulnayîş (Lerch 1857, I, 45) Na alfabe bi ardimî zîwanzananî îngîlîz û almanan hetî akademîkkar Lepsîus ra ameybî hedre kerdîş. Na alfabe semedê zîwananî ke qet niameyî nuştîş, ameynî şuxulnayîş. Peter Lerch goreyî alafabeya Lepsîus semedê nuştîşî Kurdkî ya yew alfabe ya bi 39 herfan keno hedre. Nê herfan ra 9 tene bi veng î, 30 tene bê veng î. Bi vengînan ra 5 tene bi vengo qalîn, 4 tene bi vengo barî yî.

6. NAVEROKÎ KÎTABANÎ PETER J. A. LERCH

Peter J. A. Lerch materyalî ke Roslow de topkerdibî û sero xebat kerdibî bi nameyî “Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer” (Derheqî Kurdan û Keldaniyî Bakûr yê Îranî de Cigêrayîşî), sey di cîld 1857 de St. Petersburg de çap keno. Eynî kitab 1979 de Amsterdam de newe ra bi almankî yeno çapkerdiş. Ma na xebatê xo de no çapî almankî esas girewto. Metnî Kurdkî yê nê kitabî çapî Amsterdam de zî sey çapî St. Petersburg bi alfabe ya Lepsîus sey orjînal ameyî çap kerdiş. La no çapî Amsterdam de tercumeyî almankî yê metnanî Kurdkî zî esto.

Serekî Akademiyî Qraliyet yê Zanayîye qisimî Tarîx–Ziwanzanî Boris von Dohrn semedê kitabî Peter Lerch`a yew rapor nuseno. B. von Dohrn tiya de behsî musadedayîşî şiyayîşî Peter Lerch yê Roslow keno û zaf qîmet dano xebatê ey. Dohrn wexto ke xebatê Lerch û raporî ey waneno, o soz dano ci ke semedê xebatê ey ya derheqî ziwan, kultur û tarîxî Kurdan de ey rê ardim bikero.

